DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

**RESMİ WEB SİTEMİZ**

**https://rantey.org**


Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

# ÇINARA MIN

## Musa Anter




BERHEVÎ

**3. Baskı**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Musa Anter • ÇINARA MIN

BERHEVÎ

Ücre

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

aram

Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Weşanên Aram
-Nivîsarên berhevkirî-

# ÇINARA MIN

Mûsa ANTER

Çapa 1: Îlon 2008
Çapa 2: Îlon 2011
Çapa 3: Adar 2013

**Edîtor:** Hesen Hseyîn Denîz

**Mizanpaj:** Zafer TÜZÜN

**ISBN: 978-9944-222-55-6**

**Çap û Berg :**
Gün Matbaacılık
Reklam Film Basım Yayın San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81

**Aram Basım Reklam ve Yayıncılık**
**Sanayi Ticaret Limited Şirketi**
Huzurevleri Mah. Sıtkı Göral Cad. Kurdi-Der Binası Kat3/3
Kayapınar / DİYARBAKIR
Tel: 0 412 238 30 71

**email:** info@aramyayinevi.com

www.aramyayinevi.com
Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# ÇINARA MIN

Mûsa ANTER

AramBerhevî

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Apê Mûsa û evîna wî

Jiyana bê evîn ne xweş e, bê tam e; mirov zû jê dikerixe û sar dibe. Ji ber vê yekê, ji bo jiyaneke xweş û bi wate evîn şert e. Tiştê ku mirovan bi jiyanê ve gire dide, mirovan ji hovîtiyê dûr dixe û wan bi rûmet dike evîn e.

Evîn ji dil û can hezkirin e, ev hesteke mirovî ya herî bilind û bi rûmet e. Evîn ne tenê jihevhezkirina du kesan e. Evîn hesteke pir dorfireh û cur bi cur e. Cure û celebên evînê hingî zehf in ku, nayên hejmartin. Evîn ji bo zarokan, evîn ji bo kevokan, evîn ji bo çiya û deştan, evîn ji bo çem û deryayan, evîn ji bo masiyan, evîn ji bo xwendinê, evîn ji bo roman û helbestan, evîn ji bo dar û beran, ji bo hespan, pisîkan û ji bo hemû sewalan. Evîn, ji bo baranê, ji bo av û kaniyan, ji bo xwezayê, evîn ji bo mirovan, ji bo dê û bav, ji bo hevalan, evîn ji bo zarokên ji birçînan dimirin, evîn ji bo heqiyê, wekhevî û aştiyê ji bo serxwebûn û azadiyê. Bi kurtî evîn e ku mirovan bi jiyanê ve wekî goşt û hestî girê dide. Bi rastî, hemû cureyen evînê dibin sedem ku, dilê mirov geş bibe û mirov bi jiyanê ve bê giredan.

Lê, ti evîn wek evîna welat ne gur û geş e, ti evîn bi ya ji bo welat re, nayê beramberhevkirin. Evîna ji bo welêt evîneke wiha giranbiha ye ku mirov di riya wê de bi kêf û şahî dikare xwe bide kuştin, evîneke wiha hêja ye ku mirov di riya wê de her kes û her tiştê xwe jî winda bike, dîsa dev jê bernade û hîn zêdetir bi vê evînê ve tê giredan. Ev evîneke wisa ye ku Apê Mûsa di heştê saliya xwe de bi guleyên neyaran ji bo wê hat kuştin. Apê Mûsa, evîndarê welatê xwe bû, ew kezebşewitiyê gelê xwe yê bindest bû. Evîna wî hemû evînên din dihundirandin; yanî evîna wî ya ji bo Kurdistanê pir bi hêz û fireh bû. Ew evîndarê Kurdistanê bû, Kurdistan ji bo wî zarok bû, jin û

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

mêr bû, kevok û masî bû, deşt û çiya bû, gol û derya bû, kar û xebat bû, çavên reş û bejna zirav bû, ji bo wî Kurdistan keleha berxwedan û serhildanê, warê lehengî û qehremaniyê bû, azadî û serxwebûn bû, ji bo wî Kurdistan navenda hemû evînên pîroz bû. Evîna Kurdistanê dilê wî dişewitand, ji bo wî jiyan, ev evîna mezin bû.

Di nivîsa xwe ya bi navê "Eşqa Welêt" de wiha digot: "însanê ku eşqa welatê wî pê re tine be, ji heywanan jî jêrtir e. Çima? Carinan gun dek ji gundekî din kerekî yan jî çêlekekê, gayekî dikire, te dît ew heywan ku filitî, direve diçe gundê xwe.

Ê ma lawo, tirkino, ma em kurd wek ker û çêlekan jî nayên? Yanî hûn li Nisebîne, Cizîrê, Kercewsê, Şirnexê û li Kurdistanê, tev de nevî û zarokên me bikujin û emê bejin "vatan, vatan ve miletin bolunmez butunlugu." Çawa hûn vê ji me dixwazin? Kurdê ku wek we bêje, ez jî tevlê, nalet li bavê wî be

Faşîstino , wehşino, ma hûn zanin bê hûn li çi digerin? Lê çi fêde hîn miletê me qenc şiyar nebûye. Li Hîndistanê kalekî wanî wek min hebû, navê wî Gandî bû. Ku îngilîzan wek hikûmeta me ya niha li hindûyan zilm dikir, Gandî ji hindûyan re digot: Lawo temamê hindûyan, pîrek û zarok, kal û ciwan, giş xwe li devê riyan dirêj bikin. Hindûyan bi ya wî dikir, ez jî ji temamê kurdan re dibêjim, ku faşîst di welatê me de bi panzêrên Amerîka pîrek û zarokên me biperçiqînin, emê tev de herin devê sera yan û bêjin, faşîstino, "Em hemû PKKyî ne, bijî Kurdistan û hûn çi dikin ji me bikin."

Bajarên Kurdistanê em hemû rabin ser lingan, wê me têxin kîjan hepsê? Talî wê îş bê vir. Ma gelo tirk hîn jî yeqîn dikin ku em 20 milyon kurd êdî di welatê xwe de benamûsiyê qebûl bikin.

Edî kurd agirê Newrozê nema bi hejikan, lastîkan û mûman pê dixin, bi canê xwe pe dixin. Ma hûn nabînin li Îzmîre, li welatê Yewnanan, keçika Kurdistanê û 15 salî ji gundê Nisêbînê, Bizgûrê Rahşan Demîrelê ji ber zilma hikûmeta faşîst xwe şewitand û hûn zanin tembiya wê çi ye? Di nav rivînê de tiliyên xwe vekirine û destê xwe hildaye û gotiye: "îcar bila agirê Newrozê hew vemire."

Faşîst, hûn qenc fêm bikin, heke xwîna şehîdên me û ariya şehîda meyî pîroz li erdê bimîne lanet li me kurdan hemûyan be."

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Bila Welat bi xwedî be*

Çima em derdikevin? Adet e, wexta ku rojnameyek derdikeve dibêjin "çima em derdikevin?" îcar ji bo Welat, gerek em bêjin çima emê dernekevin? Ji ber ku ti îşê welatê me yê feqîr pêk nehatiye. Welat bi xwedî be, lê heta niha bê xwedî mabû.

Ger em bi kinahî bêjin: Ji bo em bibin xwediyê welatê xwe em derdikevin. Gotina pêşiya ye: Gerek mirov, hespê xwe, çekê xwe û welatê xwe meke destê xelkê. Ji ber ku xelk guh nadin welatê mirov, talî xirab dibe. Wek îro welatê me. Hîn bi ser de jî welat kirine wek cihê şewatê, hêtûnê. Ji hawîrdor rivîn û dû bilind dibe. Di nav rivîn û dûmanê de qîrîna jin û bavan e, zarokên me di nav êgir de bûne wek seriyên kizirandî. Ma kî kare bêje na. Wa ye Helepçe, Lice, Qulp, Cizîr û Nisêbîn.Erê, em ji bo vemirandina vî agirî derdikevin.

Ji bo xelasiya pîrek, bav, kal û zarokên me, em derdikevin. Xelkê em kerr û lal kirine. Em nema ji zimanê hev fêm dikin. Ji bo ku em hînî zimanê xwe û hev bibin em derdikevin. Însan ku ji hev hîn nebe, li hevnayê, li hev nabanê. Em ji bo baneya hev derdikevin.

Ji bo xelasî û serbilindiya temamê Tirkiye û xelkê Tirkiye û ji bo biratiya tirk û kurdan em derdikevin. Pirsek bi tirkî heye. Dibêjin, \`welatê ku tu xwînèlê nerijînî, ne welat e\`. Ma gelo kesî wekî me li welatê xwe xwîn rijandiye?

**22-28 Sibat 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Fato

Îro welatê me bûyê erdê gundekî. Ax axa wî gundî ye, lê dibên ev erdê Hemo ye, ev yê Hiso ye, ev yê Biro ye û ev jî ye Silo yê.

Îro axa welatê me ketiye vê rewşê. Wek parçeyê welatê me yê Sûriyeyê, yê Iraqê, yê Îranê û yê Tirkiyeyê. Berê Sûriye û Iraqê wek îro ne di bin darê ereban de bûn... Sûriye fransiz û Iraq jî îngilîz bû. Ev her du milet, erê xwînmij in lê yê ku xwîna wî dimijtin pêşî bi derziyan pûç dikirin, paşê xwîna wî distendin.

Ji ber vê yekê feqîrê xwîndayî, bi êşa xwe nizanîbûn. Lê yên Tirkiye û Îranê, bi gûzan û hicaman xwîna kurdan dikişandin. Ji ber vê yekê kurdên Sûriye û Iraqê ji yên Tirkiyeyê li pêştir bûn. Ku carinan ji Sûriye û Iraqê mêvanên me dihatin me ji wan re digot: "Lawo binêre bê kurdên Sûriye û Iraqê çi qure ne."

Wext derbas bû, salan da pey salan, kurdên Tirkiyeyê jî bi xwe hisiyan.

Di demeke kin de êdî em ji wan bihurtin, ez nizanim lê belkî niha îcar kurdên Sûriye û yên Iraqê ji me re dibên qure.

Di tarîxa însanetiyê de çar sefhe hene. Berê însan wek heywanan yek yek bûn, a duyemîn bûn bavik, a seyemîn bûn eşîr, a çaremîn bûn milet. Ê xuyaye ferd, bavik, eşîr tim neyarên hev in. Ev paşdemayîn ku em piştî xelkê mane ne sûcê me ye, xelkê em wiha hiştine.

Niha li Iraqê kurd hîn eşîr in wek Berzanî, Telebani û Zebariyan. Berê em li bakurê welêt jî wiha bûn. Lê îro ez dizanim, em kurdên Tirkiyeyê êdî bûne milet. Pêşveçûna me ji Iraqê, ji vê te. Em bûn milet ew hîn jî eşîr in.

Îro, kes nabêje bijî Omeryan, bijî Reman, bijî Surgiçî, bijî Hesen û Heyderan, dibên bijî welat. Ezê niha dîtinek xwe ji we re bejim.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Berê li gundê me gava yek ji gundekî tenişta me di nav mayinan de dihat kuştin, temamê dora wî digot, `tehtil erda wî kiriye`. Lê ew a ku min dît, êdî ez hîn bûm ku, kurdên me êdî ne yên berê ne. Yanî bi tabîra berê qure bûne.

Ez li gund bûm, rojeke min dît pîrekek feqîr gundiya me Fato, pêşmalka wê li ber çavê wê ye û firqe firqa wê ye digirî. Ez tirsiyam, min got belkî zarokên wê yan mirine yan jî şehîd bûne, min got:

Fato lawo xwedê neke ev çi hal e?

Fato:

- Ma xalo te nebihîstiye?

- Na lawo.

- Ma ne dibên li aliye Hekariyê du zarokên me şehîd bûne.

Piştî ve dîtina xwe min qenc yeqîn kir ku kurd şiyar bûne. Wekî Fatoya Stilîlî li ser şehîdên kurdan ên nenas digirî, êdî ev îş temam e. Çiqas min divîbû ku wê çaxê Kozakçioglu jî li ba min ba. Ez yeqîn dikim êdî wî jî nema zart û zurt dikir.

**29 Sibat - 6 Adar 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Xwediyê malê êdî şiyar bû*

Di sala 1948an de li Stenbolê min "Dicle Kaynağı" derdixist. Li Stenbolê û li welêt bibû ecêbek. Temamê hikûmetê û zilamên wan li min radibûn ser lingan. Hema her meh ez dibirim emniyeta Stenbolê û eziyet didan min. Bi piranî wiha ji min re digotin: "Kuro ma tu çi yî, em karin serê te biperçiqînin" û bi rastî jî ez gêrî erdê dikirim û pê li serê min dikirin. Lê cardin jî ez ne disekinîm. Carekê ji wan caran ku ez berdam, min di rojnameya xwe Dicle Kaynagi de ev mesele nivîsî. Mesele wiha bû: Rojekê du diz ketin malekê, mal feqîr bû, jin û mêr xebatkar bûn. Bi dizan jin û mêr şiyar nebûn, lawikê wanê pênc salî bi dizan şiyar bû.

Dizek hat ser lawik, kêra xwe kişand û got: "Kuro binêre deng ji te derkeve ezê te bikujim." Dizê din jî sindoqa diya lawik vekir û foteyek danî û firaxên diya wî û malê paqij kirin nav fotê ku bibin. Nava lawik dişewitî, lê kêr jî di ser serê wî re bû, newêrîbû deng bikira. Lawik wiha fikirî got, avnê, avnê, avnê! Dizê bi kêr got, `hiş kuro, ezê te bikujim`. Dizê din got; `lawo zaro ye, tirsiyaye avê bidiyê`. Ê diz tasek av da lawik. Lawik bi deng ew tas giş vexwar, car din jî dê û bavê wî şiyar nebûn. Êdî lawik piştî vexwarina avê bi şid got, `oftan, oftan, oftan`, dîsa jî dê û bavê wî şiyar nebûn. Lawik ji nû ve got, `oftan, oftan`. Dizê bi kêr got, `hiş kuro ezê devê te bişkînim`. Li lawik nexistibû lê belê cardin jî got, `ay devê min, ay devê min, ay devê min`. Piştî vî dengî şiyar bûn û diz reviyan.

Min wiha jî gotibû, erê ez wek wî lawikî me, kêr di ser serê min re ye û ez zaro me. Daxwaziya min ew e ku ez diya xwe û bavê xwe şiyar bikim. Ku dê û bav şiyar bûn wê diz birevin. Diz çiqas bi qewet bin ku xwediyê malê şiyar bibin rev ji dizan re dimîne. Min

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

zanibû ku ez wek wî lawikê bin kêrê me û belengaz im. Niha ez dinêrim ku dê û bavê min şiyar bûne, êdî muheqeq wê diz birevin û ezê jî çek û malê diya xwe xelas bikim.

**29 Sibat - 6 Adar 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Çinara min

Erê kurd nexwende ne, lê çandeke wan a bav û kalan heye. Hedîseke Mihemed heye dibê; `wê rojek bê ferdên umeta min ji pêxemberên Benî Israîl zanatir bin." Ez niha li umeta Mihemedî ya kurd dinêrim, ez dinêrim ku bi hezaran ên wek Îsa, Mûsa, Dawid, Silêman, Şît û Mît hene.Tewer gundê min Stilîlê bêhenek gundekî epîk û artîstîk e. Ez nikarim bêjim filozof in lê gelek însanên eceb tê de hene. Gelek caran di zanayiyê de min diheyirînin.

Di sala 1951ê de ez çûm gund min çinarek çand. Niha du metre û nîv stûr û 50-60 metre jî bilind bûye. Ji xwe min divê ez tirba xwe di bin wê de çêkim. Wê salê min nêrî ku terhik ji ber çûye. Hecî Mehmûde Stilîlî bang min kir û got:

-Şêxo wer ez tiştekî pêş te bikim.

Bi kurdî navê min ne Mûsa ye, Şêxo ye. Ez çûm Mehmûd ew terhik

pêş min kir. Û got;

- Tu zanî çi hat bîra min? Min got;

- Çi hat bîra te?

Got: Ez dibêm tu wek vê çinarê yî û ev telebên me yên li çolê wek vê terhikê ne, ji ber te çûne.

Ez keniyam, min xwe da vî alî û wî alî belkî ji tirsa jî be, lê min nêrî ku xebera wî ye. Lê ez terhik ji ber kîjan çinarê çêbûme? Ew çinar, niha hişk bûne, ez mame. Dibe ku ez jî hişk bibim terha ku ji ber min çûye bibe çinar. Ez ji ber Cegerxwîn çûme, ji ber Celadet Bedirxan çûme û yên din. Niha li dinyayê, agirê olimpiyadê heye. Dibên berê di yewnana qedîm de lîskeke wan hebû, agir pêdixistin xort dibeziyan, xortekî agir dida destê yê din.

Bi vî awayî bi hezaran xortan ew çira didan dest hev heta ku

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

bigihana Akrepolê, armanca xwe. Îşe miletan jî wiha ye. Yek nikare ji cihê cih meşala xwe bigihîne Akrepolê, divê mirov bidin dest hev. Û kes nikare bê çima yên pêşî agirê xwe negihandin hedefa xwe. Na ew tiştê ku jê hat kir, êdî bar ket stûye yê din. Û bi vî awayî wê bigihên armanca xwe. Ez vê ji xortên kurdan re dibêm, carinan xortên xwîngerm ji min re dibên:

- Ma kalo ka we çi kiriye? Me ji sifrê dest bi vî îşî kiriye.

Rojekê min ji yekî re got:

- Lawo Xwedê we bihêle, erê we ji sifrê dest pê kir lê, heta ku me ji bin sifrê doza we anî sifrê imrê me qediya.

Ez niha dinêrim xortên me roj bi roj dibin wek atletên olimpiyadê. Helbet ev hereketa wan min jî dike wek yekî ji wan xortan. Erê ez nikarim wek wan bibezim, lê rûniştî jî ez bi wan re me. Qaîdek misilmantiye heye. Dibên ku hûn nikaribin li ser piyan nimej bikin, rûniştî bikin, hûn nikaribin rûniştî bikin razayî bikin û ku razayî jî ji we neyê bi çavan bikin. Ez vê tînim ser doza kurdan, kesê ku tiştek jê neyê tine ye. Li ser piyan, rûniştî, razayî û bi çavan. Hinek karin şipyayî bikin, hinek karin wek min rûniştî bi nivîsandin bikin, hinek karin bi pereyan bikin û yê ku ev hemû jî ji wan neyê, karin dua bikin. Lê xayintî, ew nabe. Dibe wek yekî bi çavan jî nimêj neke lê kufiriyan bike. Îcar ew jî dibe kafir. Eh di temamê dînan de qetla kafiran jî helal e.

**7-13 Adar 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Xwendin*

Tarîxa dinyayê du qisim in. Yek a nezanî ye û ya diduyan a xwendin û nivîsandinê ye. Gerçî hinek dibêjin li Cizîra Botan tabletek derketiye ketiye destê almanan, tehlîl kirine ku berî niha bi 40 hezar salî hatiye nivîsandin.

Lê bi piranî qenaet ew e ku nivîsandin îsal deh yanzdeh hezar sal in hatiye destpêkirin. Hinek zanyar hene bê nivîsandin û xwendin bûne pêxember. Wek Hz. Muhemed îşe wî rehet bû; weke jê re dihat, Cebraîl jê re digot wî jî ji xelkê re digot. Lê wilo bi destê xelkê hema nakeve.

Ji ber vê yekê Muhemed jî şîreta xwendinê li însanan kiriye. Wehiya pêşî jê re hatiye bi erebî gotiye, "iqra bi îsmî rabîke." Yanî bi navê Xwedê bixwîn. Dûre jî Muhemed di hedîsa xwe de gotiye: "Bixwînin ku xwendin li Çînê jî be." Tê xuyakirin ku bihayê xwendinê tine ye. Ilmzanaya dinyayê bi zeman re dikeve ser hev, tu îro kitêbekê bixwînî, wek tu alimekî berî niha bi du hezar salan miriye dibihîsî. Ku mirov li gorî serê xwe tenê bimîne tişt nayê safîkirin.

Ilim bûye wek şewqa rojê ne ya kesî tenê ye, rêya însanan gişan e. Bi wî şertî ku însan bi ser rêya jê îstifade bike bikeve.

Tiştin hene, însan hînî wan dibe. Wek cixarê, wek vexwarinê, wek tolaziyê, wek daneheva mal û milk, lê ez yeqîn dikim ji însên re hînbûna herî bi fêde xwendin e. Pêşî belkî xwendin bi meriv ne xweş be. Tiştên din jî wiha ne lê ku meriv dom bike û hînî xwendinê bibe êdî hew mirov dikare berde. Lê de îcar xwendin jî ji kitêban e û kitêb jî şekil şekil in. Ji van kitêban a qenc ew e ku mirov xwe bielimîne kitêbên bi fêde û hêja.

Her çiqas eşqa hinek însanan di tarîxê de ye, ya hinekan di

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

felsefeyê de ye, Heta ya hinekan di romanên sivikî eşqê de ye. Lê ya baş ew e ku bi xortanî xwe bielimîne kitêbên ilmî û bi fêde. Îro kitêb fêrbûn e, imrê mirov têrê nake ku mirov hemû kitêban bixwîne. Ya bi aqilî ew e ku mirov çavên kitêban bixwîne.Yanî bi kurdî dibên deqê kitêban. Salê mirov deh kitêbên baş bixwîne pêncî salî dibe 500 kitêb, ew jî besî mirov e. Xwendina kitêbekê ne ku mirov bixwîne û hemû di serê mirov de bimîne, îmkan jî tine û ne baş e jî. A baş ew e ku mirov kitêbê bixwîne, cewherê wê di serê mirov keve, wexta ku lazim bû ew cewher ji ber xwe ve xuya dibe. Nîtekim hinek Quranê ji ber dikin lê tu dinêrî bi piranî ji Quranê pêv tiştek di serê wan de tine. Fêda xwendinê bi zeman re tê xuyanîkirin û hêdî hêdî tê hezimkirin. Ku ne wiha ba mirov wê zarokên xwe bidana hev, di pênc şeş mehan de dersê îlkokilê, orte û lîse û unîversîte ji wan re bigota û bigota temam. Lê de nabe, heta ku mirov xortekî bigihîne 20-25 salan divê pê dakeve.

Di heqê ilim û stendina zaneyê de gelek filozofan fikrên xwe gotine. Hinek dibên mêjiye însên wek lewheke mermer e ku însan dixwîne, zaneyî li ser te nivîsandin. Hinek jî dibên piştî xwendinê hîsê zanebûnê ji însên re çêdibe. Hinek dibên her ku însan dixwîne tara mêjiyî wî fireh dibe û pir tişt dikevin hundirê wê tarê. Talî kî çi bêje xwendin hîmê zanayiyê ye. Îro û berê jî, kîjan miletê xwendevan li pêş in û meqbûl in. Îro heke yewnan delalê Ewropayê ne bi xêra xwendevanên xwe Sokrat, Eflatûn û Arîsto ne. Îro jî dinyaya pêş de çûyî bi xêra xwendinê peş de çûye.Berî niha bi 400 salî li Almanyayê 18 unîversîte hebûn. 150 salî berî alema îslamê li Ewropayê metbee çêbû. Ê me hîn niha çend unîversîte û mektebên me hene, ew jî midûren wan Îhsan Dogramaci û Turgut Ozal in. Unîversîteyên Ewropayê temamê hatina dewletê di emrê wan de ye. Atomê çêdikin, ên me hîn dibêjin; `bila profesorên me serbest bifikirin û bêjin an na?` Di ferqa xwendinê de ev jî heye.

**14-20 Adar 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Weqfa Vehbî Koç*

Meşhûr sêkaxetçî Vehbî Koç weqfek vekiriye. Hûn zanin bê weqfa wî ji bo çi ye? Ji bo zarok çênebin û hîn di zikê diya xwe de bin wan bikujin. Pirseke me ya pêşiyan heye. Dibên Xwedê du tiştan bi hev re nade însanan. Ku yekê didiyê, yekê jê distîne. Ez dinêrim ev pirs ji bo Vehbî Koç hatiye gotin. Xwedê mal dayê, le dîn, îman û wijdan jê stendiye. Tirsa Vehbî Koç ji bo pirbûna zarokan e. Hey tu û zuriyeta xwe hemû bi qurbana serê zarokekî bûna. Çima tu nabê ev bihayî ji wan tenekên ku ez ditewînim dikim tepsî, bûzdolabî, mekînên çekan û yên din ku kengî qîma min bixwaze ez zembîlek pere li heqê wan zêde dikim tê. Bê însaf! Lingekî te li der e û yek li gorê ye û elhemdulîlah tu nexweşê şêkir î, tu nikarî xwarina me bixwî. Tu îsal sîh sal in qerş merşê tewş dixwî. Çiheqê te li van zarokên wek berxikan heye ku tu dibê hîn di zikê diya xwe de ne wan bikujin?

Binêr Vehbî Koç di temamê dînan de lanet li tebîetê te hatiye. Hezretî Îsa di Încila Lûka de ayeta 36an de wiha dibêje: "Yekî dewlemend ku bi rûkîspî karibe here hizûra Xwedê zortir e ji vê yekê ku mirov hêştir di qula derziyê re derbas bike." Li vir Îsa heqê te da te, em bên ser Hezretî Muhemed.

Di Qurana Şerîf de Xwedê dibê: "Zarokên xwe mekujin, ezê rizqê wan bi wan dim." Di Tewrate de jî Xwedê ji Adem û Hawa re dibê: "Bi bereket bin, zarokan çêkin, rûyê dinyayê tije bikin." De îcar yabo layê beqalekî Vehbî Koç Îsa, Muhemed, Mûsa û Xwedê li wî alî dihêle û ji xelkê re dibêje: "Gidî zarokan çêmekin."

Tirte virta Vehbî Koç ne vala ye. Sedemên wê hene. Ew jî dijminekî kurdan e. Belkî hinek jî pif dikinê dibên kurd gelek zarokan çêdikin û tirk çênakin, wê demek bê kurd pir bibin û

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

serdestiyê li tirkan bikin. Wê çaxê jî wê ji Vehbî Koç re lawikê beriyê bêjin.

Weqfa Vehbî Koç bi mîlyaran hebikên pîrek pê bi hemle nebin, belaş şandin Kurdistanê. Lê mezinê kurdan jî li kurdan tembîh kir got gidî van heban mexwin lawo, bi van heban hûnê êgir berdin mala me û hûnê bizrê me biqelînin û ji alîkî de jî wê pîrekên me giş bibin qansêr. Ew hebên ku dan jî hormon bûn. Xwedê zane hinekan ji kurdan re got lawo van heban bixin bin dar û berên xwe yên fêkî wê fêkiyê wan qenc çebibe. Wiha kirin. Ji alîkî jî car din Weqfa Koç Efendî bi milyonan qapût şandin Kurdistanê ku zilam têxin sitrên xwe, bizrê wan nekeve nava pîrekên wan. Ew jî car din hinekan gihandin xortên kurdan.

Got, lawo ev nepox in, bidin zarokên xwe, bila binepixînin û ji xwe re bi wan bilîzin. Ew jî wiha kirin, zarokan pif kirin wan û bi aliyê rûyê Vehbî Koç de avêtin. Ez niha dinêrim tu dibê qey derdekî Tirkiyeyê nemaye ji zarokên kurdan pê ve. Ruhê wan dire. Heta wê roje rojnameyekê

nivîsîbû li ser zimanê Apo, dibê Apo gotiye: "Xortên kurdan an derkevin çiyê û yan jî herin cem pîrekên xwe û zarokan çêkin." Ez nizanim. Apo wiha gotiye yan negotiye, ma min çi ji Apo ye, Apo ne Apê min e ku tu bajo belkî ez kalikê wî bim, lê ku gotibe xebera wî ye, okey.

**21-27 Adar 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Baraja Ataturk*

Di 28.2.1992an de, di radyoyê de mizgîniyek wek jehrê dan me. Mizgînî wiha bû: `Wê di vê meha adara pêşiya me de ji Baraja Ataturkê elektrîke bidin`. Bila bidin birê min. Ma ya me çi ye? Heta niha me çi xêr ji malê Ataturk dît ku em ji elektrîka baraja wî bibînin? Bila kêfa Wehbî Koç, Sabanciyan û yên din bê. Meseleyek li hêla me heye. Dibên xulamekî Brahîmê Axê heye. Navê wî Reşo ye. Lawek jê re çêdibe, mizgîniyê didinê, Reşo dibê: "Ma yabo min çi jê ye, mizgîniyê bidin mala Axê, xulamek ji wan re çebûye." Wekî din jî meseleyeke din heye, ew jî dişibe halê me kurdên li Tirkiyeyê. Loqenteyên luks ên mezin hene. Xwarin û muşteriyên wan ecêb in, xwarin xweş û buha ne, muşterî jî hemû diz û sêkaxetçî ne, ne xema wan pere ye, bi jehr be ji kîse xelkê dixwin û vedixwin. Weke din jî bi sedan xort, xulamtiya wan dikin.

Ew xortên delal, wê xwarina xweş bi garsontî û xizmeta xwe hemû didin wan qewadan, lê loqente jî ji wan re ya girarek birxul, meqerna û yan jî fasuliyek çêkiriye.

Em kurd li Tirkiyeyê wek van garsonan in. Wek Reşo ne. Me dev ji berê berda. Di imrê min de îsal heftê sal em bi lêxistinê û bêerziyê dixebitin ji xelkê re, lê talî em birçî dimînin. Şaîrê me yê mezin Cegerxwîn berî niha bi 50 salî binêrin bê gotiye çi: "Welatê me tev de zîv û zêr e, lê ez çi bikim maye ji xelkê re." Xebera şeva din a radyoyê ev şîreta Cegerxwîn anî bîra min, min jî divê ez bînim bîra we.

Li neqeba Qiziltepê û Nisêbînê li rasta Amûdê girek heye berê navê wî Girê Amûde bû. Niha îcar ew jî kirin tapûya Ataturk jê re dibên `Kemaliye`.Kemaliye di sînorê Sûriyeyê de ye û ji nehiya Amûde jî bi çavan dixuye.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Li pala gir suretê Kemal Paşa bi kevirê kilskirî çêkirine û li aliyê wî yê çepê bi tirkî "Ne Mutlu Türküm Diyene" yanî "Xwezî bi wî ku dibe ez tirk im" û li aliyê din jî "Türkiye türklerindir" yani "Tirkiye ya tirkan e" nivîsandine.

Otobus di wir re dibihure, yekî Stilîlî li gir dinêre dibê, "Ev dibê çi?" Jê re wek me tercume dikin, ê Stilîlî: "Eh yabo em ne tirk in, ne xwezî bi me û em ne tirk in, Tirkiye ne ya me ye. Li Stilîle jê re dibên Tirkiye.Naxwe em di ser xirê wan re hatin."

Ez nizanim ezê ji Reşo û Şêxê Kûtê Stilîlî re bejim çi? Ez dinêrim, ez jî wek wan im. Ma gelo kurdê ku bi aqil be û heta bi namûs be, wê ne wek me be?

**4-10 Nîsan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Kenê mekroh*

Di gelek çîrokên kurdan de tim, li cem şêrekî yan jî gurekî roviyek jî heye. Şêr mîr e û rovî jî qeşmer e. Ku şêr seydekê digire parçeyên xweş dixwe û ûr û pizûran jî dide rovî.

Yekê Nîsanê di 1992an de 'Genel Kurmay Başkani' Dogan Gureş û Ugur Mumcû ev anî bîra min. Ez texmîn dikim ê ku Ugur Mumcû ev qasî ji dil dikenand zirtên 'Kurmay Başkani' bûn. Bê çawa Şirnex û Cizîr xera kiriye û li pêş jî wê hin bajarên Kurdistanê yên din jî xera bike.

Di dewleta tirkan de zirt gelek caran çek e. Berî niha bi 50-60 salî îtaliyan digotin "Antalya ya me ye". Êdî me jî li miqabilî wê zirtek wiha derxistibû, digotin: Kemal Paşa gotiye, binêr ezê çizmê di linge xwe kim haa! Ev dihat du maneyan, yek jê, yanî wê Kemal Paşa car din biba esker û çizme di lingê xwe kira û biçûya ser ordiyê û bi ordiya biçek û sîleh wê Îtalya bişewitanda û ya diduyan, di xerîtê de welatê Îtalyayê wek çizmekê ye. Yanî Kemal Paşa ji Îtalya re gotiye, `binêr ezê welatê we zeft bikim ha`. Halbûkî her du jî zirtên vala bûn, lê me bêhna xwe pê derdixist.

Ka em bên ser Gureş Paşê me. Zirta Gureş Paşa ne li Îtalyayê ye, li Kurdistanê ye. Li Şirnexê ye, li Cizîrê ye, li Nisêbînê ye, li Silopiyê ye, li temamê bajarên Kurdistanê ye. Paşa ne wek Kemal Paşa ye ku dibê ezê çizma xwe li lingê xwe kim, lê dibê ezê şewqeya xwe bidim serê xwe. Gotina wî eynên wiha ye: "Heger tevgera kurdan bibê serhildan ezê şewqeya xwe ya "Guvenlik Kurulu" bi serê xwe kim û seferberiyê teklîfî hikûmetê bikim." Paşa zane ku teklîfa wî ji vê hikûmeta pepûk re emr e û wê her were cih. A ku rovî Ugur Mumcu ji kena dikuşt ev pirs e. Erê wê kî qerara serhildanê bide, yanî wek vê qalê wê ji cejna kurdan

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Newrozê re jî wê başçawîşek bêje serhildan.

Ez tim hikûmeta Tirkiyeyê dişibînim pepûkê. Hûn zanin çîroka pepûkê, ne hewce ye ez hemû binivîsînim, le dibên teyr û tilûr hemû li pepûke dixin, ew jî tê hêlina xwe li çêlikên xwe dixe. Hawêrdora tirkan tiştek namîne ku ji tirkan re nabêjin. Lê eyarê wan fireh e, deng nabin xwe. Li cem me Silo hebû, xortan digot, "Silo, em di xweha te..." wî digot estexfirila, ne digot ez jî. Sûriye, Iraq, Yewnan û Bulxar zirta li tirkan dikin, tirk dibên xem nake, bila qet, xeberdanek wan zêde dibe. Dema rojnamevanan ji Silêman Demîrel wiha pirsî: Muhterem serokwezîr, ermenî tirkên Azerbaycanê dikujin ma hûn deng nakin? Silêman Demîrel dibê, na gidî temamê dinyayê li pişta ermeniyan e. Demek evzilma ku tirk li kurdan dikin, zanin ku kes li pişta kurdan tine ye. Eynî wek pepûkê û çêlîken wê. Dinya giş li nav çavên tirkan dixe ew jî tên Şirnex û Cizîrê bombe dikin.

De tirkno Xwedê kerîm e, kes li pişta kurdan tine, wê rojek bê em ê besî xwe bin.

**11-17 Nîsan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Êdî kes nikare goştê me bi hev bide xwarin

Bi sedsalan, karekî dijminên kurdan hebû, em berdidan hev. Ew qasî em parçe kiribûn ku her eşîreke kurdan jî kiribûn dido, sisê. Mînak, di Kurdistanê de piştî eşîra Berzaniyan, eşîra Omeryan tê. 90 gund in, ji Luksemburgê mezintir in. Lê hikûmeta Osmaniyan û dûre TC ev eşîr parçe parçe kiribû û kiribû dijminên hev. Mehmûtkî û Etmankî tevli axayên xwe giş lawê apên hev bûn, le tev dijminên hev bûn. Wek Mala Osman, Mala Sileman, Mala Smaîl û Mala Tahir.

Ez dinêrim ev nesaxiya hikûmeta me ya niha, ji vir tê. Kurd şiyar bûne, nema didin dû melan, nema didin dû eşîran jî. Bûne yek, bûne milet. Dijminatiya nava wan bûye biratî.

Berê ku min li rewşa miletê kurd dinêrî tim ev çîroka dîrokî dihat bîra min. Çîrok wiha ye: Dibê li welatekî mişkên cerboh misêlet bibûn. Zad û dexl bi wan ve nehiştibûn. Hakim aciz mabû. Sofiyek tê ji hakim re dibêje, `Ez karim van mişkan biqelînim`. Hakim dibê, `De her kuro, tê çawa biqelînî?` Sofî dibê, `Yabo min ti pere ji te navê, tiştê heye qefesek hesinî mezin ji min re çêke û bila gundî, mişkan bi saxî bigirin bînin bifroşin te. Emê wan bi saxî têxin qefesê. Qefesek hûrçavik çêdibe, sofî hezar mişkî dixe hundirê wê û derî li wan digire. Rojek diduyan, sisiyan mişk birçî dibin, dest bi xwarina hev dikin. Pêşî yên biçûk, yên pîr û nexweş tên xwarin. Hin bi hin mişk kêm dibin.

Carinan sofî piçek xwarin davêje nav wan, mişk li hewa hiltînin. Lê wextek tê ku mişk nema xwarina ji derve tê dixwin, lê ku sofî mişkekî ji derve dikuje û davêje nav wan bi carekê xwe davêjinê û dixwin. Sofî dinêre ku mişk elimîn xwarina goştên hev, devê qefesê vedike, ji hezar mişkî 40-50 mane, lê ketine tebîetê pisîkan, bi carekê dikevin nav bajêr.

Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Mişkên mane ji wan narevin, dibên qey mişk in, lê ew bi tebîet bûne pisîk û bi vî awayî dikevin nav mişkên bajêr bi carekê diqelînin. Çiqas ez bala xwe didim dîroka kurdan, ji dema xelîfên Emewiyan, Ebasiyan, Selçûkî û Osmaniyan tim ev dek li kurdan kirine. Em elimandibûn xwa-rina hev. Weke min li jorê jî got acizbûna tirk, ereb û eceman ev e, ku em nema hevdu dixwin.

**18-24 Nîsan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Eşqa welêt

Însanê ku eşqa welatê wî pê re tine be, ji heywanan jî jêrtir e. Çima? Carinan gundek ji gundekî din kerekî yan jî çêlekekê, gakî dikire, te dît ew heywan ku filitî, direve diçe gundê xwe.

Ê ma lawo, tirkino, ma em kurd wek ker û çêlekan jî nayên? Yanî hûn li Nisebînê, Cizîrê, Kercewsê, Şirnexê û li Kurdistanê, tev de nevî û zarokên me bikujin û emê bêjin "vatan, vatan ve miletin bölünmez bütünlüğü." Çawa hûn vê ji me dixwazin? Kurdê ku wek we bêje, ez jî tevlê, nalet li bavê wî be.

Faşîstno, wehşino, ma hûn zanin bê hûn li çi digerin? Lê çi fêde hin miletê me qenc şiyar nebûye. Li Hîndistanê kalekî wanî wek min hebû, navê wî Gandî bû. Ku îngilîz wek hikûmeta me ya niha li hindûyan zilm dikir, Gandî ji hindûyan re digot: `Lawo temamê hindûyan, pîrek û zarok, kal û ciwan, giş xwe li devê riyan dirêj bikin. Hindûyan bi ya wî dikir, ez jî ji temamê kurdan re dibêjim, ku faşîst di welatê me de bi panzêrên Amerîka pîrek û zarokên me biperçiqînin, emê tev de herin devê serayan û bêjin, faşîstno, "Em hemû PKKyî ne, bijî Kurdistan û hûn çi dikin ji me bikin."

Bajarên Kurdistanê em hemû rabin ser lingan, wê me têxin kîjan hepsê? Talî wê îş bê vir. Ma gelo tirk hîn jî yeqîn dikin ku em 20 milyon kurd êdî di welatê xwe de bênamûsiyê qebûl bikin.

Edî kurd agirê Newrozê nema bi hejikan, lastîkan û mûman pê dixin, bi canê xwe pê dixin. Ma hûn nabînin li Îzmîre, li welatê Yewnanan, keçika Kurdistanê û 15 salî ji gundê Nisêbînê, Bizgûrê Rahşan Demîrelê ji ber zilma hikûmeta faşîst xwe şewitand û hûn zanin tembiya wê çi ye? Di nav rivînê de tiliyên xwe vekirine û destê xwe hildaye û gotiye: "îcar bila agirê Newrozê hew vemire."

Faşîst, hûn qenc fêm bikin, heke xwîna şehîdên me û ariya şe-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hîda meyî pîroz li erdê bimîne lanet li me kurdan hemûyan bê. Delalên min: Min ji we hemûyan qebûl e. Ez nikarim yek yek bersiva we bidim. Newroza we gişan pîroz be, bila agirê meşala Rahşan Demîrel li pêşiya we pêketî be.

**28 Adar - 3 Nîsan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Çi bi wan nakeve*

Dosteki min hebû navê wî Reşîd Beg bû. Ji albaytiyê teqawît bibû. Ji eşîra Cisrana bû û lawê apê şehidê me yê bi nav û deng Mîralay Xalid Beg bû. Bi imir neqeba nezîkî 40 salî hebû lê Reşîd Beg bi çavê hevalekî xwe li min dinêrî. Çavên wî qels bibûn, carê min kitêb dibir jê re dixwendin. Rojekê car din di bîra min de ye, min xatireyên Bîsmark jê re dixwendin.

Eşqa wî di almanan de bû. Sê qîzên wî û laweki wî hebûn. Îcar yabo ma law law bû. Di lîseyê de dixwend, tişt di mala xwe de nehiştibû, heta demança bavê xwe, bazinên diya xwe û xalîçên hundir didizîn, dibirin difrotin. Derewên dikirin ecêb bûn. Rojekê cardin min ji Reşîd Beg re dixwend, navê lawê wî Mehmûd bû. Ez û Reşîd Beg li odeyekê bûn û Mehmûd, diya wî û xwihên wî û zarokên min û diya wan li salonê rûniştibûn. Mehmûd ji wan re diştexilî. Carekê Reşîd Beg ji min re got,"Bise lawo, Mûsa bise," got: "Dengê Mehmûd tê te." Min got, "E." Mehmûd digot; "Îmana min ji derewan dire. Ma qey însanê bi namûs be diziyê dike?" Reşîd Beg li min nêrî û keniya. Got, "Binêr lawo Mûsa, Mehmûdê me ne bi tenê diz û derewîn e, ehmeq e jî." Min got, "çima apo?" Got; "Lawo gerek bigota, carinan ku li mirov teng bibe mirov tiştekî didize yan jî ji bo mudefa xwe derewekê dike. Hema rebeno gerek tu hunera xwe hebekî mudefa bikî. De ne mêrik bêaqil e."

Timî ev; serpehatiya min û hikûmeta Tirkiyeyê tîne bîra min. Bê çawa ciwanmêrî û namûs bi Mehmûd nediket bi hikûmeta me jî nakeve, de binêrin bê dibên çi: îsal 60 sal in û niha jî li Tirkiyeyê heqê însanan tine. Lê cemiyetek çêkiribûn ji bo heqê heywanan.Tên Şirnexê keçikên neh salî dikujin, lawikên 13 salî

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dikujin, extiyar û pîren 70 salî dikujin, ew vê wekî qehremantiya xwe dihesibînin. Lê masiyek ji Rûsya reviya hat dora Sînopê Gerze, hikûmet û xelk rabûne ser lingan, dibên emê vî masiyî çawa xelas bikin? Yanî li pêş dinyayê dikin ku va ye tirk ev qas medenî ne û bi merhemet in. Ev derew û sextekariyên wan wilo pir in. De îcar elhemdulilah dinya bi wan hisiyaye, bûne wek Mehmûd û Reşîd Beg.

**18 - 24 Nîsan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Ez çawa bûm nivîskar?

Ez ji xwe re dibêm nivîskar. Çi nivîskar çi hal! Pirsek Gandî heye. Di sala 1947an de ku hindî ji bin destên îngilîzan xilas bûn, Gandî ji xortên hindûyan re wiha dibêje:

'Lawo hûn ji me bi siûdtir in. Hûnê ji îro pê ve di nav hewayeke binamûs de mezin bibin. Lê ya me, em di nav hewayeke bênamûs de mezin bûn.'

A min jî wilo ye, ez yeqîn dikim ku ez di nav hewayeke binamûs de mezin bibûma belkî bi rastî ez bibûma nivîskarek. Belkî yekî mezin jî. Heke niha tiştik miştiknan ez dinivîsim wek malê qaçaxçiyan bi tirs min peyde kiriye û bi tirs ez difroşim. Ji bo vekirin û firotinê çiqas malê min hatiye girtin û çiqasî ez ketime hepsan û çiqas zemanê min bertelef çûye? Gelek caran heval ji min re dibêjin. Tu çawa wilo kin nêyta xwe pêk tînî? De ka ez ji we re bêjim: "Min li 'Adana Erkek Lîsesî' xwend. Mamosteyê me yê edebiyatê Arif Nîhad Asya bû. Di wextê me de xelk-perest bû, heta xelkê hemû bi çavên komunîstan lê dinêrîn. Belê rehmetî vê taliyê Turkeşçî derket.

Şaîr bû, du kitêbên wî hebûn. Navê yekê "Ayetler" bû û navê ya din jî "Hadisler" bû. Fikra xwe li gorî gotina wî yanî wek ayetên Quranê û hedîsên pêxember kin û bi mane dinivîsî. Di dersên xwe de mesele didan me û diçû bi panzdeh pirsan û bi bîst û pênc pirsan û bi pêncî pirsan hûnê baxçe îfade bikin. Wextê ku me dinivîsî, wek telgrafan me pirsên xwe dihejmartin. Van sed salan rehmetî wilo bi me daket. Ez texmîn dikim ev kurt nivîsandina min piçkekî ji wî tê. Wekî din jî ez difikirim ku nivîsandin qabîliyetek xwezayî ye. Mesela 40-50 hevalên min ên wêsinifê hebûn, yek ji wan nebû nivîskar. Belê ku cewher di însan de hebe, hedîse dibe sedema der-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ketina wî cewherî. Wek tehtik mermer tu parçeyekî jêkî dibe teşekî mermer, lê ku tu herî ji tehtek albeşk jêkî çiqasî tu şep bikî, nabe teşekî mermer. Çima dengê hin însanan xweş e, çima hin însan şaîr in, çima hin însan sazbend in? Kes nizane çima. Erê xebat jê re divê, lê belê ew cewher pê re heye. Ez yeqîn dikim niha hûn min bikujin ez nikarim li zirnê xim. Ya din jî di şiklê nivîsan de ji van nivîsandinên min re dibên mîzahên siyasî. Yanî mirov zilma ku li mirov dibe,bi henekî dibêje. Ne ji xêra xwe re lê ji tirsan mirov bi henekî dibêje. Berî niha bi çend salan hîn jî zilm pir bû, rebenên nivîskar nikaribûn bi henekî jî zilma zaliman bigotana. Êdî heywan diştexilandin.

Wek Kelîle û Dimne, wek La Fontaine û wekî din jî di nav xelkê de çîrokên guran, şêran, roviyan û ker û kîroşkan û yên din. Xeyala xwe bidinê di çîrokan de wexta ku nivîskar qala zilma şêr dike bi pêşin dibêje, eman mîrê min, tu çiqas spehî dikujî, bi lepekî tu wan diperçiqînî.

Rovî tim wek siyasetçiyen me yên niha ye. Bê yên me çawa îro dikevin bin dûvê paşan xwe xelas dikin, rovî jî tim di bin dûvê şêr de ye, xulamê wî ye, yê ku di bin lingan de dire di çîrokan de tim kîroşk e, berx û beran e, carinan jî ker e. Tu li tarîxê binêre, dinya pir nehatiye guhertin.îsal 700-800 sal hin bi zorê rovî bûye Coşkun Kirca.

Bi vî awayî ku min çavên xwe di zîhnê û di bin çîzma zordaran de vekiriye ez yeqîn dikim ev tesîr jî di nivisandinên min de ne. Ez dinêrim bi hezaran min nivîsiye, lê kêfek, maçîkirinek heta wincikek di yekê de tine ye, hemû bi derd û êş in. Lê carinan ji tirsan re ez bi henekî dibêjim. Kanî pirseke tirkan heye, dibê: "Güleriz ağlanacak halimize."

Yanî halê me, yê girî ye em pê dikenin. Pirseke ereban jî heye, mêrik bi zorê kirine koçek ji şêx re dilîze, di stranên xwe de dibê: "Li min nenêrin, nebêjin bê ez ji kêfan re direqisim, tu serê kevokekê jêkî û bavêjî erdê ew kevok jî dike pirtepirt, mirov dibêje qey ji kêfan re dilîze".

Mîsalek din jî heye, erê şerm e lê kalikekî me heye berî niha bi

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

1600 salî wiha gotiye Marmeta: "Tiştên ku li dinyayê dibin û hene ku mirov binivîsîne ne şerm û ne guneh e."

Dibê Sultan Ezîz hez ji lawikan dikir. Li Stenbolê bi spehîbûna xwe deng bi lawikekî cihû ketibû. Sultan Ezîz dibê ileh hûne wî lawikî ji min re bînin. Lêwik jê re tînin, emrê Sultan. Sultan Ezîz pêlewan bû. 130 kilo bû û lawik jî wek çêlikê xezalan e. Tembihê li lêwik dikin, kuro binêr ku Sultan nezîkî te bû tu nekî car bar, talî wê serê te û yê bavê te jêke. Lêwik dikin nav lepê Sultan. Xelifeyê Pêxember diçe cem lêwik, ruhê lêwik dire û nikare bike qîrîn jî lê cihû di hemû alî de bi aqil in. Heta ku jê te dibê 'padişahim çok yaşa' yanî bijî padişah. Ya me jî wek vêna ye.

Gelek caran em êşa xwe jî encax bi pesnê wan karin îfade bikin.

Ez yeqîn dikim heke hûn ji min re dibêjin nivîskar, bi vî awayî ez bûme.

Hûn ji min re sax, hûn ji min re sax.

**25 Nîsan - 1 Gulan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Manukyan Xatûn*

Helbet Manukyan Xatûn ji gelek tacirên tirkan bi şereftir e, ma em ji wan dizên welêt re nabên beyefendî? Li welatên medenî kî baca xwe bi rastî û temam bide dewletê, ew bi namûs tê hesibandin.

Yanî guh nadin tolazî molaziyê. Wekî din jî, Manukyan Xanim, xizmetekê amade dike. Digotin berê, xelîfe û padîşahan xerac ji kerxanan dixwarin. Alimên Îslamê fetwa dabûn ku ev pere helal e, digotin: "Qehbik xwe difroşin û tiştên ku dikeve destê wan keda wan a helal e."

Ji Manukyan Xanim pirsîne: "Ev îsal sê sal in ku li Tirkiyeyê kes bi qasî te bacê nade dewletê, ev çi mesele ye?" Manukyan Xanim wiha bersiva wan dide: "Ez însaneke bi namûs im, ez sedî kar dikim, şêstî didim dewleta xwe."

Yanî, Manukyan Xanim dibê, ez bi namûs im, baca xwe bi helalî didim. Lê tacir û hunermendên Tirkiyeyê bênamûs in, baca xwe nadin.

Bi xêra bacê, binamûs û bênamûs derketin meydanê. Hinek ji wan, deynê wan, 50 milyar, 100 milyar derket. Talî wan hevdu efû kir.

Ma emê ji wan tacirên ku baca xwe nadin re bêjin çi? Ne hewce ye em tiştekî bêjin, ji xwe wa ye Manukyan Xanim tif dike rûye wan. Gelo ji vê meselê re Vehbî Koç, Sakip Sabanci û Hecî Halîl Demîrel dibêjin çi? Xwedê neke, ku ez bedêla wan bûma, bi kêmanî minê serê xwe di hizûra Manukyan Xanim de serberjêr bikira.

**25 Nîsan - 1 Gulan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Dibe dibe

Miletên ku ne cihgirtî bin û koçer bin îşên wan ên ecêb hene. Mesela îro, di ala serokcumhûrê me de 16 stêrk hene. Rojekê min pirsî, min got ev çi stêrk in? Gotin heyran her stêrkek di tarîxê de berbengî dewleteke tirkan e. Min got, ma kîjan dewlet in. (Ê ku ez û ew bi hev re dipeyivîn profesor Ahmet Ateş bû, turancî bû û li gorî niha ger ne heqaret be turkeşçî bû) Got Mûsa, dewlet û împaratoriyên me tirkan koçebe ne yanî koçer in. Min got, ê lawo, ku em kurd jî koçerên xwe bihesibînin û carekê aleke me çêbibe, em dikarin 50 stêrkan pê ve deynîn wekî; Rojkan û koçerên Rojkan, yên Alikan, yên Pencenariyan, yên Milan, yên Heyderan, yên Hesenan, yên Celaliyan û bi sedan yên din.

Van eşîrên me jî ti dewlet nas nedikirin û di bin siya serokatiya xwe de bûn. Ê ma hûn çima nîvstêrkeke din jî bi beyreqa xwe ve nakin, ew nîvstêrk jî bila ji bo Qibrisê be.

Ez dinêrim, ev dîrokên bêaqilî ku ketin tarîxa miletan, ew milet li dinyayê lêvok dibe. Çima îro tirk bi xwe hisiyane dibên ji tirkan pê ve dostên tirkan kes tine ye. Hûn çima qebehetê li miletan tînin. Ê lawo niha li dinyayê 170 milet hene, ma kî ji wan miletan re hemû gotiye bibin neyarên tirkan, ne gerek e mirov ji xwe re bifikire kuro?

Xwedê qebûl neke, demekê ez jî zabitekî qehreman bûm. Me dersa dûrbîne dida eskeran, em topçî bûn, di tesbîta armancê de mekîne hene. Navê wê telometre ye. Mirov li çi armancê binêre, ew mekîne ji mirov re dibê ev qasî dûrî te ye. Ku mekîne tine be, mirov tiliya xwe ya girdek dide ber çavên xwe, li armancê dinêre û li gorî wê hesab dike. Car din ku mirov nizanibe, mirov neqeba xwe û armanca xwe dûr û nêzikiya wê hîn dibe. Lê îcar ku mirov

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ji tiliyê jî fêm neke û telometre jî tine be? Tirkan tiştekî ecêb derxistiye, bi tirkî jê re dibên "Olsa olsa usulü", yanî gerek e ev qas be, lê tim ev texmîna mirov vajî derdikeve.

Ez niha dinêrim ev olsa olsa usulî ketiye heyata dewleta tirkan a hiqûq û îdarê jî. Tim dibên olsa olsa. Yek ji van olsa olsayan, li welatê kurdan ev jehra koricî û olaganustu hal e. Kuro lawo, îsal ev qas we got olsa olsa lê tim tivingên we qerewane diçin, yanî li hedef û armancê nakevin.Vê mesela qerewanê ez kin ji we re bejim. Berê li eskeriyê yê ku li nîşanê nedixist ceza dikirin û dişandin qerewanê, xwarin dianîn û paşê jî qerewanê bi wan didan şuştin.

Yên ku Tirkiyeyê îdare dikin jî 6-7 paşayên qerewanetiyê ne. Niha dibên emê 4 mehên din jî li Kurdistanê qerewançîtiyê dom bikin. Ê lawo îsal çend sal in we ev îş dirêj kir, hûn bûn qatilên bi hezaran kurd û tirkan, heta ji we çend paşayên bi vî aqilî hatin kuştin, me çi fêm kir?

Paşeno hişê xwe bidin serê xwe û yeqîn bikin êdî ew 'Yeniçerî axalerî' bi destê we nakevin.

Binêrin niha, yek ji we ji Bedlîsê ye û herî mezinê wê ye, mêrik dibê ez ji Kurdistanê me. Lawo paşano hişê xwe bidin serê xwe, nekevin ber gunehên kurd û tirkan.

**2-8 Gulan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Turgut Şovalye*

Ev ji me kêm mabû. Bi henekî cube lêkirin, bû doxtor, me got de xem nake. Îcar dibên bi çûna wî ya Amerîkayê wê wî bikin şovalye. Berê ji leşkerên xurt re digotin şovalye. Ev kar di nav gawiran de hebû. Me misilmanan ji yê wilo re digot fêris, egîd û pêlewan...

Ez ditirsim doza Lordiyê jî bike. Li Îngilistanê, li kaba kê benik girê bidin êdî ji wan re dibên Lord. Bi tirkî jê re dibên "dizbagı" bi kurdî girêdana kabokê. Qralîçeya îngilîz, li kaba kê vê girêdana kabokê girê bide, ew zilam dibe çelebî, yanî Lord. Em xelkê Tirkiyeyê, ji şovalyan "Don Kîşot" nas dikin, ew jî şovalyekî tew lo lo ye. Xulamekî wî hê jê qeşmertir heye, navê wî Sanço Pança ye.

Ez dinêrim, ku Ozal bibe şovalye, namzetê Sanço Pançatiyê jî Mesud Yilmaz e. Ev demek e Mesud Yilmaz jî, wekî hevalbendê xwe Sanço Pança, zêde zirtan li xwe nade.

Turgut Beg, bi aqil e, le carinan dixurife, mesela, ku ez bûma, min ev nîşan qebûl nedikir. Niha, ku werin ji min re bêjin, were emê te bikin muxtarê gundekî, minê bigota na, ji ber, ez nizanim û nikarim muxtariyê bikim. Ê de yabo, Turgut Beg, tu li ku der û şovalyetî li ku der?

Sedemeke din jî heye ku gerek Turgut Ozal şovalyetî qebûl nekira. Mesele ev e, terîqeteke filehan a şovalyetiyê li Amerîkayê heye. Ev terîqet ji beriya niha bi 900 salî, ji ehlî selîb maye. Turgut Ozal Beg Neqşîbendî ye, yanî ji terîqeta ehlî sunet e. Îcar wê çawa ehlî selîb û ehlî hîlal, nîşana bi hev bidin û hevdu xelat bikin? Ê min aqlê min ji vî karî ti tişt nebirî. Xêr û guneh di stûyen Turgut Ozal û sofiyên filehan de be.

**25 Nîsan - 1 Gulan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Seb û fesadî

Di 18.2.1992an de waliyê ku nû tayîn bûn li Çankayayê çûn ziyaretiya Turgut Ozal. Turgut Ozal, ev şîret li wan kir: "Dijmin seb û fesadiyê ji aliyê polîs û eskerên we de dibêjin:

Yeqîn mekin, di vê her kesî ji we li wilayeta xwe destê xwe bidin pişt polîs û eskerên xwe."

We zilamê mezin dît, bê çi şîretan li waliyê xwe dike. Yanî mana wê ew e ku hûn jî alîkariya polîs û eskerên xwe bikin, kî bêje nebêje bila îşkence, zilmê û xerabiyê dom bikin. Heta niha min digot çawa der heqê Ozal de ew qas tişt tên gotin û çawa dihêle, çawa tehamul dike. Lê min nêrî ku hey lo mêrik li ku ye. Lo li kerxanê bezandin, kirin diz, kirin xesbçî ji aliyê pîreka wî û zarokên wî de tişt nema ku nehat gotin. Bû xezûrê defçiyan lo hezar tişt gotin ne xema wî ye. Ez dinêrim, vê şîretê li polîsan jî dike. Belê di heqê wî de car din di vê tarîxê de tiştekî gelekî xweş hat gotin. Karkerek li Aydinê temamê îaşa xwe dike weqif. Niha adet derketiye ku yek îaşa xwe bike weqif wê dilê wî, gurçikên wî, çavên wî bi hinek saxan ve bikin. Le mêrik şertek kiriye weqfa xwe. Dibê ku ez mirim hûn parçeyên min bi kê ve dikin bi wan ve bikin, lê bi Ozal û malbata wî ve nekin.

Nizanim karkerê me yê delal ev mesela di tarîxa îslamê de bihîstiye yan na. Mesele wiha ye: Dibên rojeke li Bexdayê berxekî çavreşî sê mehî spehî anîn ku ji Îmamê Ezam re serjê bikin.

Yekî ji îmam wiha pirsî:

- Muhterem, ev heywana xweşik ku hê ti tam ji dinyayê nekiriye ma serjêkirina wê ne guneh e?

Bersiva Îmam Ezam hezretlerî li mêrik wiha bûye:

- Na kurê min, tewer em qenciyê bi vî heywanî dikin. Di


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Quranê de heywanek tenê wê here bihuştê, ew jî kûçike Eshabilkef Qetmîr e. Niha ezê vî berxikî bixwim, wê tevli xwîn û îaşa min bibe, bi qeweta Xwedê ew jî bi min re wê têkeve cenetê.

Îcar ka em bên ser karkerê xwe û malbata Ozalan. Ez dibêm hema tirsa karker ku navê parçeyên wî bi Ozalan re bin, ji ber vê fikrê ye: Karker dibê çawa be ewê herin cehnemê ma çi ji min re lazim e, parçeyên min ên feqîr jî bi wan re bişewitin. Min gelekî divabû ez vî karkerê camer bibînim, min divê ku em hemû xwe ji wan li vê dinyê û wê dinyê jî bi dûr xin.

**2-8 Gulan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Mesela 49an

Çîroka me dirêj e, em di 1958an de girtin, tu li lêrasthatinê binêr; ku girtina me di 17ê çilê pêşîn de bû, yanî roja ku Mewlana Celaledînê Rûmî miribû. Me jî, ji girtin û îşkenceya xwe re digot Şebî Arûz, ji ber ku ji mirina Mewlana re jî dibên Şebî Arûz. Yanî Şeva Zavatiyê. Ev şev di imrê însanan de şeva herî xweş e. Mifetişe MÎTe Ergun Gokdenîz tê Enqereyê, ji xwe li Enqereyê bû û wekî Mîllî Guvenlîka niha teşkîlatek hebû lê pirên wan ne paşe bûn, Celal Bayar, Adnan Menderes, Ruştî Zorlu û Serokê Kurmayê yê duyemîn Cevdet Sunay bû. Ergun rapora xwe ji wan re dixwîne, dibê ku em hezar pêşengên kurdan bikujin wê doza kurdan bi kêmayî 30 salan li paş bikeve. Celal Bayar dibê temam. Serokê Kurmayê duyemîn jî wekî wî. Lê Wezîrê Derve Ruştî Zorlu dibê, heyran wele ez vê qebûl nakim, ji xwe li derve em rûreş in, bi kuştina ermeniyan, rûman û kurdan. Bi zorê vê birînê qemûşk girtiye, ez nikarim car din bixwirînim û 1000 kurdî bê mehkeme û qanûn bikujim. Tevfik Îlerî Tûranî bû, yanî bi zimanê niha turkeşçî bû. Dibê hevalno hûn zanin bê ez kî me, erê ez dijminê kurdan im, lê ku niha em rabin 1000 kurdî bê mehkeme bikujin tavil wê Kurdistan li ber me rabe û îsyan bike, emê bi destên xwe Cezayîre bînin Tirkiyeyê, ev ne xeta ye? Wê çaxê cezayîrî li ber Fransayê rabibûn. Dimîne Menderes. Menderes dibê hevalno ji xwe ev tiştê ku di rapora MÎTê de ye cezayê wê îdam e, da ku pêşî em ji wan 50 hebî bigirin, bidin mehkemê bila mehkeme qerara îdama wan bide, emê jî 50 kesî îdam bikin û paşê 50-50 emê hezarê xwe xelas bikin. Ve qerarê didin û li Enqereyê dadgeha "Kara Kuvetleri" 50 heb muzakereyên tewqîfê bênav çêdikin û didin MÎTê ku navê kê têxê dibe ya wî.

Ji van 50 kesan yek jê ez bûm. Ev çîroka me 50yan ku di çape-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

meniya Tirkiyeyê de navê we danîn 49an ji ber ku hevalekî me Emîn Batur di hucreyê de bi îşkencê hat kuştin. Wextê em derketin mehkemê, em man 49, ji ber vê yekê tirkan û çapemeniya dinyayê ji me re gotin 49'lar, yanî yên 49an.

Ezê vê dozê paşê binivîsim. Lê niha şaxekê ji vê mehkemê bînim ber çavên we. Ji ber ku em di hepsê de bûn di 1960an de îxtîlal çêbû, êdî raporên bi dizî hemû hatin mehkemê, yek jê jî wiha bû; MÎTa Diyarbekrê di heqê min de raporek nivîsandibû. Di raporê de wiha digotin: Erê Mûsa Anter niha hay ji xwe dike, tiştekî nake, lê li otelê, li loqantê, li sûkê û qehwê heçî ku wî dibînin kurdîtî tê bîra wan. Hakim xwend, li min nêrî û keniya, got Mûsa tu dibê çi?

Min got, hakim beg ma ezê bêm çi, hema tu dibê çi bila ya te be. Ma minê li Diyarbekrê çarşef li xwe kira ku kes min nebîne, ne we û Kemalê we çarşef jî kir qedexe. Ez yeqîn dikim ku min çarşef li xwe kira wê car din raporek bihata mehkema we, îcar wê bigotina Mûsa Anter dikeve qiyafetek bêwir û sapik, eger hûn nexeyidin qerar bidin wê. Êdî ji îro pê ve ji bo îbreta alemê ezê bi çarşef bigerim. Hakim keniya û got na lo, guh mediyê, ev îşê sewtariyan e.

Belê xorten kurdan, îsal 60 sal in, ez bi van bêbavan re têkoşînê dikim. Meqseda min ne ew e ku ez xwe mezin bidim xuyakirin, lê min di vê ev tiştên ku bi serê min hatine ji we re bibe dersek.

Ev jî wiha.

**9-15 Gulan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Stuyê Kerîm

Heyata miletan jî wek a însanan e. Çawa însanên feqîr û dewlemend hene, milet jî wisa ne. Pirsek heye dibên ku yekî dewlemend çekekî nû li xwe bike, xelk hemû jê re dibên pîroz be û ku yê feqîr li xwe bike, jê re dibên te ji ku anî, kê da te. Ji însanan re zanebûn û spehîbûn jî wiha ye. Yekî feqîrê bê nav, ku zana be jê re dibên qure, ku dewlemend û bi diran be jê re dibên alim.

Mîsalek xweş jî li gundê min Stilîlê heye. Feqîrekî gelek spehî û henekçî hebû. Bi kurdî ji yên wiha re dibên qirikgaz, yan jî qirika wî li ser gazekê ye.

Bêhenek bejna Kerîmê dirêj, spehî bû. Axayê eşîra Omeryan Evdelê Silêman jî wek Kerîm bû. Ew jî bejindirêj bû û qirika wî li ser gazekê bû. Rojekê Kerîm ji min re got: "Şêxo, te xiyala xwe daye xelkê."

Min got çawa Ebdulkerîm? Got:

"Kuro Xwedê mal nedaye min, lê ev bejin û stuyê xweşik daye min, îcar kes nabêje qirika Kerîm li ser gazekê ye û spehî ye, dibên qerabê stuye Kerîm! Yê Evdelê Silêman jî wek ê min e û belkî bi qasî yê min dirêj û spehî jî nabe, le ji bo ku ew axa ye, dibên yabo qirika Evdelê Silêman li ser gazekê ye. Ez dinêrim yê miletan jî wiha ne û di jîna miletan de jî em wek Kerîm in. Marîfet û qenciyên me, yan miletên dora me nas nakin û yan jî ji xwe re dibin. Îro ev ziwabûna me ya ku em wiha be jî, çiyayî û beyar mane, ji destên van miletên dora me yên wekî axa ne. Em ji wan spehîtir in, lê yên me tim qerabe ne û yên wan li ser gaz in. Pirseke Sêwrekiyan heye. Eşqa Sêwrekiyan hebekî di pesinandina xwe de ye.

Hevalekî me yê Sêwrekî hebû, hingî qala xwe dikir û xwe dipesinand, me digot lawo şerm e kuro, tu gelekî xwe dipesinînî.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Digot ma yabo ku ez xwe nepesinînim xelk lawê bavê min in, min bipesinînin.

Gerçî ev bersiva wî wê çaxê me vaj û şerm didît, lê ez niha dinêrim ku xebera wî ye.

Divê em kurd jî li benda xelkê nemînin, kes lawê bavê me tine, divê em xwe derxin rûye dinyayê. Pirseke pêşiyan heye, heta niha me bi ya wê dikir. Dibên: "Şeb û şekir, çûn Diyarbekir, şekir rûnişt deng nekir, şeb rabû pesnê xwe kir." Heta niha em şekir bûn, em rûniştibûn, me deng nedikir. Şebê pesnê xwe dikir. Hûn zanin, şeb tehl, şor û bêtahm e û nayê xwarin û şekir jî ji xwe tê zanin ku çiqas şêrîn e. Hûn zanin, Xwedê zane ku ez çiqasî bê hewadarî difikirim, kurd wek şekir in û tirk, ereb û ecem ji wek şebê ne.

Ev jî bila bi şekir û şêraniyê temam bibe.

**16-22 Gulan 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Zimanê dê*

Niha neviyekî min heye, navê wî me kiriye Bahoz. Bahozko ji niha ve bi kurdî zane lê bi tirkî hîn nabe. Carinan, radyokek min a biçûk heye, ez dikim dawa wî ku bi tirkî xeber dide lawik dibê lew lew lew. Yanî dişibîne dengê heywanan. Lê ku ez dibêm lawo ka tilîka xwe bide min ez bixwim. Mal û milke wî tiliya wî ye, ew jî wê dike devê min.

Gelek caran ez jê re bi kurdî distirêm ma strana min çi stran e. Ez ne Îbrahîm Tatlises im, heşayî min. Ez Amedê jê re dibêjim. Hema ku ez dibêm; "Lê Amede Amedê, ew dibê tu beyreqa kurdan ê. Ala rengîn hildayê", ew lawikê yanzdeh mehî hundirê çavên wî dikene û ji min re bi dest û lingan dilîze. Gerçî berê jî min bi qîmetê zimanê zikmakî, zanîbû lê vî lawikî ji profesorekî bêhtir ders da min. Qenc ez hîn bûm ku tiştek di ser zimanê diya me re tine ye.

Îsal 63 sal in ez bûme hêsîrê zimanê tirkî. Bê çawa hêsîrekî bi namûs hêsîrtiyê bi rast û rihnî qebûl nake, ez jî hînî zimanê tirkî nebûme. Erê tirk dibên zimanê kurdî tine ye, lê ez bi ilmî dibêm zimanê tirkî tine ye. Hema di van 60 salan de ez hînî pênc zimanên tirkî bûm. Di mekteba pêşî de yek, di ya navê de yek, di lîsê de yek, di unîversîtê de yek û yek jî yên ji derve. Ne kesî emir daye tirkan, wan zimanê xwe wiha kir.

Ji ber vê yekê ez nebûm nivîskarekî qenc bi kurdî, wan qedexe kir û tirkiya wan jî ne tu gû bû ev qas taba min a îsal 60 salî bertelef çû. Ez ne xwe dipesinînim lê ez yeqîn dikim ku îsal 60 sal bi fransewî, îngilîzî, almanî bi vê tabê daketima bi kêmanî ezê bibûma wek Victor Hugo, Goethe, Jean Jacques Rousseau û Shakepeare.

Lê çi fêde ji qewlê Nabî ve bi tirkî dibê, "Öyle bir nehri muaz-

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

zam gibi çuş etmiyem fakat heyhat kurak sahralardan akıp geçmişem." Yanî ez wek çemekî mezin im mesele wek Dîcle û Firat im lê çi fêde ez di çolan re derbas dibim, kes ji min fêde nabîne.

Tirkiye jî ez kirim wek Dîcle û Firat. Ji Kurdistanê derketim û ez ketim çolên Ereban cihên xerab û bêfêde.

Ji ber vê yekê îşê min zor e, fikra min û mêjiyê min kurd e. Lê ez mecbûr dibim bi tirkî binivîsim. Ji ber vê yekê ez dibêm îşê min zor e. Nivîsên min giş tercume ne. Tercume ti carî nabin wek eslê xwe. Ji ber vê yekê fileh û misilman dibên Quran û Încîl nayên tercumekirin.

Ku bên tercumekirin wê cewhera wan winda bibe. Gerçî sedemên din jî ji vî awayî re hene, hema ezê jî vê qebûl bikim. Ev nivîsandinên min ên bi tirkî ku rij in, bê tewaş in ji ber vê yekê ye; ez bi kurdî difikirim û bi tirkî dinivîsim.

Çiqas ecêb û zilm e. Ma kesî dîtiye ku nivîskarekî alman bi fransewî şaheseran binivîse, yan jî yekî îtalî bi yewnanî? Kî bêje nebêje wek min 60 salî di nav vî agirî de nemaye. Ez zanim bê ev çi agir e û zilm e!

**14-20 Hezîran 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Li ber zarokên te dikevim*

Cenewar elameta wehşîtiyê ye. Gerçî eslê cenewar heywan e, le ji însanên ku di vî tebîetî de ne re jî dibên cenewar. Car carinan li welatan, ev tîpên wiha peyde dibin, ji kêfê re ji bo tiştekî ne hêja bi dehan, bi bîstan însanan dikujin. Li Ewropa Birûkê derketîbû. Ji kêfê re 20 pîrek û zarok kuştibûn. Li Mêrdînê Ebdê Semt Hebû, wî jî ji bo kêfa xwe pîrek û zarok dikuştin.Wekî din jî carinan di rojnameyan de derdikeve dibên Sakarya Cenewarî, Îzmîr Cenewarî, Rîze Cenewarî û yên din.

Ev cenewar tim ne însanên xeyalan in jî. Carinan qumandar in, reîsê dewletan in, heta hakîm û sawcî ne. Di vê nivîsandina xwe de pirsa me li ser seroksawciyê Dadgeha Dewletê ya Ewlekariyê (DGM) Demîrel e. Çiqas ez dinêrim Nusret ji Ebdê Şêt, ji Birûkê jî xerabtir e ku bi ya wî bibe, wê temamê me kurdan bikuje. Siûda me heye ku ev mêrik ne leşker e ma ku subay ba û tiving di destê wî de ba û tewer şeva Newrozê li Şirnexê ba xeratên dinyayê hemû nikarîbûn tabûtên me xelas bikirana. Nusret bi yekî û diduyan qayîl nabe, vê qalê mêrik 22 heb ji me neqandine, weleh me îşê wî rehet kiriye, me ji xwe re neqandine, çavên wî lê ye ew ji xwe re bibe. Ma lawo tê van 22 mebûsen kurdan bi ku ve daliqînî, wê kîjan sêpê xwe di bin wan de bigire?

Hele însaf û ilim bi te re tine ye, ma aqlê te jî tine ye? Kuro ku ji te bê û tu wan daneliqînî tu ne ji bavê xwe bî! Ne wê dû re dinya dewleta te daliqîne kuro bê aqil. Min tu dîtî, wek pisîkekî ziyanok tu newêrî ji qula xwe derkevî û di qula te de jî neh deh polîs te mihafeze dikin. Yanî mehkema te DGM mehkemesî ye lê rebena dewletê bi zorê te dike bin guvencê.

De hema xwediyê xwe û vî aqilî be. Binêr bê tê bigihê ku. Ez li ber te nakevim, lê ez li ber zarokên te dikevim...

**21-27 Hezîran 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## *Parsek e bi şûr û qertek e*

Ez li hikûmeta Tirkiyeyê mam ecêbmayî. Du camiyên Stenbolê yên mezin hene. Nezîkî hev in. Dibê parsekekî bi qapan wek ku kurd dibên; "Mal mitirbî ye, lê bejin hakimî ye". Ev parsekê me jî yekî wiha ye. Gerçî qala gelek eşqiyayên ciwanmer tê kirin, mesela wek Koçero, ku pere ji dewlemendan distend û dida feqîran. Ji bo wî parsekî jî bi tirkî dibên;

"Ayasofya da dileniyordu. Sultan Ahmet'te sadaka dağıtıyordu." Yanî li ber deriyê camiya Ayasofyayê pars dikir û diçû ber deriyê camiya Siltan Ehmedê li feqîran pere belav dikir. Em jî ji yên wiha re dibên:

Parsek e, bi şûr û qertek e. Qertek bi kurdî wek mertal tê bikaranîn. Bi tirkî wek vê pirsek din jî heye. Dibên; "ekmek yoktur yemeye, atla gider sıçmaya."

Em van pirsan tînin ser hikûmeta me ya îro. Lawo ma çima hûn hedê xwe nizanin? Li Kurdistanê xortên hêja hene, hêja ne sed û bavekî we.Hîn sih salî ye şeş lawên wî hene.

Lê mala min ê, hatina wî ya salewext du hezar dolar tine ye. Tu zanî we çi kir, ji bo ku dinya hemû tinazên xwe bi we bike, rojek yekşemê, li kuçeyên Amerîkayê, ji bo ku hûn di ber re diziyê bikin, we çû qûna xwe hejand, deh mîlyar pereyê vî miletê feqîr xerc kirin. Dê ka binê berê we çi kir, ez yeqîn dikim ew şêst kesên ku hûn çûbûn wir, me wek koleyên berê hûn bifirotina çiftlikên Amerîka, we 10 mîlyar nedikir.

Niha jî wezîrekî we heye, Xwedê qebûl neke bernavê wî Ergenekon e. Min got Ergenekon hat bîra min. Di tarîxa Çercis Zeydan de alim dibêje: "Selçûkî dibên wextê ku em ji welatê xwe yê Asyaya Navîn derketin, kûçikekî rê şanî me da." Yanî ne gur e ha.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Bila Turkeş qenc zanibe ku rêberê wî kûçik e, ne gur e. Ergenekon di 24ê gulanê de wiha digot: "Ji bo rehetiya dinyayê çiqas lazimiya ku heye, emê alîkariya Cumhuriyetên Asyaya Navîn bikin." Car din emê bînin ser pirsek xwe ya pêşiyan. Dibên ku destê te bi rûn be, peşî di serê xwe de bide. Ma lawo, te çi alîkariya wan bikî? Yanî hebek zadê ku li Kurdistanê çedibe, tê erzan ji Kurdan bikirî û bişînî ji Yecûc û Mecûcan re. Ger hûn ciwanmêr û binamûs in, ji bo rehetiya dinyayê û welatê me pêşî alîkariya Kurdistanê bikin. Ma dikeve serê te û hevalên te û em birçî bin û genimê Serêkaniyê bişînin Asya Navîn. Belkî tu karibî bişînî, lê tu yeqîn bikî em jî nahêlin tu rehet bimînî.

Ma ê me em her nerehet in û em hînî nereheti û birçîbûne bûne. Lê sewelekên wek we, çelîkên muhalebiyê emê di bêvila we re bînin.

Alî welatê xwe neke, here alî welatê xelkê bike û dûre jî wek ehmeqan bêje ji bo rehetiya dinyayê em wiha dikin. Ma kî ji we ehmeqtir e, ku ji we bawer bike.

Niha li Stenbolê em di axa yewnan de ne, divê em hinek ilmê yewnaniyan yên kevin jî zanibin. Fîlozofên yewnan ên qedîm dibên: "Her kes devê deriyê xwe paqij ke, mehele hemû paqij dibe."

Ê ma Ergenekon, ku hê tu vê nizanibî ezê ji te re çi bejîm? Di edebiyata Osmaniyan de, teşbîhek wiha heye, dibên:

"Filankes bakar gibi bakar." Malûm e, bi erebî bakar ga ye, yanî dewar e.

Dibên filankeso bi tirkî; dinêre, yanî wek ga dinêre. Bi gumana min, wezîrên me yên niha gelek ji wan jî "bakar gibi bakıyorlar." Yani wek dewaran dinêrin.

**28 Hezîran - 4 Tîrmeh 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Wedat Aydin

Ez nizanim bê ji bo Wedat ez bêjim çi. Pêşî min divê ez wî ji paşnavê wî, ji Aydin xelas kim. Pir şerm e ji me re ku em navê Wedatê pak bi Aydin bilewitînin.

Gerek em bêjin Wedat "Rohnî". Bi rastî Wedat şewitî lê bi şewata xwe Kurdistan rohnî kir.

Erê li Kurdistanê pir Wedat Rohnî hene. Lê Wedatê mezin ji kurdan re wek agirê Zerdeşt (Axura Mazda) ye. Çima em nabêjin şewata Wedat wek agirê Newrozê ye.

Ma emê çima bêjin, em bawer dikin ku agirê Wedat ji temamê agirê Kurdistanê yê pîroz bilindtir e.

Ma ezê ji te re bêjim çi Wedat?..

Pirsek şaîrê me Cegerxwîn heye û wiha dibêje.

"Zana dizanin ez kî me, Yên ker dibêjin kafir e."

Wedatê Ezîz, rehet razê, ji xwe mirin û xew birayê hev in. Mirin xewek dirêj e.

Miletê te zane bê tu kî yî...

Di roja 1.7.1992an de wezîre tirkan ê hundir, di rojnameyên tirkan de dibêje: Wedat Aydin terorîst bû.

Ez difikirim heta niha kesekî wek Îsmet Sezgin terorîzma kurdan tarîf nekiriye. Ji pirsên Sezgîn tên hînkirin ku terorîzm, hareketek namûsî ye. Bi rastî jî wiha ye.

Ma ku Wedat terorîst be û sûce wî ev be, bavo welehî ez jî terorîst im. Lê Îsmet Sezgîn çi dike, ji bavê xwe de bê minet e.

Pirsek Îsmet Înonu heye û wiha ye:

"Bi kêmanî divê mirovên bi namûs ji yên bênamûs mêrtir bin."

Wele em kurd kesekî ji xwe mêrtir qebûl nakin.

Îsmet Sezgîn çi dibêje bila bibêje. Ew û Silêman Demîrel bila

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

guh bidin hev, ma ya me çi ye. Ew li gora hev in...

Pirsek tirkan heye, dibêjin, "tezekten terazinin, boktan olur dirhemî," yanî ku mêzên ji rêx û tepikan be divê derhem û xiramên wê jî ji gû bin.

Ma ya me çi ye. Kurd êdî hew malê xwe bi mêzênên bi gû diwezînînin.

Wedatê pak! Em gelê kurd giş ax û xwîna te pîroz dikin.Tu bawer bike bi min mabe xwîna te li erdê namîne. Sonda gelê kurd ev e Wedat.

**5-11 Tîrmeh 1992**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## Nifûsa Tirkiyeyê

Ê min, ez tim nifûsa Tirkiyeyê dişibînim bênderekê. Li Kurdistanê li ser bênderên me ceh, genim, nok, nîsk, şolik û kizin li ber hev in. Em ji gişan re dibêjin bêndera me. Lê em nabên bêndera me tev de genim e, yan jî nîsk e. Le îsal 70 sal in, ez dinêrim xwediyê bêndera me bi ehmeqî û ji bo ku xwe bi qapan bike û xelkê bixapîne dibê bêndera min hemû genim e. Li ser genim deynan dike, zad bi zad tîne, wextê bênderê deyndar tên dinêrin ku xwediyê bêndere derew kiriye.

Îro hikûmeta Tirkiyeyê jî bûye wek wê bêndervaniyê. Ev qas sal digot: "Li Tirkiyeyê ji tirkan pê ve kes tine ye." Lê ku îro xwediyê deynan bi qirika wê girtine, bêndera wê derket meydanê. Ji bo vê mesela Bosna Hersekê, hikûmeta me dibê: "Tewlo, ma emê çawa qebûl bikin, îro li Tirkiyeyê 4 milyon hemwelatiyen me yên boşnaq hene." Gelek baş e; ez kefil, li Tirkiyeyê 4 milyon arnawut, 4 milyon çerkez, 4 milyon ereb, 4 milyon laz, 4 milyon çîngene û 15-20 milyon jî kurd hene. Ev yên misilman, îcar nîv milyon jî ermenî, rûm û cihû hene. De îcar Başbûx Turkeş; tebayên te çend kes man?

Lawo! Turkeşçî û Kemalîstno, xwe bistirînin, weleh ku çarşefa we jî, ji ser we bê daxistin, hûnê tazî bimînin. Evê ku man jî, yên eslê xwe înkar kirine ne. Dibên em tirk in! Ma lazim e ku em wan jî bêjin? De hema emê du sê heb ji wan bêjin; yek Kamran Înan, yek Necmedîn Cehwerî, yek jî Hikmet Çetîn, ev ên kurd. De îcar Coşkun Kirca,Kenan Evren, Suleyman Demîrel, Turgut Ozal jî, kes nizane ji ku derê ne. Em karin vê listeyê bikin çend milyon, lê de bila ev qas be.

Hûn zanin, ez çima van dinivîsim, ez ne nijadperest im û em

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

kurd tev de jî ne nijadperest in. Em ne dijminê ti miletan in. Lê ez dinêrim, ev qirş û mirşên ku dibên em tirk in, niha tiştek derxistine, berê me digot "Türkiye ordusu, Türkiye polisi, Türkiye bankasi." Lê ew niha dibêjin "Türk ordusu, Türk polisi, Türk bankasi û hwd." Ji aliyekî ve jî navê kurd û Kurdistanê datînin "Doğu, Güneydoğu." Wezîfa ordiyê û polîsan ne ew e ku bi merhemet herin ser welatekî xerîb û ne ji xwe. Ji ber vî awayî, heta ku ji destê wan tê kurd û Kurdistanê dikin bin lingan û diperçiqînin. Banka jî bankayên wan in, ev banka bi mîlyaran, bi trîlyonan pere li tirkan belav dikin, heqê wan jî heye, ji ber ku ev banka yên tirkan in. Lê ji ber ku ez kurd im,ez herim bankayên wan, 100 qurûş jî bi deyn nadin min, dîsa heqê wan heye, lewra ez kurd im.

Êdî ez hew dirêj bikim, bes e, yên mane jî, bila xwendevanên minî hêja bifikirin.

**12-18 Tîrmeh 1992**

## Birçîbûn

Ev pirs ji kurdan re ne pirseke xerîb e. Ji ber ku xelkê em tim birçî hiştine, lê pirsa min li vir ne li ser birçîbûna zik e. Ez niha dinêrim û îsal 60 sal in jî, min ji xwe dîtibû ku xort û zarokên kurdan birçiyê ilm in û birçiyê zanînê ne. Ne hewce ye mirov bêje, însanên têr mirov nikare îkramê ji wan re bike. Lê, yê birçî îş rehet dike. Pirsa Elanî Pêyiyan heye.

Dibê:

"Birçîbûn aşçiyekî baş e, yanî ku însan birçî be çavê wî li xwarinê ye." Ilim jî û zanebûn jî wiha ye. Xelkê em kurd birçiyê xwarinê jî kirin û yê zanînê jî.

Min li Edeneyê lîse dixwend, hevalê min ne ehmeq bûn, lê giş zarokên dewlemendan bûn, ez feqîrê herdu xalan bûm; ilm jî û zik jî. Min deh carî ji wan bêhtir dixwend û ez dixebitîm.

Ne ku ez ji wan bi aqiltir bûm, lê ez birçiyê ilim bûm. Mêrikan ne muhtacê tiştekî bûn. Bav û kalên wan ên diz, hemû tişt ji wan re hazir kiribûn. Lê yê min tiştek tine bû. Lê, ne ku ez jî bi diziyê di nav wan kevim, min divibû ku ez zanebûnê di nav miletê xwe xim.

Min zanibû ku bi hezaran xortên kurd ên wek min birçiyê zanînê hene.

Ez niha dinêrim bi kêf û eşq ku xortên kurdan bi ser birçîbûna xwe vebûne. Ez ne bi pesindan dibêjim, lê ez dinêrim ku li çiqas cihê xwendina xortan heye xortên kurd li pêşiyê ne. Çawa xwarinek bê ber mirovan, pêşî yê birçî dest davêjinê niha ilim jî ji xortên kurdan re wiha ye. Şaîrekî tirkan ku eslê wî arnawut e heye. Navê wî Tevfîk Fîkret e.

Navê lawê wî jî Halûk e. Kitêbek nivîsiye navê wê "Haluk'un

Defteri" ye, ango deftera Halûk e. Li Stenbolê têkiliya Tevfîk Fîkret û amerîkiyan bi hev re hebû.

Lawê xwe Halûk şand Amerîka tehsîla elektrîke. Li wir pirsek wî ya xweş heye. Bi tirkî ye, lê emê bi kurdî bêjin: Dibê; `lawo Halûk bi qeşa ji me re şewqê werîn, ketina me ji reşayê ye`. Ez vê pirsê ji xorten kurdan re dibêjim: Xortino! Hûn birçiyên zanîne ne, vê kemasiya xwe qebûl bikin û ber pê ve herin.

Heta ku hûn nebin zana û wek mesela Tevfîk Fîkret û lawê wî, hûn bi qeşa û hembêzan şewqê neyînin pêşiya miletê kurd, emê bikevin û emê tim li erdê bin.

**75-25 Tîrmeh 1992**

## *Kes nizane çawa bûye wezîr Necmedîn Cewherî*

Ji berê de li Tirkiyeyê ez li paşnavan dimînim ecêbmayî. Mêrik kurd e, ereb e, çerkez e yan jî ermenî ye, carinan jî wek Alparslan Qereçiyê Qibrisê ye, tirsonek û pepûk e, lê paşnavê wî Tam Turk, Xalîs Turk, Koyu Turk, Turk oglu Turk û Turkeş e. Ji aliyê din de jî Aslan e, Kaplan e û Qehreman e.

Carinan jî wek vî feqîrê me ye Ûrfayê, bê çawa Tirkan henekên xwe pê kirine ji Ûrfa re gotine Şanli Urfa, ji Necmedîn re jî dibên Cewherî. Lê Xwedê jî zanê piçika Cewher bi Necmedîn re tine ye.

Di edebiyatê de ji pesnê re dibên vecîz, ayet, hedîs. Bê ev çiqasî bi qewet in, ev şitexaliya Necmedîn jî ew qasî vala û beaqilî ye.

Piştî Newroza me ya bi xwînê şuştî, ji ber mêrik Kurdistanî ye hikûmetê ew şand nav xelkê. De ka binêrin, li Şirnexê ku ordiya faşîst kevir li ser kevir nehiştiye, bi sedan zarok, pîrek, xort û kalên me şehîd kirine, Necmedîn dibê: "Şirnexîno, ez nehatime sersaxiya we, dewlet ti carî namire." Kuro lawo Necmedîn ên ku mirine ne ji dewletê ne kuro, zarokên Kurdistanê ne.

Hûn bi qedrê Xwedê kin, guh medinê ku tiliya xwe nizanim kirine ku dera wî, wî kirine wezîr, di vê peyva Neco de me dev ji Cewher berda, de ka tê de aqil mantiq, şeref û namûs heye? Yek li cem me hebû qewil digotin.

Digot: "Newala hêviyê bi kevir e û reqe reqê siwaran e." Digotinê ev qewl in kuro, digot ma hûn karin wilo bêjin? Ev jî Necmedînê me ye. Na weleh Necmedînê min ez nikarim wilo bêjim, ji ber ku ez kurdekî bi namûs im.

Binêr Necmedîn, ji Ruhayê gelek kurdên binamûs jî derketine, ne hewce ye em herin heta Hz. Îbrahîm Xelîl, lê hema di van 400-500

salên dawî de gelek ên ne wek te ji Ruhayê derketine, wek Nabî, Kemal Badillî, Faîk Bucak û Mustefa Remzî Bucak.

De binêre bê Nabî dibê çi: "Weke ku ez dixwim nan û hinar ezê k...walî texim q... defterdar." Yanî ezê nan û hinarê bixwim, lê ez minet û benamûsiyê qebûl nakim. Faîk Bucak jî dibêje:

"Sonda me mirin e, di riya te de welat,
Kefen kirasê me ye, mirin xeml û xelat."

De binêre Necmedîn, wan ên ku sonda Faîk Bucak pejirandine, tu diçî nav wan û dibêjî ez nehatime sersaxiya we. Ayeteke Quranê heye, Hz. Muhemed ji apê xwe Ebu Leheb re dibêje: "Tebet yeda Ebu Lehebî." Yanî deste te hişk bibe Ebu Leheb.

Ezê jî ji te re bibêjim; Necmedîn Cewherî devê te hişk bibe.

**16-22 Gulan 1992**

## *Heywan jî dijminê xwe nas dikin*

Heywan dijminê xwe bi bêhnê, bi dîtinê û bi destdanê nas dikin. Di tarîxa îslamê de hedîsek pêxemberê me wiha heye. Dibên ji eshabiyan re digot: Filankeso kafir e û wisa derdiket. Rojekê Hz. Omer dibê: "Ya Resulillah tu çawa wilo bi rastî tê derdixî, gelo Cebraîl ji te re dibêje?" Hz. Muhemed dibêje: Na heyra ji bo naskirina dost û dijminan ne hewce ye ku mirov pêxember be û Cebraîl wehî ji aliyê Xwedê ve ji mirov re bîne. Hûn jî karin tê derxin. Hema binêrin bê hûn hez ji kê dikin, ew jî hez ji we dikin û bê hûn hez ji kê nakin ew jî hez ji wê nakin."

Lê ez nizanim bê îro îdara Tirkiyeyê dawa çi li me kurdan dike, ma lawo ser bextê we be hûn hez ji me dikin ku em jî hez ji we bikin? Ne min ji we re got heywan jî dijminê xwe bi bêhnê û bi dîtinê fêm dikin. Ma hûn her roj bên bavê me bişewitînin, zarokên me bikujin, namûsa me li ber lingan bidin, xaniyên me ku bi hişkeberê bi ser me de bihedimînin ma emê çawa hêz ji we bikin? Ma em kurd wek heywanan jî nayên ku em hez ji kumê we yê şîn bikin.

Hevalên tirk pirsek we heye, hûn dibêjin "Kalb kalbe karşıdır" yanî dil miqabilê dil e. Weleh hûn ji Xwedê yeqîn bikin heta ku karê we ev kar be em hez ji we nakin. Û hûn jî zanin ku di ilme sosyal de qaîde ye ku tiştekî mirov jê bitirse mirov hez jê nake. Belkî niha hûn di dilê xwe de dibên qey hûnê kurdan bitirsînin wê bi vî awayî bibin kolê we, lê ez dinêrim, îsal hezar sal in em bi hev re ne, ewqasî serê we hişk e hîn we kurd nas nekirine. Gerek we zanîba ku em kurd ne tirsonek in. Ma ne bi vê şeref û qabîliyeta xwe em di nav ewqas dewlet û miletên zalim de mane heta îro, me xwe gihandiye vî awayî û em li ser lingan in.

De îcar ka ez şîretekê li we bikim. Hûn dibên ji tirkan pê ve kes

dostê tirkan tine ye. Weleh hûn rastiyê dibêjin. Ev jî ji emelê we ye. Ma we kî bi xwe re dost hiştiye, ereb, ecem, ermenî, bulxar, rûm û yewnan we bi vê wahşeta xwe ji xwe re kirin dijmin. Maye maye di erênayê de kurd mane, hûn digerin ku wan jî bikin dijminê xwe. Ê ma lawo tirkino ku temamê dora we dijminê we bin û wek ku hûn dibêjin, "bir Türk cihana bedeldir" yanî tirkek beramberî dinyayê ye ne wiha be hûn hemû yek yek Hezretî Elî bin hûnê çi bikin? Ez vê dibêjim ji ber ku niha di welatekî de em şirîkê hev in. Min navê belayeke mezin bê serê we eger hûn bi aqil bin. Ez yeqîn nakim, lê ez dibêm ma heta niha hûn bi aqil nebûne ji niha û pê ve wê Silêman Demîrel û Turgut Ozal we bi aqil bikin? Lê dîsa jî min divê hûn hebekî hay ji xwe hebin. Binêr welehî ku hûn xwediyê xwe û vî aqilî bin hûnê çem û çem herin.

**23-29 Gulan 1992**

## *Paleya pûş*

Pirseke me kurdan heye, însanên ku bêmane û fêde dike firtefirt em ji wan re dibêjin fîlankeso paleya pûş dike, yan jî palê pûş e. Pûş sapê bêsimbil e, tu çiqas gêre bikî, ka ye li ber bê diçe.

Ez niha dinêrim hikûmeta Tirkiyeyê yan jî li gorî gotina wan hikûmeta tirkan wek palê pûş e. Nizane bê çi dike, çi dike vala ye. Gêre dike, zad tine, tev li ber bayê diçe. Me dev ji yên berê berda, de ka hûn bi qedrê Xwedê kin ev çar-pênc meh in hikûmeta Silêman Demîrel çi palêyî kiriye û çi zad hilaniyê? Mêrik rabû ser xwe ez nizanim kê dixapîne, got; `êdî em bûn Dewleta Muazam`, yanî em bûn dewletek mezin. `Axa me ji Behra Adriyatîke heta Behra Çînê dom dike, nifûsa me 180 milyon e, ma edî wê kî xwe li ber me bigire, em bûn lehî û ketin dinyayê`. Got ku hinek eleqa xwe ji tirkan bînin yanî ji Azerbaycan û Nexçîwanê, ezê quba ezmên daxînim erdê`. Wextê ku ev di televîzyonan de got Xwedê şahid e tabîreke me mêrdîniyan heye, min jê re gotibû "uzrût". Dawî me nêrî ku du milyon û nîv ermenî bi qirika 180 milyon tirkên S. Demîrel girtine û devê wan di erdê de difirkînin. Jê re gotin;

- Ma tu çima deng nakî begefendî? Ne te digot ezê ezman daxînim erdê!

S. Demîrel bi vî tebîetê xwe yê eyarfireh got:

- Na heyran ma em karin dest bidin ermeniyan, dinya li piştа wan e.

Ê ma Silo wê ji te re nebêjin ma te berê ev îş nizanîbû, erê tu li ber xwe nakevî, ma tu li ber xelkê Tirkiyeyê jî nakevî, ku tu me fedîkar derdixî. Ev yek, a duyemîn bi hela hela Turkeş jî da kêleka xwe, yanî Turkeş turancî ye, bir turanê ji xwe re kir beyreq. Ka ew çûna te bû çi Silo? Hê tu li wir bûyî qirxizan bi qirikên hev girt-

ibûn. Tu hatî Azerbaycanê ji alikî de wan li hev dixist, ji alîkî de jî ermeniyan li wan dixist. Te rahişt şewqa xwe û tu revî hatî. Bû çi?

Wekî din jî ev pênc şeş meh in te wextê xwe bi merasîman, bi seyahetan derbas kiriye. Çûna we ya Amerîka Tirkiyeyê rezîl kir, tu çûyî Asya Navîn. Kumê me ji serê me ket, xelkê gurîbûna me dît. Te merasîma "Anayasa Mahkemesi" çêkir, xeberdana te û ya Serokê mehkemê li hemberî hiqûqçiyên dinyayê em rezîl kirin. Niha jî wek van rojan ji Ecevît, Turkeş, Coşkun Kirca re dibên Enwer Paşayên biçûk. Çavên te lê ye ku tu jî bibî Ataturkê biçûk, ku tu "Îzmîr 3. îktîsad Kongresi" li dar dixî. Tu jî zanî û ez jî zanim, tiştek ji kongreya te jî dernakeve.

Dawî keçika te Çîller çi bêje wê ew be. Çîllera feqîr jî pirsek tirkan heye dibêje: "Doluya koyuyorum almıyor, boşa koyuyorum dolmuyor," yanî ez dikim a tijî narê, ez dikim a vala tijî nabe. Yanî jinik dibêje ekonomiya me paleya pûş e. Ez ji bedêla te bûma minê dev ji vî îşî berdaya. Ma îşê ku mirov nizanibe û li xwe bike bela! Ma yabo çend car berdan te? Ma tu li hetikandineke din digerî? Em li ber te nakevin, lê bi te re em jî dişewitin. Bes e kuro. Palê pûş!

**30 Gulan - 5 Hezîran 1992**

## *Silêman Demîrel û erzanî*

Navekî xerab bi dû Silêman Demîrel ketiye. Dibên tim soz dide u dûre dike derew. Wiha ye, ne wiha ye, ne hewce ye ez bêjim, hûn hemû pê zanin. Lê di vê hilbijartinê de sozek dabû, gotibû ezê erzaniyê bînim Tirkiyeyê. Lê îro em dinêrin xelk dibên na, ne erzanî, buhayî anî Silêman. Hema yê min ez ne wiha difikirim. Silêman Beg tişt gelek erzan kirine yê din jî belkî hêdî hêdî bike. Ên ku pêşî erzan kir pere ye. Ma di kîjan dewrê de wek dewra Silêman pere ev qas erzan bûye? Îro bi şebeşekî tûrek pere tê. Bi pîvazekê mirov kare 1000 weraqeyî bikire. Tewer bi sê bizinan mirov dibe milyoner. Ma wê rebeno ji wilo û pê ve çi bike? Ê me em gundî ji Silêman xweş in. Ji ber ku satilek mastê me bi qeflek pere digire. Ê ku mast, pîvaz û şebeşên wî tine ne, memûren wî ne, biyên wî ne, sewiyên wî ne emelmenden wî ne. Hanî li çavên wan dinêrî û ew serê mezin dihejand digot: "İşçilerim, memurlarim, dullarım, ye-timlerim ve emeklilerim." Ev reben jî radibûn ser teriyê û ji Silêman reli çepikan dixistin. Ma ya me çi ye. Ê me ji me re pere erzan kirine, ji wan re pîvaz, şebeş, goşt, buha bûye, cehenem kiriye. De hema emê wilo bermeqlûb bidin pey hev. Binêr be kî li fêde ye û kî li xesarê ye. Kulmek genimê me jî bi 1500 wereqî dere, em ji qulmişken çiftlikên Ceylanpinarê simbilan bi hev din, bikutin bikin genim emê car din têra xwe pere bi hev din. Bi vî aqilî ez dibêm Silêman ji aliyê me kurdan de pirsa xwe anî cih. Pere erzan kirin. Ez dibêm hema ev cara ku bê jî em raya xwe bidin Silêman Demîrel bila qenc pereyan erzan bike.

**7-13 Hezîran 1992**

## *Elîkê Hesenê Dao*

Elîkê Hesenê Dao, lawikekî ji Stilîlê bû. Malbata wî dewlemend bû. Lê Elîko tirale bû. Milkê ku para wî ketibû giş firotibû apê Xelê Hesenatê.

Min Xelê Hesenatê dîtibû. Erê ne xwendibû, lê li gorî dîtina min Xelo filozofekî xelkê bû. Hinek dikarin bêjin: "Ma yabo, Xelo li kîjan unîversîteyê xwendibû ku bibe filozof ?"

Lê ne wiha ye. Kîjan filozof û heta pêxemberan jî unîversîte qedandine. Sokrat, Eflatûn, Arîsto, Diyojen, Hz. Mûsa, Dawud, Silêman, Îsa, Muhemed û Îmamê Xezalî ji kîjan unîversîteyî mezûn bibûn?

Îro em li profesorên ku unîversîte xwendine mêze dikin erê ew fedî nakin, lê em ji ber wan fedî dikin. Hema van rojan li Tirkiyeyê hilbijartina rektorên unîversîteyan hatiye holê, em dinêrin xwedê qebûl neke, ew tirtire û profesor, yanî zaneyên me ji bo malê dinyayê wek kûçikên ku li ser hestiyan bi qirika hev digirin, bi hev ketine.

Ez dinêrim pirê wan serê xwe li ber Silêman Demîrel, Turgut Ozal û Îhsan Dogramaci, yan jî li ber leşkeran tewandine.

Pirsa me li ser filozofê me, Xelo bû. Pirsên wî yên filozofî li ba min pir hene. Çawa Eflatûn piştî mirina Sokrat gotinên wî kirin kitêb, divê ez jî pirsên Xelo bikim kitêb.

Ez çawa bikim? Divê min zû ve ev kar kiribana. Lê van faşîstan em li paş hiştin. Ez çend salên din sax bimînim, ev hesret jî bi min re naçe gorê. Ez filozofê me Xelo, dişibînim filozofê îngilîzan Bernard Shaw. Henekçî bû. Gundiyek jê dipirse:

- Xalê Xelo, tu çawayî?
- Tu sax bî lawo, ez wek beranekî me!
- Ê ma çima tu ji xwe re jinekê nayênî?
- Ma lawo beranên xesandî tine ne?! De em bên ser Elîkê Hes-

enê. Me got ku Elîko bê kar bû.

Heft-heyşt zaroken wî çêbibûn. Lê ne milk, ne mal û ne jî karê wî hebû. Di sala 1920an de îngilîz ketibûn Iraqê û bi saya wan îş vebûbû. Kurdên Tirkiyeyê piranî diçûn Mûsilê xebatê. Elîko û zarokên wî jî xwe ji bo çûnê hazir dikirin ku herin Mûsilê. De îcar xortek hê ji Elîko bêkertir ji Elîko re dibêje:

- Apê Elîko, de ka ez jî bi were bêm.

- Lawo, eger tu xulamtiya min bikî, ezê te bibim,

- Hema ez xulamekî te Apê Elî.

Dibin deh nefs û ji gund derdikevin. Ne pereyê wan heye, ne jî xwarina wan. Hema ku ji Stilîlê bi du sê gundan dûr dikevin, tûr davêjin stûwe lawik û satilê dikin destê wî û dişînin nav gund ku parsê bike. Lawik tiştên ku ji gund tîne, Elîko û zaroken xwe dixwin, lewra lawik xulam e, nikare bi axayê xwe re bixwe. Kurtêl û gep mepên ku ji ber Elîko û zarokên wî dimînin davêjin ber lawik.

Ew bi vî awayî digihên Mûsilê. Elîko dibe zibhal (çöpçü). Lê dinêre ku parsa lawik zêdetir bi fêde ye. Ji lawik re dibêje:

- Xorto, hema tu car din parsê bike, ne hewce ye tu bixebitî.

Li Mûsile jî karê xortê me dibe parsekî. De îcar, Mûsilî bajarî ne, nan û xwarina wan xewş e. Elîko û zarokên wî bi saya lawik xenê dibin.

Rojekê, ji Stilîlê Mihemedê Ûso ji min re wiha got:

-Li Mûsilê ez li lawik rast hatim, turê wî tije nanê genim bû û satila wî jî, tije goşt, tirşik û birinc bû. Min got: Ma xorto tu jî li vir î?

- Erê wele xalo ez jî li vir im. Ez xulamê mala Elîkê Dao me.

- Ma ji te re baş in?

- Bi Xwedê Elîko ji min re baş e, lê jina wî Nûrê min birçî dihêle.

- Ma kurê kerê, kê bi te girtiye? Lawo, parsa ku te kir, li qorziyekê rûnê, pêşî jê têr bixwe û yê ku ma jî bibe bide wan, dîno!

Ma hûn zanin min ev çîrok çima nivîsî? Em kurd heta niha, wek wî xortî, bibûn xulamê xulaman; tirk, ereb û eceman.

**26 Tîrmeh - 1 Tebax 1992**

## *Hikûmeta me ya îro û dînîtî*

Di hiqûqê de, îradeya însên dudu ye. Yek di destê însên de ye û yek jî ne di destê însên de ye. Ji ber vê yekê, mêrikê ku îrada wî ne di destê wî de be, yanî dîn be ne mesûl e. Li gorî şerîete jî wilo ye, zilamê din ne mesûlê her pênc şertên Îslamê ye; ne rojî, ne nimêj, ne hec, ne jî zekat, heta qebûlkirina yekîtiya Xwedê jî lê ne ferz e.

Bêaqilî jî nexweşiyek e. Ma ne bi tirkî jê re dibên, "akıl hastası." Bê çawa mirov ji yekî kor re bêje "tu çima nabînî?" û yan jî, ji yekî kerr re "Çima deng nabî xwe?" dibe bê aqilî, mirov li benda yekî dîn û bêaqil be ew jî bêaqilî ye.

De îcar hikûmet jî navê hikma şexsiyetan e, yanî wek miroveki tê hesêb. Îro ez çiqas li hikûmeta me dinêrim, ez wê dişibînim zilamekî dîn, nizane bê çi dike û çi dibêje. Mesela li dora Çemê Tuna eşîrek dudu hene, ewropî ji wan re dibêjin Qereçî, li Tirkiyeyê ji wan re dibêjin, "Gagauz Türkleri."

Ez nizanim bê hejmarên wan çiqas in, Tirkiye ji wan re dewletê dixwaze, ji Tataran re dixwaze, ji Qibrisê re dixwaze, ji Nexçîwanê re dixwaze. Lê ku tê ser bi milyonan kurd, kef bi devê hikûmetê dikeve, çavbeloq dimînin û hema weke yekî dîn ê di qeydê de, bêşiur dikin qîrîn;

"Hawar e, hawar e, em li bakurê Iraqê dewleta kurd qebûl nakin."

Gerçî qebûlkirin û neqebûlkirin ne di destê wan de ye, lê ne me got dîn e.

Ev tamsariya wê pê dimîne. Bi van kirinên xwe kurdên di bin hikûmdariya xwe de jî tine dihesibîne. Ma gelo dînê me nafikire ku wê 20 milyon kurd li ku derê veşêre. Çima ji bo wan çîngeneyên te yên Qibrisê, tatarên Qirimê û gagawuzên Ewropayê serxwebûnê

dixwazî? Ev her sê xelk jî mihacir in, ne li ser erdê bav û bapîrên xwe ne û wê bibin xwedî dewlet? Lê kurdên ku ji dehhezar salan ve, li ser erdê bav û kalên xwe ne wê xulamê we bin!

De îcar me ji serî de gotibû mêrik dîn e, em li qisûra wî nanêrin. Ez yeqîn nakim lê emê daxwazekê bi serê zimên jê re bikin: Xwedê lê bê rehmê.

**2-8 Tebax 1992**

## *Welat*

Ma Kurdan li ser welatê xwe çi nekirine û çi negotine? Lê çi fêde... Weke Seydayê Cegerxwîn ku dibêje:

"Welatê me tev zîv û zêr e
Lê çi bikim maye ji xelkê re"
Faîk Bucak jî li ser welat wiha dibêje:

"Sonda me mirin e di riya te de welat
Kefen kirasê me ye, mirin xeml û xelat"
Şaîre kurd Abdurahman Rahmî, di helbesta xwe ya "Hêsîrti"yê de dibêje:
"Eşqa welat, eşqa welat
Te cerg û mêlaka me paht"

Em ji sala 1915an re dibêjin "sala mihaciriyê." Lê bi rastî, em kurd tim di welatê xwe de jî mihacir in. Tewer niha tirkên mihacir, ji me re dibejin "sığınmacı", yanî tirkan bi xêra xwe kurdên Zaxoyê li Silopiyê hewandine. Le ma ezê çi bêjim. Çavê felekê kor be!

Sala mihaciriya me ya meşhur, dema ku Osmanî li ber Uris belav bûn û reviyan. Uris heta Bedlîsê hatin. Kurdan dev ji mal û milkên xwe berdan û bi çolê ketin. Sê par ji wan ji birçîbûnê û ji nexweşiyê mirin.

Ez wê sala mihaciriyê çêbûme. Paşê ku ez bûm şeş-heft salî jî, hê mihacir li gundê me hebûn. Hesenê Mihacir cotkarê me bû. Ji gundekî Bedlîsê bû. Carinan Heseno eşqa welatê xwe bi stranan digot. Erê stran bi temamî ne di bîra min de ye. Ev heftê sal derbas bûne. Lê serê strana wî wiha bû:

"Welat çiya bilind in te nabînim

Dest davêm gul beybûnan nacivînim
Welat, welato, welato
Bimrim li welatê xerîbiyê."

Min li jor jî gotibû, strana Hesenê Mihacir dirêj bû, lê ez çi bikim, ev qas di bîra min de maye. Xwezî ez jîr bûma, wê tev de di bîra min de bimaya.

Le birakno! Bila pirs di nav me de be û neyar nebihîzin, heftê sal jî ne hindikin haaa!

Keç û xortên kurdan, ma ez ji we re çi dirêj bikim? Gerek hûn zanibin, dayika bi rastî welat e.

Heta ku welatê mirov di destê xelkê de be, dayika me jî wê di "sorgu"yê de be.

Edî dayika reben emanetê jop û "tîman" e.

Wek bezê ku tu teslîmî pisîkê bikî.

**9-15 Tebax 1992**

## *Huseyîn*

Huseyîn lawo, Huseyîn lawo, ma ezê bêm çi? Xelk ji kûçikên xwe yên mirî re ji dibên şehîd, lê ji te re dibên "terorîst." Silêman Demîrel dibê "Ev ên ku tên kuştin ne rojnamevan in, hemû terorîst in. Hê doh şeş cendirme kuştin, ma cendirme ne xwîn e." Yanî mêrik eşkere dibêje,

ew cendirmeyên me dikujin, em jî wan dikujin. Û hê jî em dibêjin, "failî meçhul cinayet." Ma meçhul, yanî nezanî di vî îşî de heye? Silêman Demîrel bi devê xwe dibêje, "qatil ez im." Edî nalet li wî kurdî be ku raya xwe bide qatilê xwe, yanî Silêman Demîrel û partiya wî.

Can Huseyîn! Bi Xwedê devê min nagere ku ez qala şehîdiya te bikim û destê min jî qelemê nagire. Lê ez ji te re soz didim, berê min yek dinivîsi, lê ezê ji niha pê ve, ji bedêla te de jî binivîsim. Elhemdulilah tu ne kurdundê yî, te çû Dîcle û Firad û birayê wan ê din û xwişka wan a din ji me re hişt. Lê îro Silêmanê ku du imrê te kiriye bimre, elhemdulilah kurdunde ye û malê wî yê heram jî, wê ji biraziyê wî yê diz Yahya Demîrel re bimîne. Lê ma ezê çi bikim? Kurdê me yên nezan, xwe dane dora Silo û Silo li me kirine bela. Di buxçika Silêman de, kinceke paqij tine ye, giş dujîn in, bi tirkî dibên "kirli çamaşır". Lê ma ezê çi bêjim? Tevî vî awayî bin ew ji me re dibên "eşqiya" û "terorîst."

Ne min got ez hew karim binivîsim, ma ezê bêjim rehma Xwedê li te be, ji xwe tu rehm î, tu şehîdê welatê xwe Kurdistanê yî.

**16-22 Tebax 1992**

## *Êşa teriyê*

Gereke hûn vê çîrokê zanibin. Dirêj e, di vê quncikê de hilnayê. Dibên marek hebû, her roj zêrek ji zilamekî re dianî. Rojekê mêrik dibêje: "Bi Xwedê, niha qula ku mar jê derdikeve tije zêr e. Ezê mar bikujim û zêran giş derxim. Dotira rojê ku mar jê re zêr tîne, mêrik xwe li ber vedaye, ber diavêje mar û teriya wî qut dike, mar jî edî hew zêran jê re tîne. Dawiya çîrokê hûn dizanin.

Emê bînin ser Coşkun Kirca. Coşkun Kirca bi eslê xwe Cihû ye. Lê zimanek li ser e ku di ti deverê de hilnayê. Pirseke me kurdan heye, dibêjin "ê tirsonek di şevên reş de bi şida distirên." Coşkunê me jî wiha ye. Ev sîh sal in ku ez wî nas dikim, her tim karê wî ev zimandirêjî ye. Dema li Qenedayê sefîr bû, hingî bi lewlewê çû ser ermeniyan ve, ermeniyan jî erîşek birinê, lê gule lê neket, lê ji tirsa, xwe ji qesrê avêt, niha lingê wî û qorika wî şikestî ne û wek kevjalan bi aliyekî bi rê ve diçe. Weke mesela mar û teriyê? Gerçî Coşkun ti zêran ji kesî re nayîne, le ermeniyan teriya wî jêkirine, ji ber vê yekê niha di meclisê de bûye teyrê baz, şer dixwaze.

Ê lawo, Kirca! Tu ne dibî esker û heta tu nikarî di midbexa eskeran de pîvazan jî hûr bikî, îcar ev çi lewlewa te ye? De ka were, madem tu ew çend mêr î, em bi hev re biçin bi ermeniyan re şer bikin. De were, heçî neyê, ne ji bavê xwe be. Ne tu derewan dikî lawo, de wer kero! Ez û tu wek şêrên kurdan, mesela wek Elîke Batê û Şemcûne Henê, emê xûçkên xwe bi hev ve girêdin û hicûm bikin ser topên ermeniyan. Kuro lawo, dev ji van derewan berde, tu ne yê van şixulan î, bayê sor bi te keve lawo!

**23-29 Tebax 1992**

## *Şirnex*

Beri niha bi şêst salan, min li Mêrdînê dixwend. Wê çaxê xelkê bi dizî ji hev re digotin, "Kuro ji Şirnexê mala Axayê Sor hikûmetê gişt anîne û li ba Hopa Reşmilê kuştine"

Wek niha ez zanim, wê çaxê jî, ji bo kuştina şirnexiyan tezînok diketin laşê min. Lê ma minê çi bikira, ez zarok bûm.

Îcar, yanî niha ez mezin bûme, ma ji bo kuştina şirnexiyan ez karim çi bikim?

Dîsa jî, tezînok û qehr para min e.

Ez yeqîn dikim, ev şehîden Şirnexê niha jî, neviyên wan şehîdên berê ne.

Xwezî ez jî, ji wan şehîdan yek bûma. Ma gelo ew şehîdên Şirnexê kêmî şehîdên Ûhûd û Kerbelayê ne.

Na ez yeqîn nakim.

Tê xuyakirin ku Şirnex bûye ala Kurdistana bi şeref. Ji wê alê, xwezî ez piçikek paçik bûma.

Şirnexî, ji zaliman re dibêjin "Hûn ji bavê xwe ve bê minet in. Ma hûnê bi kuştinê me bitirsînin?"

De ka binêrin û guh bidin şaîrê me yê milî bê çi dibêje: "Sonda me mirin e.

Di riya te de welat.
Kefen, kirasê me ye
mirin, xeml û xelat"
Ma îro, ya şirnexiyan ne ev e, çi ye?
Yekî celad hişê wî hatiye serê wî û wiha dibêje.
"Ya rebî ev çi îş e
Em her roj wan dikujin

ew pir dibin
Lê ma em

Roj bi roj kêm dibin."
Celado wekî ku dibêjî.

Qanûnên îlahî û yê tebîetê tim hevalê qencî û heqiyê ne.

Ma wê çawa Xwedê bizrê celadan pir bike.

Berî niha bi şêst salî wextê tirkan Şirnex dan ber guleyan nifûsa Şirnexê pêncsed nefs bûn. Îro bûne sêzdeh hezar. Lê ez yeqîn dikim, ev zalimên ku Şirnexî şehîd kirin, îro nefs ji wan qeliyane.

Divê mirov vê qenc zanibe, tim însanê bi heq berê wî li xêrê ye. Ez yeqîn dikim îro ew xatûnên pak ên kurdan ku zarokên wan li ber hembêzên wan in û ji ber zilmê bi çolê ketine, ewê pir bibin, lê zalimên Şirnexê qumandar, tîm û polîsên çepel wê kurdunde herin.

Ev kurdundetî ji aliyê Xwedê ve, ji niha ve xuya ye.

Ez dibim kefilê Silêman Demîrel û Erdal Înonu, ez sond dixwim, ê bi qesem wê malên wan bi xelkê bimîne.

**30 Tebax - 5 îlon 1992**

## 'Di belgeyên îngilîzan de Kurdistan'

Sernivîsa me, navê pirtûkê ye. Ev pirtûk Ahmet Mesut, ji îngilîzî wergerandiyê tirkî. Ev pirtûk di sala 1992an de di nav weşanên Dozê de hatiye weşandin.

Ê ma birano! Emê ji we re binivîsin û bixwînin jî? Ez ji temamê kurdên xwendevan rica dikim, ku vê pirtûkê bixwînin û qenc bifikirin. We çaxê hûnê fêm bikin, bê ka li pişt deryayan xelkê ji kurd û Kurdistanê re çi çalik kolane û li ber me çi xefk vedane û hê jî vedidin.

Ev pirtûk doza Kurdistanê, ji 1918an, heta 1958an dide zanîn. Lê ez dinêrim heta îro jî, ji aliyê kurdan ve tiştek neguheriye.

Pirsek me kurdan heye "serê xwedî, bêyî xwedî kur dikin." Ez dinêrim, îro jî dijmin beyî me ji doza me xeber didin.

Berê jî wiha bû, niha jî wiha ye. Ma kesî dîtiye ku, neyarê mirov tiştekî qenc ji bo mirov bixwazin û bikin.

Niha ku hûn ve pirtûkê bixwînin, hûnê dost û dijminê xwe baş nas bikin.

Welehî dostên me qet tine ne. Lê hema gotin bûye adet. Pirsek tirkan heye, bi tirkî dibên, "Türkün türkten başka dostu yoktur." Yanî dibêjin, ji tirkan pê ve, dostê tirkan tine ye.

Bi rastî jî wilo ye. Kes dostê tirkan tine ye, heta ew jî ne dostê xwe ne. Ma tirkan mala kê xera nekiriye ku dostê wan hebin? Piştî ewqas zilm zor û tada ku bi sedsalan li ereb, ecem, kurd, yewnan, bulxar û miletên din kirine, wê kî dostê wan be, bi ser ew qas tiştî de, ma wê hîn jî dostên wan hebin?

Em kurd mabûn. Me digot qey, tiştê ku çû, ji xwe çû. Îro welatê me yek e. Ku ji dilê safî em biratiyê bi hev re bikin, emê herdu alî jî rehet bibin. Le ma ka? De bêjin, em kurd çawa bi îsmet

Sezgîn û qumandarê Şirnexê re biratiyê bikin?

Devê wan bişikê, kengî devê xwe vedikin, li ser pelixandina kurdan wek guran dizûrin.

Hevalno! Ez ne reklamkarê firotina tiştan im. Gerek e hûn min nas bikin. Ez di vir de, reklama doza xwe dikim. Min divê ku kal û xortên kurdan giş, vê pirtûkê qenc bixwînin.

Buhayê we jî, heqê mirîşkekê ye.

**6-12 îlon 1992**

## *Aqil û mantiq*

Weleh ez ji bo xwe şaş dibim, ku îsal 80 sal in ez li vî welatî çawa dîn nebûme.

Dibêjin, rojekê Şahê Ecem di xewna xwe de dîtiye ku wê baranek bê û heçî ji wê avê vexwe, wê dîn bibe. Şah ji xew radibe, çi bibîne, deşt û zozan tije av bûye. Edî îmkana şah nemaye ku ji miletê xwe gişan re bêje. Li seraya xwe tembîh dike ku wê avê venexwin. Rojek, du roj derbas dibe, milet giş ji wê avê vedixwin û dîn dibin. Lê ehlê serayê, ji ber ku ji wê avê venexwaribûn, weke berê bi aqil mabûn.

Lê wê çawa bi mîlyonan xelk, xwe dîn û çend ehlê serayê bi aqil qebûl bikin? Xelk li dora serayê bûn kom û gotin: Şahê me û dora xwe giş dîn bûne.

Şah fikirî, ku nikare rastiyê bi ev qas mirovî bide zanîn, Got: De ka ji wê avê bidin me jî. Av dane wan û ew jî dîn bûn, bûne weke hev û li hev kirin.

Ez dinêrim, îsal 80 sal in, bê aqiliya ku min kiriye, min ji ava Tirkiyeyê venexwariye. Ev pêncî û pênc sal in ku ez ji tirkan re dibêjim hûn dîn in, dewleta tirk jî, ji min re dibêje; tu zir dîn î.

De ka, kes nizane bezê guhê bavê wî ji ku ye, hinek dibêjin tatar e û hin jî, li çav û rengê wî dinêrin, dibêjin; ji barbarê Afrîkayê ye. Lê ez yeqîn dikim, ku Xwedê ev zilam ji bo nav Şerqê wek bela şandiye. Navê vî mêrikê meşhur Mehmet Alî Bîrand e. Xwediyê "32. Gün" e. Ev 32, hejmareke tewş e. Çima ne 30 e yan jî yek din e? Maneya wê heye birakno. Di terîqeta bê dîn û îman Masonan de, ku em kurd ji wan re dibên Farmason, rutba herî mezin 32 ye. Yanî wiha tê, xuya ye ku haşayê navê Muhemed, Mehmet Alî Bîrand, Mason ê herî mezin e. Di alema Îslamê de, ji wan re

dibêjin: "Meşrîqê Azam." Wezîfa Meşrîqê Azam jî, ew e ku fitne û fesadiyê têxe nav miletê misilman.

Ma ku ne wiha bûna, wê çawa deriyên serokên dinyayê gişka li ber vekirîbûna. Ev merik, di 1988an de, li gundê min Stilîlê, hat ba min jî. Wê çaxê, min fêm kir ku ev zilam, çalikê ji me kurdan re dikole. Ez dinêrim îro jî, mêrik rima xwe daye ber sînga kurdan. Lê ez nizanim kê pif kiriye qûna wî. Ji temamê kurdên dinyayê re bûye dirî û ketiyê ser riya me. Çiqas tiştekî pîs û xayîn hebe dibêje û dinivîse. Ne hewce ye ku em pirs û herekete wî gişkan binivîsînin. Lê hema tiştên ku di 7.9.1992an de nivîsiye bes e. Min divê ez gotinên wî pêşî bi tirki binîvîsîm.

"Yanıbaşımızdaki Yugoslavya'dan başlıyarak tüm dünyayı saran etnik bölünme süreci yaşanırken, Kıbrıs'ta zorla tek devlet ilkesinin sürdürülmesindeki mantıksızlık gösterilmelidir." Yanî, ku em gotina wî bi kurdî bêjin, mêrik dibêje; ma vê çaxê kes dikare miletekî bi xwe ve girê bide. De yan henek, an rast dibêje. Le ez dinêrim di temamê nivîsandin û xeberdanên xwe de, bêaqiliyeke mezin dike, ji ber ku kurdan nabîne, an jî hinekên din çavê wî girê didin.

Li Qibrisê, ji 50 hezar tirk re, dewletê heq dibîne, lê li Şerqa Navîn, ji 30 mîlyon kurd re dewletê heq nabîne, heqên însanî û demokrasi jî zêde dibîne.

Ma Mehmet Ali Birand! xwelî li serê kurdan be, ku bi xêra te bin.

Hema mineta te jî li serê çiyê!

**13-19 îlon 1992**

## *MÛSA ANTER DI 20Ê ÎLONA 1992AN DE LI AMEDÊ QETIL KIRIN*

Ji bo me kurdan, zaliman lûgatek çêkirine. Di lûgata wan de navê kuştina me kurdan "paqijî" ye. Û tirbên me yên bi hev re jî tim best; gelî, çem û newal in. Li Sêrtê Newala Qesaban, li Dêrsîmê Çemê Mûnzûre, Geliyê Zîlan, Newala Qutê, Sîh û Sê Gule, Çukûrca û Helepçe. Eyy Xwedê! Êdî bes e looo!

## Nivîskariya min

Van rojan xwendevanên min gelek ji min dipirsin û dibêjin çawa tu bûyî nivîskar? Weleh ez jî nizanim. Me bi rastî gelo ez nivîskar im? Ê min ez xwe nivîskar qebûl nakim. Tim ez xwe dişibînim zabit katibekî mehkemê. Hakim qerarê dide û yeko yeko ji zabit katibî re dibêje, zabit katibî jî dinivîse. Erê di biniya ewraqan de îmza zabit katibî jî heye lê qerar ne ya wî ye.

Wek ku ez zanim, nivîskar divê eserên xwe ji serê xwe derxe û fikra wî be. Ji nû ve meselekê derxe meydanê. Lê yê me li Tirkiyeyê ne wiha ye. Mesele ew qas pir in ku ne hewce ye em serê xwe biêşînin.. Gelek caran bi meselên ku em dinivîsin em xera dikin. Ev xerabûn hem ji nezaniya me ye û hem jî, ji tirsa me ye. Tu li eslê wê bigerî li Tirkiyeyê ne hewce ye ku mirov nivîskarekî mezin be. Mesela, derd û bela ewqas pir in ku wan bidî hev bes e. Ez dibêjim hema ku ez bixwazim, ez karim di rojekê de kitêbekê çêkim û min çêkiriye jî. "Birîna Reş" min di şevekê de nivîsî. Hema li van bîranînên min binêrin. Cîlda pêşîn min derxist, sê caran hat çapkirin û ya duduyan di matbaeyê de ye, ya sisêyan jî di deftera min de û di serê min de ye. Ez yeqîn dikim ku, çend salên din jî ez sax bimînim wê xatiratên min bibin 7-8 cîld. Ma wê çawa nebin? De hema jîna min bînin ber çavên xwe. Îsal 70 sal in ez di nava zilmê, agir, neheqî, derewî, bêbextî û heps û zindanan de me. Ê ma nivîsandina van xelas dibe?

Ne ez tenê wiha me li Tirkiyeyê, hemû kevnarên bi namûs giş wilo ne? Dibêjin ji Ewropayê hin nivîskar hatine Kurdistanê û li Anadolyayê geriyane, paşê hatine cem Azîz Nesîn û jê re gotine, "Azîz me digot qey tu nivîskarekî mezin î, lawo lê em dinêrin tu tiştên welatê xwe dinivîsî." Xebera wan e. Ji aliyekî ve em nivîskarên

Tirkiyeyê bi siûd in, lê xelkê me bê siûd e. Ma xema me ye. Em derd û belayên ku tên serê feqîran dinivîsin. Li Ewropa û welatên din yên pêşveçûyî nivîskar ne wek me bi siûd in. Ma wê çi binivîsin. Ma wê bibêjin heqê însanan, bibêjin demokrasî; na, zilma dewletê, îşkence, feqîrtî û bêşixulî di nivîsên wan de tine ye, ku tiştên din binivîsînin jî, ma wê kî bixwîne?

Nivîsandina ewropiyan wek ku mirov ji zilamekî têr re qala xwarinê bike. De îcar ji Stilîliyan re qala girara zer bike, bê çawa guhên xwe bel dikin feqîran. Dibêjin rojekê du xortên kurmancan şert avetinê ber hev, yekî gotiye: "Lawo bi te, di dinyayê de xwarina xweş çi ye? Ê din: "Zîlika pîvazê ye. De ka îcar tu bibêje."

Ê peşî: "Pa lawo ezê bibêjim çi? Te ya herî xweş got."

Tu li eslê wê binêrî nivîsandinên min wek girar û zîlika pîvazê ne.

Lê miletê min birçî ye, bi wan xweş e.

Nivîskariya min ku ez jê hez dikim, heta ji min were ez derdê miletê xwe bê tirs û bê derew binivîsînim e. Ez dibêjim hema ji ber vî awayî min diecibînin. Ne, gerek we îcar jê fêm kiribe. Bê ez çawa nivîskar im û nivîskarî çawa ye...

**4-10 Cotmeh 1992**

## *Ez ji te re nahêlim Silo*

Kî vê dibêje, ma hûn zanin? Başwekîlê me yê bê fedî Silêman Demîrel. Yanî ku ji bo xwînrijandina Newrozê Almanya, Tirkiyeyê heremolo yanî ambargo kiriye Silêman Demîrel dibê almanan eyb kiriye. Yanî Silêman Bey tu rabe bi vî imrê xwe bêfedî û bêwijdan bi mehan berê haziriya xwe bike, ji bo ku tu li gorî wî aqlê xwe çavên kurdan bitirsînî di eyda wan de tu wan bidî ber top û tivingan, li serê çiyayên Kurdistanê xanîkên wan ên hişkeber bi tanqên almanan bi ser wan û zarokên wan de hilweşînî, bila giş di bin de biperçiqin ne eyb e, lê ku alman dibêjin lawo tirkino hela hûn fedî nakin, ma hûn ji Xwedê û me jî natirsin ku hûn bi tanq û sîlehên me, kurdan diperçiqînin. Ev e, ev pirsa almanî ya însanî bi Silêman Demîrel şerm tê dîtin. Îcar însanê ku însanetî bi wan şerm e, çi ji wan re dimîne? Wehşîtî û heywantî.

Di dînê kurdan de ku însanek benamûsî bikira kûça wî radikirin û heta ku ji dilê safî tobe nekira temamê milet ew heremolo, bi latînî aforoz û niha jî ji hukmê aforoze û heremolê re dibên ambargo, dikirin. Yanî kesî silav li wan nedikir, îşê wan rast nedikirin, heta heram qebûl dikirin, destên xwe jî nedidan wan. Gerçî min navê ku li tirkan wilo bê, ji ber ku em welatî û mirovên hev in. Lê ez dinêrim tirk diçin wir. Îro Almanya, Danîmarka, Awusturya em heremolo kirine lê ez yeqîn dikim ku di wexteke nêzîk de wê temamê dinyayê me heremolo û aforoz bike û bi rastî heqê me ye jî. Tu rabe feqîr û fuqaran di roja eyda wan de wan bikuje ma, Silo wê kî ji te re bê aferim.

Hîn jî hindik e. Gerek ewropiyan wek Sedam Hisên li te bikira û ez yeqîn dikim karê te ev kar be tê ji Sedam Hisên jî bêhtir bê naletkirin.

Dinya dizîvire lawo Silêman. Hele te ew pepûkê wek dîkê eloelo Erdal Înonu jî kiriye bin çengên xwe tu wî wek şemo direqisînî, tiştê ku ji wî tê hema wek dînan bê mane bê mane û vala dikene. Şeva din min di televîzyonan de tu û ew belengaz li Erzîncanê dîtin. Car din te wek roviyekî bi fen rast derew propaganda xwe dikir, ew jî li pişt te îbîş îbîş dikeniya. Ez dibêm rast derew te li wir sextekariyek mezin kir. Tu zanî bê te got çi? Te wiha got: "Ev eyd nexweş bihurî, em gelekî dilbixwîn bûn, li Zonguldakê bi sedan zarokên me mirin, li Erzincanê bi hezaran çûn, bi şapê bi sedan leşkerên me çûn." Di vê navê de ev bela hemû hatin serê me, lê te qala kuştina Şirnex û Cizîr û Nisêbînê nekir. Lê ne ji ehmeqiya xwe te qal nekir, ji şeytanî û bêwijdanî tu di ser re çûyî. Yanî em karin bêjin Silêman Demîrel xwe başwekîlê Kurdistanê nahesibîne û ez dinêrim bi rastî jî wiha ye. Ma Silêman çima tu li dezgehê ku Xwedê Erzîncanê xera kir dibî xwedî û tu dibê ezê birînên we derman bikim,

em kemasiyên we nahêlin, ezê ji we re qesir û qonaxan çêkim. Îcar bêmirwet û bêînsaf çima xerakirina gund û bajarên Kurdistanê tu di ser guhê xwe re diavêjî?

Binêr Silêman tu yeqîn bike, bi tirkî te divê bê min tehdît dikin lê ku Xwedê ji te re bihêle, ez ji te re nahêlim.

**13-19 Kanûn 1992**

## *Buyuk Mîllet Meclîsî?*

Navê Meclîsa me Buyuk Millet Meclîsî ye. Yanî Meclîsa Miletê mezin. Ê ma lawo tirkino, meclîsa miletan a biçûk heye ku ya we mezin e, ma gelo meclîsên dinyayê mirov biwezinîne û bipîve ji ya me biçûktir û siviktir heye? Kamara Lordan a îngilîz û Kamara Avam a îngilîz, Senatoya Amerîka, Meclîsa Fransa biçûk in, lê ya me mezin e. Ne hewce ye, heta niha heqareta ku li meclîsa me bûye ew hîn jî biçûktir, heta tinetir kiriye. Le ew meclîsên dewletên xelkê yê ne mezin ji miletê wan hemûyî re bimbarek e, ne medenî û ne esker wek tirba Şêx Evdel Qadir kes destê xwe nikare bideyê û jê re îhtîramê dikin. Pirsa min li ser îro ye. Berê gelek kerş û merş, ne însanetî di vê meclîsa me ya mezin de bihurtine. Em hemûyan zanin. Ma wê kî kê bixapîne? Erê em nikarin qenc meclîsê binivîsînin, yasax e. Lê gerek xwendevanên me ji van pirsên min fêm bikin. Çêlîkekî Turkeş li Enqereyê peyde bûye. Navê wî Nusret Demîral e û di ser kulan re Sawciyê Dewlet Guvenlik Mahkemesî ye. Mêrik rastûrê xwe daye dijminahiya kurdan. Gerçî ew jî ne di ti halî de ye, her kêlî demançe di eniya xwe de dibîne. Carekê ez çûm mehkemeya wî, li Enqereyê di hundirê mehkemeyê de 9-10 polîs li ber bûn ku kes wî nekuje. Nalet li heyata wilo be. De îcar binêrin bê ev verişandina wî ya talî û pîs çi ye? 22 mebûsên me yên kurd hene û ez jî tev li wan kirime. Mêrik îdama me dixwaze. Me çi kiriye hûn zanin? Di wextê hilbijartinê de, me bi kurmancî xeber daye û me ji miletê xwe yê kurd re gotiye; `lawo edî bes e raya xwe nedin bênamûsan û dijminên miletê xwe`. Ev xeberdana me bi Nusret Efendî nexweş hatiye û wan ji xwe re xistiye qanûnê cezayê, nimra wê 125 e, temamê şehîdên Kurdistanê Şêx Seîd û dora xwe, S. Riza û dora xwe û şe-

hîdên me yên din ên nenas jî bi vê madeya wehşî hatin îdamkirin. Lê hîn kela mêrik hênik nebûye. Çavên wî lê ye, me jî bigihîne bav û kalên me. Weleh ê min ez gelekî dixwazim ku bi ya Nusret bibe, min jî têxe şerefa Şêx Seîd û Seyîd Riza. Lê destê min li zarokên min, xortên mebûs nagere. Erê ez zanim ku Nusret û yên jê re dibin qewet nikarin ti gûyî belav bikin, lê hema car din nexweş e. Qezeteyên îro, yên tirkan 23yê gulanê dinivîsin ku Nusret ji meclîsê dixwaze ku 22 heb mebûsên kurd îdam bike. Serokreîsê haşa meclîsa me ya mezin Hocaoglu ev xwesteka Nusret qebûl kiriye û daye meclîsê.

Lê ez qenc fêm dikim ku ev îş bi devê Cindoruk û Silêman Demîrel e. Li gorî hesabê wan Hocaoglu ji partiya Anavatanê ye, em kurd wê ji Anavatanê nefret bikin, rayan bi Silêman din. Kuro nalet li dê û bavê wî kurdî be ku raya xwe bi Silêman û partiya wî de. Niha Anavatan ehmeq e, tiştinan dike bi nezanî, lê partiya Silêman Demîrel bi dijminayî û pîçî dike. Ma Lawo Silêman, kurd ehmeqê te û bavê te ne? Nalet li wî kurdî be ku car din bê xapandin û li dor te bibin kom, bes e lo!

Lawo kurdino ez têm 80 salî, welehî ez ji mirina xwe natirsim lê ez ji bênamûsiya yekî kurd tenê ji mirinê aciz dibim. Ma bavên min, çima hûn çavên xwe venakin, lawo heywan jî dijminên xwe nas dikin, ma hûn wek heywanan jî nayên, malxerabno!

**20-26 Kanûn 1992**

## *Giş yek in*

Li gundekî du pîrekên tolaz hebûn. Rojekê herdu bi hev re şer dikin. Ji hev re dibêjin navdîrekê, berçemkê, axokê, qereqolkê, nav xiramkê û dirêj dikin. Di van pirsan de meqseda wan cihê tolaziyên wan in. Mêrên wan li nav zilaman rûniştine, deng tê wan, yek dibêje: "De binêre niha ev pepûk karin derewna li hev bikin ha!" Lê ji xwe hemû rast bûn.

Tim ku serekên tirkan tên cem hev û bi hev re xeber didin ev mesele tê bîra min. Ti tişt namîne ku ji hev re nabêjin. Ne diziya hev dihêlin, ne derew, ne sextekarî û ne hewedarî. Ez bala xwe didimê, hemû jî rast dibêjin. Ji ber ku giş wek hev in. Dibêjin beroşekê jî beroşekê re gotiye: Keçê binê te reş e. Beroşa din gotiye: Ê te ji yê min reştir e. Ez jî bala xwe didim van mezinên me eybek ku tê ser wan înkar nakin, lê dibêjin tu ji min xerabtir î.

Ev mesela partiyên siyasî jî ji Ewropa hatiye welatê misilmanan. Ji ber ku li wir berî me dîn zeyîf bû, êdî ev partiyên siyasî kirin şûna wan. Li Ewropayê, partî wek mezhebekî ne, wek terîqeteke ne. Hema îsal çil sal in em ewropiyan nas dikin, tu serê wan jêkî jî ji partiya xwe dernakevin. Wek Willy Brant, Palme û Mitterrand. Lê îcar tu li yê me binêre. Terbiya wan a partiyên siyasî jî wek dîn û îmana wan e. Sexte ne. Mesela îsal çil sal me Qereoxlanê xwe Ecevît ji ber komunîzm û sosyalîzm yasax bû me digot sosyal demokrat e, em îro dinêrin ku mêrik bûye xulamê Turkeş heta jê jî bihurtiye. Silêman Demîrel dijminê komunîstan e, demek berê rojnameyekê nivîsîbî, digot Silêman evqasî hatiye guhertin, ku çend salên din sax bimîne wê bibe komunîst. Me Erbakan misilman zanîbû. Qanûna Esasî ya Misilmanan Quran e. Di Quranê de dibêje: "Xwedê hez ji însanên zalim nake." Lê li duduyê nîsanê,

tirtirên me hemû derketibûn televîzyonan, Erbakan di nav înşalah û maşalah re belkî deh carî silav şand ji qumandarên li Kurdistanê re. Erê Erbakan tu profesor î û îsal bîst-sîh sal in jî te maskeya îslamê kiriye rûye xwe. Ma çawa tu nizanî ku ew qumandarên li Kurdistanê zalim in û Xwedê hez ji zaliman nake. Tu zanî, lê tu tirsonek î, însanên tirsonek jî, dîn û îmana wan tine ye. Ka ez ji te re pirsek du mezinên îslamê bibêjim.

1. Hz. Mihemed dibêje: Weleh heta roja qiyametê wek du berên aşan min di nav heyv û rojê de bihêrin, ez ji îmana xwe fedakariyê nakim.

2. Bedîûzeman Seîdê Kurdî Hezretlerî di mahkemeya xwe ya Ispartayê de ji sawcî re dibêje: "Sawcî çavên te lê ye, tu min bi îdamê bitirsînî, binêre weleh ne seriyek min tenê, bi qasî porê serê min seriyên min hebin û hûn her roj yekî jêkin ez ji fikir û îmana xwe fedakariyê nakim."

Li Tirkiyeyê îşê nivîskarên wan jî ecêb e. Hele partî ne îdeolojî ne, wek ayidî ticaret şîrketî ne. Li ser menfaetê çêbûne. De îcar nivîskarên wan jî weke wan. Ez yeqîn nakim li Ewropayê nivîskarekî ku di rojnameyeke çep de dinivîse hema ji bo deh qurûşên zêde here aliyê yeke rast. Lê em li Tirkiyeyê dibînin wek ku mirov pîrekeke baş li maleke randevuyan bibîne, em dinêrin heta doh di rojnameyeke bi kemanî me sosyal demokrat qebûl dikir de bû, îro ketiye rojnameyeke dijberê fikra wî ye.Meseleyek serbestiyê. Ezê mesela nivîskarên xwe bi çîrokek eyb xelas bikim. Li Stenbolê pîrekek dewlemend, bi mêr û zarok, polîs wê di maleke randevuyê de, yanî di cihê civata tolazan de zept kir. Rojnamevanan jê pirsîn, gotin: 'Xanim tu dewlemend î, ne muhtacê pereyan î û mêrê te û zarokên te hene, ev çi derdê te ye." Jinikê got: "Heyra erê weleh wilo ye. Lê ez bawî me, bi vî îşî bawîbûna min rehet dibe."

Ne min got edî bes e, bila her kesekî cihê xwe bibîne.

**27Kanûn - 2 Çile 1992**

## Lolo

Dibêjin zilamek hebû gelekî deyndar bû. Her êvar neh deh zilam diçûn pereyê xwe jê dixwestin. Lê tinebû ku bide wan. Nîvdêhnî bibû. Rojekê derdê xwe ji hevalekî xwe re dibêje. Hevalê wî dibêje: `Lawo xwe li dêhnî deyne. Hema heçê ku hat deynê xwe ji te xwestin zimanê xwe derxe û ji wan re bê lo lo lo lo`. Bêhenek mêrik wiha dike. Xwedî pere ji hev re dibêjin; `lawo, rebeno dêhn bû. De ka em hebekî bêhnê lê fireh bikin`. Kes nema bi ser dikeve. Bêhna wî fireh dibe. De îcar pereyê yê ku şîret lê kiriye jî li cem in. Dibê; birako de ka îcar hema yê min bide min`. Mêrik zimanê xwe derdixe û ji wî re dibê; `lo lo lo lo`. Hevalê wî dibêje; `lawo ji xelkê re lo lo ma ji me re jî lo lo`.

Îcar ez nizanim kê şîret li tirkan kiriye. Ji berê de ku em doza xwe dikin dibêjin; `yabo ma hûn bi tenê li Tirkiyeyê ne? Laz hene, çerkez hene, inguş hene, azerî hene, ahiskali hene, ermenî hene, rûm hene, musevî hene, abhaza hene, gurcî hene, ereb hene, turkmen hene, kirgiz hene, kazak hene, turkistanî hene, çeçen hene, tirk, kurd hene`. De ji xwe tirk jî daxîlê ewên ku digotin hemû qerş û merşên mihacir in. Me digot lawo di hidûdê Tirkiyeya îro de ji kurdan pê ve kesî binecih tine ne. Em tenê di welatê xwe de rûniştine. Meqseda wan ku me jî bikin wek xwe û me jî di nav xwe de winda bikin. Li gundê me Stilîlê meseleyên xweş hene. Dişibin vê gotina tirkan. Mesela di gund de du zilamên kêm di çav xwe re radikin û dibêjin; `yabo dinya ji kesî re namîne. Ma ka pêximberê me, ka Hemê Kesîr, ka Eliyê Şêr, ka Hecî Kuto?` Pîrekan jî dibêjin. Du pîrekên yax digirin û car din dibêjin; `yadê dinya ji kesî re namîne. Ka Fatma Nebîyan ka Mencika Kuto, ka Eyşayê û ka Wetha?`

Îcar ev wekhev in? De îcar Hecî Kuto li ku û Eliyê Şêr li ku? Û yan jî Fatma Nebiyan li ku û Mencika Kuto li ku?

Jite li me jî wiha dikirin. Em 20 milyon kurd dikirin wek 20-30 hezar kesên mihacir ku gelek ji wan nizanin bi zimanê xwe xeber bidin. Heta nizanin ji ku ne. Gelek caran min ji wan pirsiye, ez dibêjim; `hûn ji ku ne? Dibêjin; `em ji Stenbolê ne`. `Erê, hûn ji ku hatine Stenbolê?` Dibêjin; `kalikê me hatiye`. Ez dibêjim; `navê kalikê we çi ye?` Dibêjin; `wih wileh ez nizanim`. De îcar yabo bû çi ku tirk me û van dikin yek. Di kurdan de mal in hene, heta heft bavan tên gotin, Mesela Mihemedê Şerifê Silê Birê Hecî. Ev navê xortekî kurdan e û bi heft bavên xwe te naskirin.

Çîroka me û tirkan ev e, înşeleh wê qenc derkeve. Pirsek almanan Heye, dibêjin, ku taliya tiştekî qenc be hemû qenc e. Ez dinêrim taliya miletê kurd qenc bûye.

**(5.4.1992) * 3-9 Çile 1993**

***Dîroka pêşî a nivîsandiyê ye, ya duduyan a çapkirinê ye.**

## *Ayet ji Silêman Demîrel*

Silêman Demîrel dibêje, "Gerek e em û dewletên dinyayê alîkariya miletên di bin zilmê de ne bikin. Xwesteka me ev e." Le îcar berî niha bi du rojan yanî di 20ê gulana 1992an de Mesut Yilmaz ji Silêman Demîrel re digot: "Silêman Demîrel wekî ordekeke gêj e." Di edebiyata

Tirkiyeyê de, ordeka gêj ew e ku lê teng bibe dixebite ku bi qûnê xwe têxe bin avê. Wê çaxê jî miradê wê nabe. Ordek divê bi serî xwe têxe avê. Silêmanê muhterem tu dibêjî `li Tirkiyeyê miletê kurd heye` û tu dibînî bê hikûmeta te çiqasî zilm û wehşetê li vî miletî dike û em jî zanin û dinya jî zane ku ev wehşet bi emir û devê te ye. Îcar tê bi van pirsên derewîn kê bixapînî? Birako me hevdu nas kiriye, bê çawa di nexweşiyekê de esas ew e ku nexweşî teşhîs bibe yanî bê naskirin, di hereketa miletan de jî ya pêşî ew e ku mirov dost û dijminên xwe ji hev nas bike. Êdî ji nexweşiyê re derman û ji miletan re jî çareya rehet dimîne. Yeqîn bike

Silêman Beg, me kurdan tu qenc fêm kiriye. Ez dibêm qenc, ne ku tu qenc î, ez dibêm em qenc zanin ku serekê dijminên kurdan tu yî. Di temamê kitêbên muqedes de, di Încîl, Tewrat, Zebûr û Quranê de nalet li yecûc û mecûcan dibe. Pêxemberê Çînê Konfîçyûs jî, di vê fikrê de ye. Tu jî û temamê dinyayê jî, zanin ku yecûc û mecûc qewmê Asya Navîn in, yanî moxol in, tatar in, oxuz in, kirxiz in, tacîk in û yên din in. Em dinêrin tu bi wî qafê xwe yê mezin lê dixî diherî ber lingên van yecûc û mecûcan. Û tu bi wan iftîxar dikî. Ev bîst carî te gotiye `ji Behra Adriyatîkê heta Behra Çînê elhemdulîlah bûn dewletên tirk`. Em ji vê re nabên tiştek, em hevalbendên temamê miletên dîl in. Yecûc û mecûc, bila kitêbên muqedes wan wek şeytan jî qebûl bike, lê em kurd dilxweş in ku

ew jî bibin xwediyê ax, welat, namûs û şerefa xwe.

De îcar Silêman bi wî devê xwe yê pehn û bi wan diranên Ispartayî kirizî, tu zanî tu dibêjî çî? Tu zanî, lê de ka ez a te bêjim: "Li Rojhilata Navîn, li temamê dinyayê ez qebûl nakim ku dewleteke kurd çêbibe." Ne te fêm kir bê çima em ji te re dibên dijmin. Ma dikeve serê te amedî, mêrdînî, ruhayî, wanî, bedlîsî û temamê wilayetên Kurdistanê bibin hê- sîrên mihacirên Ispartayê?

Tembîha min li te be, ji qewlê we ve sayin "Baba" weleh ez nizanim tu çi baba yî, ji ber ku tu ocaxkor î, zaroyên te tine ne, ez dibêjim hema miletê te bi heqî jî henekên xwe bi te dikin

Ma ku te zanîba bavitî çi ye kezeba bavitiyê bi te re hebûya tu dibûyî sedemê kuştina ew qas lawên kurd û tirk. Îcar ev cewher bi te re tine ye wek artîsteki sahneyê ku carinan kolên bavitiyê dilîze, tu jî niha li Tirkiyeyê wiha yî. Wek Kelhesen,Komîk Naşît û Îsmaîl Dumbilî.

Ma ku ne wiha bûna ev îş dihatin serê me, lê tu jî ne neheq î. Ma ku em ne pûşt û bêerz bûna me ray dida te û me te ji xwe re dikir serokwezîr? Ez dibêm hema tu çi ji me bikî heqê te ye. Ez ji xapînokên tirkan re tiştekî nabejim, lê ev kurdên ku bi te re fermana Kurdistanê radikin û xwîna xortên kurdan bi te re dialêsin ez li wan dimînim ecêbmayî. Nalet li tevî tebîetê te û mebûsên kurd ên li dora te be.

**(23.5.1992) 10-16 Çile 1993**

## *Yaşar Kemal*

Di sala 1895an de neqeba Osmaniyan û Rûsya bû muharebe. Ehmede Xanî di şiîra xwe de dibêje "Kurd tim li sînoran, armancên tîrên dijminan in." Yanî ereb, ecem, tirk û rûs kengî bi hev re şer bikin tîrên wan li kurdan dikeve. Kurdistan ji van zaliman re bibû rêk û bi navê niha, ji wan re bibû paspasek. Nîvê herba van miletên xerîb li Kurdistanê bû. A talî di 1915an de bû. Osmaniyan, ermenî dikuştin; rûs û ermenî jî, heyfa xwe ji me kurdan hiltanîn. Em kurd ne wek ehlê Trakya û Egeyê bûn. Yewnan û bulxar hatin heta Edîrneyê û yewnan hat heta Bursayê. Yekî tirk ji mala xwe derneket, tewer yewnan û bulxar ezimandin, ev ne heqaretek e, rastiyeke tarîxî ye. Lê ku rûs û ermenî ketin Serheda Kurdistanê kurdan qebûl nekir, mal û milkê xwe hiştin, dev ji xwarina xwe ya ser tifikan berdan, zarokên xwe ber bi xwe kirin û ber bi Kurdistana jêrîn ve reviyan. Mala minê, niha li her gundekî Kurdistana jêrîn mezelekî mihaciran heye. Ên ku ji birçînan û yên ku ji nexweşiyan mirine. Dewleta Osmanî ku wê çaxê hikûmeta wan Îtihat û Terakî bû, ew jî ji ûris û ermeniyan ne hindiktir, dijminê kurdan bû. Jite bavê Yaşar Kemal bi vî awayî hatiye Edeneyê, eslê wî mihacirê Gewaşê ye. Kemal li Qadirliya qeza Edeneyê hatiye dinyayê. Diya wî û bavê wî kurd in. Lê bi mihacirtî, feqîrtî û bi kurdîtî di bin awirê tirkan de mezin bûye. Xatirayên min û Kemal bi hev re gelek hene. Hin ên di dewra wî ya feqîrtiyê de û hinek jî, ji yên dewra wî ya tirtiretiyê de.

Carekê ez di kewna xwe de me, ez û hevalê xwe Nejat Cemîlpaşazade em çûbûn plaja Kuçukyaliyê. Em tekûz in, têr û tije ne, me di behrê de soberî dikir, me dît dengek ji derveyî plajê hat. Bi kurdî bêmal, bi fîkandin digot. Dengê wî evqasî bi me kêr kir, bi

soberî em çûn bi alî ve, me nêrî ku ji derveyî plajê li ser tehtekê lawikekî feqîr, kor û bi derpiyê spî li ser tehtê rûniştiye. Min got,

"Birako tu kî yî?"

Bi xeyd got: "Te çi jê ye?"

- Heval, te bi kurdî difîkand, bi me xweş bû, ji ber vê ez dipirsim.

- Îcar çi ye? Ezê bi kurdî bifîkînim.

- Ma tu kurd î?

- Ez çi bim, ez ew im.

- Me xeyid birako, min gelekî hez ji mêraniya te kir, ku ez edresa xwe bidim te tu dikarî bêyî cem min?

Xwe da vî alî û wî alî talî got: "Erê." Çû ji reşayê ji berîka xwe qelem û kaxez derxist û edresa min nivîsî.

Piştî du sê mehan, tu nabê tê ku min bibîne. Li Firat Yurdê min ji xwe re dergevanekî Pêtirgeyî kurd girtibû, pir zalim bû, ji yesaxê pê ve tiştek nizanîbû. Kemal tê li min dipirse, lê Elî li şexs û qiyafetê wî dinêre, nakeve serê wî û dibê, "Git ûla. Mudur beg senle konuşmaz." Mudur beg jî ez im. Kemal israr dike. Elî hat hundir bi tirkî hezrol sekinî û got: "Mudur beg bir feqir adem gelmiş, senî gormek istiyor." Salên herbê ne û gelek feqîr dihatin cem me alîkariyê. Min got: "Kî ye?" Got, "Navê wî Kemal e û Yaşar e û çavekî wî jî kor e." Hat bîra min, min got: "Lawo ka werîn." Yaşar Kemal hat, ji wê rojê min zanîbû ku cewherekî wî yê mêraniyê heye. Ez rabûm pê ve, min maç kir û rûniştand û ji vir de wir de em şitexilîn. Bû nîvro loqenta min hebû em çûn me nan xwar, paşê em hatin jor, got: "Ezê herim." Min got, bila hema hebekî alîkariya wî be, 10 weraqe min danê. Wê çaxê 10 weraqe gelek pere bû. Min kir nekir qebûl nekir. Got: "Na tu sax bî, ez dişuxilim, pereyên min hene. Ez nehatime cem te pereyan." Min nêrî ku însanekî ne wek gelekan e. Min dev jê berda û çû.

Salan da pey salan Kemal bû Yaşar Kemal. Lê heta îro jî me hevdu bernedaye. Di 69an de Kongreya Partiya Karkeran a Tirkiyeyê li Beyazîde di Seraya Spî de çebû. Ez û Kemal jî em çûn. Faşîstan li me komplo çêkiribûn. Bi daran û bi kêran hicûmî me

kirin. Peşî Azîz Nesîn girtin, bi tif û bi pehînan gêrî erdê kirin, ez û Kemal û Doktor Mustafa Direklîgîl li gel hev bûn. Faşîstan hicûmî ser me kir û digotin: "Komunîstno, benamûsno em hatin we." Hatin nêzî me ku li me bixin, Yaşar Kemal bi wî gewdê xwe yî mezin çû ser wan û got: "Komunîst bikutin diya we de werin" û ji heybeta Kemal hemû reviyan. Car din sal çûn ez hatim girtin. Yaşar Kemal bû Înce Memet, ket devê burjûvaziya li Ewropayê jî, meşhur bû, erê paseport berî niha bi 40 salî nedidan, min jî, wî jî. Lê paşê dan wî, êdî Kemal nema `kurt kokenlî` ye. Bû nivîskarekî rûspiyê Tirkiyeyê. Lê çi fêde, dinyayê bi wî zanîbû ku eslê wî kurd e û bi tirkî dinivîse, ji ber vê yekê, eserên wî pir jî nekirin namzetê Xelata Nobelê. Li gorî qenata heyeta Nobelê însanekî ku nebe xwediyê eslê xwe, ne meqbûl û ne layiqî vê xelatê ye. Kemal niha jî bi vî derdî dişewîte. Lê dibê qesta min tine ye di vî îşî de, min bîra van îşan nedibir. Helbet eslê min kurd e, lê yê bi sûc ne ez im. Osmanî ne, rûs in, ermenî ne, cehalet e û cumhuriyeta Tirkiyeyê ya niha ye.

Heyfa Yasar Kemal, lê yê ku heyfa wan e ne Kemal bi tene ye. Ên wek wî ji berê ve û niha jî pir in. Wek şaîrê Dîwanê Nefî, Nabî, Ziya Gokalp, Silêman Nafiz, Elî Emîrî û hwd. Heta ez karim xwe jî bêjim ma çi îşê min bi tirkan re heye? Lê nivîsên min hemû heta îro bi tirkî ne.

Rica min ew e ku ji îro û pê ve xortên kurdan me paqij bikin. Em ne xayin in, lê em nezan û bê mecal bûn, em mecbûr diman li pîpîka dijminan bixin.

**(12 Sibat 1992) 17-23 Çile 1993**

## *Dewlet û mirov*

Di îlmê însaniyetê de, dewlet û mirov wekhev in. Ma ji xwe dewlet ne hikmê mirovan e. Di hiqûqê de jî dewletê şexsek qebûl dikin lê, dibên hikmê şexsî. Yanî dewlet wek mêrekî tê hesêb. De îcar dewlet hîn bi qerarê dibe wek însanekî. Heyata însên çawa ye, pêşî zarok e dû re dibe xort, dibe zilam, dibe kal û dû re dimire. Dewlet jî wiha ye. Eynî di vê riyê de dere û taliya dewletê jî mirin e. Ku ne wiha be berî niha bi deh hezar salan dewlet çêbûne, lê bi hezaran mirin e. Evên niha ku sax in jî hinek zarok in, hinek xort in, hinek zilam in, hinek kal in û hinek jî li ber mirinê ne.

Di ilmê dewletê de yê ku hikmê qenc dane, ez du aliman nas dikim; yek ji yewnana qedîm Aristo ye û yek jî, alime îslamê yê navdar bi eslê xwe tunusî ye Îbnî Haldun e. Ê ku van meselan meraq bike min divê kitêba Aristo ya Dewletê û Muqedîma Îbnî Haldun bixwîne. Gelekî nezîkî hev in. Ev tiştên ku min gotin bi xêra wan ez dibêjim. Ez ji wan hîn bûme.

De îcar divê mirov jî hebekî bi gavên zaneyî li wan û dewletên dora xwe binêre û qerarekê bide. Vê demê gelek dewletên zarok çêbûn û hinek jî kirî çêbibin. Ê ku kirî çêbibin wek kurdan. Lê yên ku hatine ber mirinê jî hene wek dewleta me ya niha. Gerçî ez nabêm dewleta me bihurî lê ez dinêrim hin bi hin bi alî mirinê ve dere. Serokê xwe dişîne Amerîka rehet dike, lê li rehetî û saxiya dewleta xwe nanêre.

Çima ez wiha dibêjim? De ka ez ji we re bêjim çi? Dewleta ku nû çêdibe bi şûr û zorê çêdibe yanî eskerî ye. Kes bi selewat û tizbiyan nikare dewletekê çêke. Lê dewleta ku bi şûr hat çêkirin nikare pir dom bike. Navê wê lê ye, eskerî ye. Eskerî hunera kuştinî, zor û yesaxê ye. Lê miletek nikare tim di bin vî barî de be. Êdî

miletên bi aqil piştî mideteke, dewleta xwe ji destên esker derdixin dikin sivîl, yanî medenî. Lê ez dinêrim, tirkên me guh nadin ve qaîdeyê. Ew dibê qey heta serî emê bi şûr û kuştin û lêxistinê dewleta xwe pêk bînin. Ji xwe ji ber vê xeletiya wan, îro di beyreqa reîsêcumhûrê me de 16 stêrk hene. Dibên her stêrkek di tarîxê de dewletek tirkan e û hîn jî vê xeletiyê qebûl nakin, miriniyê qebûl dikin. Lê îro ku fransî, îngilîz û alman stêran li beyreqa reîsêcumhûrê xwe bixin stêrkek tenê ye. 16 carî dewleta xwe xera nekirine û ji nû ve wek a berê xelet çênekirine.

Di ilmê dewletan de dibên pêşî dewleta ku nû çêdibe bi qewet e, eskerê wê têra wê heye. Ku gelekî ma, miletê wê li ber radibe, hin bi hin eskeriya wê zeîf dibe êdî ew dewleta eskerî ji dewletên xerîb qewetê dixwazin ku zordestiya xwe hin jî li miletê xwe bikin. Ez çiqasî dinêrim dewleta me ketiye vî halî. Hûn dinêrin çi derdekî me heye em ji dewletên dora xwe wek Amerîka û Ewropiyan hawarê dixwazin. Ordiya me digot: "Em karin dinyayê xera bikin." Başwekîlê me Silêman Demîrel digot ku: "Lazim bibe ezê quba ezmên daxim erdê." Lê îro ez dinêrim di ber bêvila wan de tiştê ku tê serê tirkên Azerbeycanê û Nahçiwanê ne ordî û ne Silêman Demîrel nikarin bên vit. Ez fêm dikim ku ew zirtên wan ji bo Kurdistanê bûn. Silêman bi devê xwe dibêje, `em nikarin bi ermeniyan, dinya li pişta wan e`. Tê xuyakirin ku Silêman li gorî hesabê xwe zane ev dinya ne li pişta kurdan e. Ji vî awayî wek dîkê eloelo xwe li me gij dikir.

Ê hê Silêman tu kirî bimirî û em kirî nû çêbibin. Dinya ne li pişta me jî be ji ber ku em biheq in Xwedê hevalê me ye û em besî xwe ne. Gerek tu vê qenc fêm bikî.

**(23.5.1992) 24-30 Çile 1993**

## *Însanê Tirk*

Berê li Tirkiyeyê digotin `însanên Tirkiyeyê`, nedigotin `ên tirk`. Yanî em kurd, laz, boşnaq û arnawût em hemû însanên Tirkiyeyê bûn. Lê niha ez dinêrim mêrikan dev ji wî awayî berdan e, dibên însanên tirk.

Ji aliyê din ve jî, dibên li Tirkiyeyê 20 milyon kurd hene, 4 mîlyon boşnaq hene û ereb, arnawût û laz jî. Ew vê dibêjin. Erê ma ev ne ji hevveqetandin e, yanî bi tirkî ne "bölücülük" e, ma çi ye? Hikûmet dibêje me gelek tişt birin ji însanên tirk re; me ji însanên tirk re xizmet bir û me xizmet kir. Rast, derew li aliyekî. De ka îcar bê çi birine ji însanên kurd re? Ew dikin lê nabejin. De ka ezê bêjim: Mirin, sirgûn, îşkence, bi hezaran xortên seqet û yên windayî, feqîrtî, beşixultî, di zindanan de hêsîrtî û înkara nasnameya wan. Ku kurd li ber vê radibin navê me dibe eşqiya û terorîst. Ên ku em bi serê çiyan dikevin û yên din jî ji welatê xwe direvin. Jite di vê pirsa zilamên me yê dewletê de, li gorî aqilê xwe ev tiştê ku ji kurdan re dikin di dilê wan de, ku ji însanên tirk re xizmetê dikin. Nizanin ku bi destê xwe mala însanên tirk xera dikin. Ma lawo em di dewra împaratoriya Roman de ne ku însanên tirk hur û efendî û yên ne tirk kole bin. Ma we mesela Spartakus jî nexwendiye? Wextek tê ku koletî hew te tehemulkirin, radibin ser xwe û bavê efendiyan dişewitînin. Di tarîxa koletiya dinyayê de ye ku pêşî serhildan kiriye û miwafaq bûye di bin îdara Kawa de kurd in ku Dehaq û însanên Dehaq di saetekê de perçiqandine.

Em dinêrin zilamên me yên îdarê, nizanin bê dibên çi, ma çi îdare û çi hal. Tu li civîneke wezîrên me binêri mirov dibê qey muxtar li hev bûne kom. Sê behr ji milet em navên wan nas nakin. Ma emê ji ku erzûhalciyên Tirkiyeyê hemûyan nas bikin. Her sal

nifşek ji wan dibe wezîr. Wê rojê yekî, ji min re got wezîrtiya wan ne ji bo ku îşekî bikin, hevdu dikin wezîr, ku sibe meaşê teqawîdiya wezîran bistînin. Ma yan na wezîrtî wilo ye? Gerek wezîr yanî nazir yan jî wezîr bi aqil be, bi edeb be û însan be. De binêr wê rojê wezirê me yê Bursayê, herî nêzîkî Silêman Demîrel, Mustafa Çaglar got çi: “Bila ermenî me neqeherînin, emê di dê û xwihên wan ...in.” Ê ma ev bû? Ji aliyê din de jî 20 mîlyon deynê xwe yê bacê kir ber efûyê. Ma ev feqirên Tirkiyeyê em jî ermenî ne ku tu deynê xwe nadî, tu heqê feqîr û fiqaran didizî.

Patronê te Silêman Demîrel hîn ku devê xwe vedike, dibê: “Tuyu bitmemiş oksuzlerin hakkı.” Ma evê ku tu dixwî ne heqê wan yetîmên nûhatî ne. Ma ez nizanim ezê bêm çi. Hema tu wan tev bidî, bêhn ji wan tê. Edî ez ditirsim, îşnan bînin serê min, bê çima tu min tev didî.

**31 Çile - 6 Sibat 1993**

## *Tirk û Tirkiye*

Berê em Osmanî bûn. Di dewra Osmaniyan de, li ser axa Osmaniyan miletê herî ne meqbûl tirk bûn. Erê ji aliyê bavê ve padişah Oxuz bûn le diyên wan giş filehên ewropî bûn. Mesela diya Fatîh Sultan Mehmet qîza qralê Sirbistanê bû û heta mir jî misilman nebû. Îro jî tirba wê li Yewnanistanê di hewşa dêrekê de ye. Heta dibên wextê ku Fatîh safî kir ew qedir û qîmetê ku dida patrîkê rûman ji bo xatirê diya xwe bû. Van taliyan, ji Fatîh gumanan dikin ku niyeta wî jî li ser filehiyê bû.

Heta îro di kîtêbxaneya Fatîhê de, bi qasî ku kitêbên dînên filehan tefsir û eslê Încîlê hene ewqasî Quran û hedîsên Hz. Muhamed tine ne. Ev li aliyekî, niyeta min ne ku ez tarîxa Osmaniyan binivîsînim.

Di Qanûnnameya Osmaniyan de tirk nedikirin rîcalên dewletê ûpaşa. Heta eskerên Yenîçerî giş zarokên filehan in. Misilman dikirin û di Osmaniyan de, sedrezamê herî meşhûr Sokullu Mehmet Paşa, sirbî bû. Damat îbrahîm Paşa îtalî ye û meşhûr Mîmar Sînan ermenî ye û yên din jî giş wiha ne. Ev li aliyekî.

Îsal 70 sal in nizanim çima bê me digot Tirkiye. Ji me re digotin, heyran Tirkiye jî mîna Osmaniyan umûmî ye. Ev axa ku di destê me de ma,me tirk û kurdan xelas kiriye, navê wê Tirkiye ye. Ev pirseke coxrafîk e, ne milî ye, ne ku Tirkiye ya tirkan e. Heçî ku li ser vê axê bin, dewleta Tirkiyeyê ya giştikan e. Lê ez dinêrim mêrikan em xapandine. Îro Tirkiye çûye maye Tirk. Dibên "Tirkiye ya tirkan e" û "Xwezî bi wî ye ku dibê ez tirk im." Ê me em kurd li dera han mane. Em ne tirk in ku Tirkiye ya me be û em ne tirk in jî ku xweziya me bi me be.

Lê ez yeqîn nakim ev ehmeqtî dom bike. Berê me got, dewletên

ku nû çêdibin tu bikî nekî bi zorê çêdibin û zorbaz jî esker in, lê gerek ew zorbazî pir dewam meke. Ku dewletê cihê xwe girt îcar dewlet bibe medenî yanî sivîl. Di ilmê dewletan de ev heye û ev zemanê eskerî jî neh-deh sal in. Lê ez dinêrim dewleta tirk ne di qaîdeya ilmê dewletan de ye. Îsal 70 sal in eskerî ye û hin bi hin jî xeraptir dibe. Sivîlên ku carinan xuya dikin jî, wek zirtekên pêlewên in. Pêlewan esker e, zirtek jî sivîl in. Kemal Paşa û Îsmet Paşa rabûn me got ê de xem nake, dûre me dît tewlo paşe ketine rêzê, Cemal Paşa, Cevdet Paşa, Fahretîn Paşa û piştî wan jî Kenan Evren Paşa. Li Celal Bayar û Turgut Ozal menêrin. Her du jî zirtekên pêlewan in.

Berê di tarîxa dewletan de, polîs dewletî hebû. Tu bikî nekî polîs car din ji eskeran medenîtir in.

Lê îcar li Tirkiyeyê îsal 70 sal in esker dewletî heye. Esker çi zane û sanetê wî çi ye? Tiştê ku zane yasax e û sanetê wî jî kuştin e. Jite ev herdu jî para me kurdan ketiye.

Ma gelo kesê bibêje ne wilo ye heye? Îcar îro Sileman Demîrel ew qasî lêxistin ji esker xwar lê car din aqilê wî nehatiye serê wî û bûye zirtekê pêlewan. Ez dinêrim Silêman Demîrel wek Qeragoz û Hacîwat di paş perdê de tayê wî di destê yekî din de ye û ew li pêşiya perdê zirçît kan diavêje û dilîze. Lîsk ne ya wî ye. Ya yê ku hefsarê wî di destên wan de ye. Pepûko ew jî şaş bûye. Berê me digot mihendîs e, piçik aqilê wî heye, ez dinêrim ji tirsa eskeran re ew jî nemaye. Binêrin bê dibê çi, dibê: "Ezê bi demokrasiyê, bi hezjêkirinê û qenciyê herim Kurdistanê. Lê ez ê koka terorîstan biqelînim."

Lawo Silo pêşî zarokên me, ne terorîst in ev yek, a duduyan koka wan em in kuro. Ma heta ku tu xelkê kurd neqelînî, tê çawa rehên wan biqelînî. Ma ev zarokên bi namûs ji Ispartayê hatine Cûdî?

Hema ev fikir bes e bê em tirk û kurd bi çi qahfî û bi çi mêjiyê vala û xelet tên îdarekirin. Xwedê tirk û kurdan ji destê van nezanan xelas bike. Ez yeqîn nakim ev hemû xayîn bin. Ma ev qas xayîn çawa di welatekî de hebin? Lê nezan in û tirsonek in.

**(dîroka weşandinê) 7-13 Sibat 1993**

## *Memûr*

Erê li ber çavan memûr ne tiştek in, lê wekîlê dewletê ne. Ma dewlet kî ye? Dewlet komek memûr in. Lê ji berê ve `dewlet demek, memûr demek` e. Ji ber vê xerabiyê gelek alim li ser memûran mijûl bûne û xeber dane. Mesela Şex Seîdê Şîrazî di alema Îslamê de nîv-pêxemberek e, ji bo memûran li Şahê Îranê vê şîretê dike. Dibêje: "Şahê min, Şahê min Tembiya min zilamê ku ne qenc be meke memûr. Lê yê qenc jî nabin memûr." Di vir de ne hewceyê gotinê ye, filozof dibêje, Şah hay ji zilamê xwe hebe, giştik ne qenc in ha! A duduyan Aristo û Îbnî Haldun jî hema nezîkî hev ev mesele gotine, dibêjin: "Ordî, dewletê mûhafeze dike, dewlet ordiyê xwedî dike, xwedîbûn bi mêl e. Mal bi îmara welêt e. Îmara welêt bi exlaqê qenc e. Exlaqê qenc bi waliyan e. Walî bi wezîran e. Wezîr jî bi serokê dewletê, ji memûr û tebaa xwe gişka re semboleke terbiyê, rastî û şerefê be.

De îcar ku em îro li dewleta xwe binêrin. Ne ez dibêjim hema her roj di çapemaniya Tirkiyeyê de, dizî û bêedebiya memûrên mezin tê nivîsandin. Wezîr yanî bakanên me jî gelek caran şirîkên wan in. Waliyê me Kozakçioglu ye û dewlet başkanê me rebeno her roj bi deh cihan, ne diziya wî, ne hewcedariya wî, ne nelayîqiya wî namîne ku nayê gotin.

Par subayekî telgraf dabû Turgut Ozal, gotibû: "Sayin Ozal, ez dikim nakim ez hînî te nabim, yanî ez te bi mezinayî qebûl nakim." Îsal jî xebatkarekî got ku, "Ez bimirim ez çav, dil, gurçik û kezeba xwe dikim weqif lê bi vî şertî ku ev parçeyên min ji Turgut Ozal re lazim bin jî, divê hûn nedin wî." De îcar di Tirkiyeyê de jîna me wilo derbas dibe, ji tirkan re û ji kurdan re çiqas zor e.

Pirsek di devê tirkan de ye dibêjin: "Emê ordiya xwe modernîze bikin", yanî emê wê nû bikin. Nûbûna ku dixwazin çi ye? Yanî sîlah in, lê rebenan nizanin ku pêşî divê serê xwe modernîze bikin, ku serî xerab be wê sîlah çi bike? Hema çiqas sîlaheke nû tu bavê piyê yekî dîn an nizane berde yan jî ku berde wê xwe û mirovên xwe pê bikuje.

Îsal 70 sal in, heta niha vî miletê feqîr nexwar, venexwar li gorî wextê bi sîlehan û bi piyên ordiya xwe vekir. Ji me Xwedê heta niha, vê ordiyê ji me re, yanî ji tirk û kurdan re kîjan miherebe qezenc kiriye? Em li tarîxe dinêrin ku ji xwe bi lihevhatinê me parçeyek ji welatê xwe winda kiriye û kuştina me jî, ji me re tê de maye.

Ordiya me ev e. Memûrên me malûm in. Pirsa van di devê xelkê de ye dibêje, "îro here, sibehê were." Tu herî kîjan daîre, memûrên me bi çavên dijminan li wetendaşan dinêrin. Îmkana îşekî ku bê bertîl tu safî bikî tine ye.

Memûrên dewletê giş wek ebûqatan bi ucret ji xelkê re karan dikin.Ên wezîrên me jî li berçavan e. Tên û derin welatî navê wan jî nas nakin, encax ku bi diziya xwe têkevin çapemeniyê, mirov wan nas dike. Hikûmet, reîsêcumhûr qebûl nake. Reîsêcumhûr hikûmetê qebûl nake. Xelk ji herduyan ne xweş e. Ji ber vê yekê memur jî, ji wan natirsin. Hele esker kengî qîma wan bixwaze li borîyekê dixin, pêlî stûyê hikûmetê jî û dewletê jî dikin. Wele dikin wek qijlakê. Cihê rehet û hezrolê û yesaxan. Di imrê xwe de min car caran ev dîtin. Kemal Paşa pêlî stûye siltan û hikûmeta wan kir, Cemal Paşa pêlî stûye hikûmeta demokrat, Menderes û Celal Bayar kir.

Di 12ê adarê de car din hikûmet û dewlet dan ber lingan, di 1980yî de car din ordiyê bavê sivîlan şewitand û hîn jî ew şewat û dûxan ji me dere. Niha jî em nizanin wê kengî esker li boriyan bixe û me qelepçe bike.

Jite em xelkên Tirkiyeyê bi vî awayî li jiyana xwe dinêrin, ka bê heta em bigihên ku?

**(23.05.1992) 14-20 Sibat 1993**

## *Aqilê Ugur Mumcu*

Kuro bê henek mirov carinan ji hin însanan hêviyeke dike, lê mirov dinêre ku yên xelet ne ew in, mirov neheq e. Ji ber ku mirov nizane ew tiştek in. Mesela îsal çend sal in, me digot, nivîskarê Tirkiyeyê, bi aqil, ciwanmêr, hevalê feqîr û fuqaran çebûye, mala xwede ava. Lê em dinêrin ku em car din hatine xapandin.

Erê, li Tirkiyeyê nivîskarên bi namûs gelek kêm in, lê me digot qey Ugur Mumcu yekî pak e. Gotineke pêşiyên kurdan neye, dibêjin: "Heft lawên pîre hebûn, qencê wan qû...ek bû." Ez dinêrim Mumcu jî destê me wiha dide ber rûye me.

Hûn bi qedrê Xwedê kin, li vî aqilê Ugur Mumcu binêrin. Di 22.05.1992an de, di rojnameya Cumhuriyetê de, binêrin çi dibêje:"Efendim! Çawa îşxala Amerîka li ser îşxala Kuweytê dixeyîde, lê li ser a Qerebax û Nexçîwanê naxeyîde?!" Wax wax Ugur Mumcu. Ma lawo, ku tu hê jî bi vê nizanibî, ma ezê ji te re bibêjim çi? Hema qelema xwe nizanim têxe ku dera xwe. Birako! Me digot qey tu nivîskarekî jîr î, xefiyê polîsan î, guhê te qul e, heya te jî MÎTê û temamê îstîxbarata Tirkiyeyê heye. Ku tu hîn jî nizanibî, îcar bû çi?

Lawo Kuweyt ne dewlet e, benzînxaneya Amerîka û Ewropayê ye.Xeyda wan, ne ji bo çavên ereban ê reş e, ji ber malên xwe qebûl nekirin. Ku ne wiha bûna, tu zanî wê Amerîka bigota çi? Weke gotineke pêşiyên ereban: "Seletalahu kelb ela xenzîr." Yanî, Xwedê teala, kûçik berdaye wehş. Bêhenek Serokê Iraqê Sedam Husên sayekî har e, lê Kuveyt jî, xenzîrekî bi mermûr e.

De îcar ka em bên Qerebax û Nexçîwana te. Kuro, ma Amerîka, Rûsya û Ewropa kerê te ne ku Turkeş bikin başbûxê Qafqasan û Asya Navîn? Lawo, ez nizanim, bê çima Xwedê ji me

stendiye, em bi aqil nabin. Yabo, bila îro ev a ku em jê re dibêjin Tirkiye di destên me de bimîne, em maç bikin û li ser serê xwe deynin.

Zirte zirta hikûmeta me, hûn zanin weke çi ye? Di zimanê me de pirseke pêşiyan heye, dibêjin: "Tirên ber telaqê." Yanî, dema mirovek dikeve ber mirinê, der û dora wî tije bû, lê ba ji ber diçû. Hûn zanin li cêm kurdan tir pir şerm e. Ji ber ku elametê qûnekiyê ye. Lawê wî dibêje: "Hay ji xwe hebe, pir şerm e." Bav dibêje: "Ma min çi kiriye?" Law dibêje:

"Yabo, ba ji ber te diçe, şerm e." Bav dibêje: "Lawo, va ye ez diçim, ma êdî emê kengî li rûye hev binêrin?"

Ez dinêrim, ev tirên hikûmeta me, wê bikin ku em û ew cumhûriyetên ku dibêjin em tirk in, nema karibin li rûye hev binêrin.

**(dîroka weşandinê) 28 Sibat- 6 Adar 1993**

## *Malê xezînê*

Tebîetekî tirkan heye. Bê çiqasî bermeqlûb e. Ji xwe wek tirkan milet tine ye. Xezîna tirkan jî weke ya miletên medenî ne ji tîcareta wan tê dagirtin, tim ji malê feqîr û fiqaran e. Tirk tim miletê dewlemendê nav xwe dikûjin, berdidin wan ji welatê wan û dû re jî, ji mal û milkên wan re dibêjin malê xezînê. Wek ermenî, rûm û kurdan. Di zarokatiya xwe de min mekteba pêşî li Mêrdîne xwend. Mekteba me mala filehê Kendîr bû, temamê wan kuştin û qesra wan ji me re kiribûn mekteb. Mala Kespo jî giş qelandibûn û qesra wan jî kiribûn malê xezînê û memleket xeste- xanesî. Sê mektebên din jî, li Mêrdînê hebûn ew jî giş qesr û qonaxên filehên kuştî bûn. Ev ên Mêrdînê. Îcar li derve îro nîvê Kurdistanê malê xezînê ye, yanî giş kuştiyên suryanî, ermenî û kurdan e. Mesela îro Ceylanpinar Çiftligi yanî Rasileyn bi kurdî Serekaniyê malê Brahîm Paşayê Milî bû. Brahîm Paşa kuştin, zarokên wî reviyan çûn Sûriyeyê û ew jî bû malê xezînê. Îro dibêjin Çiftlika Serekaniyê li dinyayê ya pêncan e. Gotineke Cegerxwîn ya xweş heye, dibêje: "Welatê me tev zîv û zêr e, lê ma em çi bikin maye ji xelkê re." jite malê me jî, bi vî awayî giş bûy malê xezînê.

Bi şerîetê, îbadet û îmamtî bi pereyan guneh e. Îcar tewer dîndarên Tirkiyeyê guneh li ser guneh dikin. Ma ne ev pereyên heram ên xezînê dikevin butçê û reîsê me yên dîn hezretlerî jî, ji wê butçê wekî xwîna xenzîr meaş distînin. Meselek ji wan hat serê min. Di 1954an de ez çûm Qulpê, malek ermenî kuştibûn, du zarokên wan filitîbûn, bibûn misilman lê temamê milkê wan giş kiribûn malê xezînê. Rebenan derdê xwe ji min re got û min jî, ji mebûsê Diyarbekir Mustafa Ekîncî û Azizoglu re got. Sê salan xebitîn heta ku me milkê bav û kalên wan resmen ji xezînê stend. Carekê ce-

wabeke wiha dabûn me, midûre xezînê digot: "Efendim ev malê filehan e, ewên ku niha dawê dikin misliman in. Ma emê çawa malê filehan bidin mislimanan?"

Îro bi milyonan qoçanên tapoyê di destê ermenî û suryaniyên ji derve de ne. Rebena, dawe dikin, em dibêjin: "Na yabo me ti fileh nekujtine." Ew dibêjin "erê heyran wekî we em nekuştine û em ne ji Tirkiyeyê ne, ma ev çi qoçanên me ne?" Ku dinya vê qebûl dike zirzopa hikûmeta me dibêje dinya hemû dijminê me ye.

Ê ma lawo we xelk kuştine mal û milkên wan zept kirine, ma wê kî ji we re bêje rehme li dê û bavê we. Hema îro ka em li Qibrisê binêrin. Berî zeptkirina Qibrisê 40-50 hezar misilmanên feqîr li Qibrisê hebûn, giş jî di şixulê rûman de dişuxilîn. Em çûn me rûm ji ser cihên wan qewitandin û kuştin, me malên wan zept kir. Otelên wan, plajên wan, apartmanên wan û çiftlikên wan. Îcar îro em dibêjin rûm bi me re li hev nayên. Ê ma keko wê çawa li hev bên. Hema Gîrne û Mereş besî nelihevhatina rûman e.

Divê em dev ji vê wehşeta xwe berdin. Yan na wê tim ev gotinên pêşiyên tirkan bên pêşiya me: "Ji tirkan pê ve kes dostê tirkan tine ye."

Ma lawo tirkino, bi vî tebîetê we, wê kî xweliyê li xwe bike bibe dostê we?

**(16.04.1992) 7-13 Adar 1993**

## *Kurd tim sûcdar in*

Binêrin bê berî niha bi 300 salî şaîrê me yê mezin Ehmedê Xanî ji bo me kurdan gotiye çi: "Ez mame di hikmeta Xwedê de, kurmanc di dewleta dinê de. Aya bi çi hawî mane mehrûm, Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm."

Xebera bapîre me ye. Em giş mehrûm û mehkûm in. Îro jî wiha ye, doh ji wiha bû, lê wê sibê ne wiha be.

Di 26ê nîsana 1992an de bultenek adliye bakanê Tirkiyeyê derket. Ecayîp bû. Pirsa Ehmedê Xanî danî cih û tif dikir rûye îdareciyên derewîn. Binêrin bê digot çi: "Bi pirrayî sûc li Tirkiyeyê Ege û Marmara çêdibe. Her ji sed hezar dosye Ege û Marmara 356 in, serê sed hezarî li Kurdistanê 365 dawe dikevin û ev reqem li Ege û Marmara sê qat dibe û digihê 1442 dosye." Ku tê ser ên `sanik` di Kurdistanê de du carî bi qasî Marmara û Ege ne. Yanî li Ege û Marmara xwedîsûc sê caran bi qasî yên Kurdistanê ne. Lê yên ku pêşî tên girtin û dûre tên berdan du carî bi qasî yên Ege û Marmara ne. Li gorî vî hesabî tê xuyakirin ku li Kurdistanê sûc tine ye, lê sûclî pir in. Yanî tirk dibêjin: "Dogu ve Guneydoğu Anadolu'da en çok sanık var; ama en az suçlu var."

Pekî gelo serekê mehkemeya anayasa û yargitayê ji vê tabloya adliye bakanê xwe re dibêjin çi? De ka binêr bê çi gotine, emê binivîsin.

Di 25ê nîsana 1992an de 30 saliya imrê Anayasayê bû. Serokê wê Yekta Gungor di hizûreke mezin de û gelek serekên mehkemê bilind ji derve jî mêvan bûn, rûniştîbûn (qiseta wî kurd bûn): "Kimsenin devleti yıkılmamıştır. Toprağı alınmamıştır. Bayrağı indirilmemiştir. Bu ülkede kimse asimile edilmemiş, horlanmamış, dışlanmamıştır." Yanî behsa kurdan dike dibêje: "Me dewleta kesî

xera nekiriye, me axa wan nestendiye, me ala wan ji dar danexistiye. Di vî welatî de tade li kesî nebûye. Me bi çavên dijminan li kesî nenêriye."

De îcar binêrin başkanê yargitayê tewer ev jî, ji rê derketiye. Pirsa wî di anayasayê de zimanê fermî tirkî ye. Li gorî vê kes nikare di televîzyonan de qala zimanê kurdî bike. Munaqaşeyeke wilo rastûrê parçekirina welat e. Di îcar binêrin devera, reîsên mehkemeyên bilind di ser reîsên dewletê re ne. Lê yê ku nivîsandina yê me bixwîne wê bê qey sawciyê Şirnexê ye.

Me li jor dît li gorî pirsa adlîye bakanî dibêje: "Li Tirkiyeyê li Kurdistanê 'gozaltı' pir in, mehkûm hindik in. Lê li nav tirkan gozaltî hindik in, mehkûm pir in. (Pekî Xwedê meznaya we dom neke hakimên mezin ma hûn ji vê beyana hiqûqî tiştekî fêm nakin? Yan hûn fêm dikin hûn zilmê dikin? Ma ku reîsê mehkema bilind zalim bin ma emê gazindan ji kê bikin? Pirsek almanan heye hukumdar tade li yekî kiriye gotiye, `muhterem tu nikarî vî cezayî bidî min li Berlînê hakim hene`. De îcar em kurd nizanin emê çi xweliyê li xwe bikin, ma ku li Enqereyê hakim tine bin emê li Şamê û Atînayê bigerin?

**(24.05.1992) 14-20 Adar 1993**

## *Ziman xelasî û rêvekirina azadiya miletan e!*

Ferhad Abas welatparezekî Cezayîrî bû. Heta ne welatperwer tenê serokê wan bû ku xwe ji bin zilm û tadeya Fransa derxin. Hikûmeta Fransa di heqê Ferhad Abas de qerera îdamê da, yanî ku wê wî li dar xin. Ferhad Abas reviya çû Sowyetê li Moskowê konferansek 'xudbak' da û ji xelkê ûrîs re got, `ma ezê çawa zilma Fransa ji we re îfade bikim. Mesela herî qenc ev e. Binêrin ez Ferhad Abas im, qehremanê milî yê Cezayîrê me û ereb im. Lê Fransa ewqas zilm li me kiriye ku ez nizanim bi erebî. Niha ezê xeberdana xwe bi Fransî ji we re bikim`.

De ka îcar em vê çîrokê bînin ser kurdiya xwe. Bi sed salan ne Fransa, birayên me yên misilman temamê wan bi paş de hiştine û yesax kirine zimanê me ku em karin bibêjin nan û av jî, hîn jî baş e. Mêrikan digotin zimanê kurdî ji xwe ji binî de tine ye. Lê kirin nekirin, çênebû talî gotina wan wek şeqamê li ser çavên wan ket.

Ji ber vê yekê di rojnameya Welat de peyv derdikevin ku miletê me bi rehetî fêm nake. Ev nefêmkirin jî ne sûcê me ye, sûcê neyarên me ye. Car din jî baş e ku me bi ya wan nekir, me ne got kurdî tine ye, ev tiştê ku heye jî bi erebî, fransî û tirkî ye.

Lê îro elhemdulîlah xortên kurdan şiyar bûne, bi serê malê xwe girtin, dinêrin ku malê wan ji xelkê hemûyan çêtir û meqbûltir e. Ziman û ilmê kurdî entîke ye, yanî gelekî bi qîmet e. Carinan li camiyekê yan li malinan parçeyek xalîça kevin tê dîtin berberî xalîçeke Ispartayî bi qandî Silêman Demîrel mezin e. Ji ber vê yekê xwestek û rica me ew e ku, bedêla xortên me ku ji bo garsoniya li Antalya û li Îzmîrê pirsên bi îngilîzî xwe hîn bikin bila çend pirsên me yên ku nayên zanîn bi kurdî, lê eslê wan kurdî nehatine

jibîrkirin bi çi be jî xwe hînî van pirsan bikin. Ma emê çima bi erebî bibêjin huriyet yan bi zimanê ewropiyan bibejin lîbertî. Ma çima bi zimanê xwe em nabêjin azadî û serbestî. De ka hema em bibêjin di riya Xwedê de azadî xweş e yan huriyet û lîberte? Belkî fransizan lîberte û bi ereban jî huriyet xweş be, lê çima wê bi me kurdan azadî ne xweş be?

Ev nivîskar hûn dizanin min bi çi manê nivisî? Na min divê ku xortên kurdan berî her tiştî hînî zimanê xwe bibin. Hûn zanin ku ziman xelasî û rêvekirina azadiya miletan e.

**(dîroka weşandinê) 21-27 Adar 1993**

## *Masiyên bi dasî**

Ku ez diherim sûka masiyan, tim kurd tên bîra min. Ji masînan re dibêjin pîs e. Ez difikirim pîs û qencî; ya masiyan çi ye? Min nêrî ku, xelk ji masiyên ku goştê wan bê strî ne dibêjin û beranberî yên ku goştê wan bi strî ne. Em kurd jî weke wan masiyan e. Xelk me dixwin, lê ku hebekî em di qirika wan de radibin, dibêjin kurd ne qenc in.

Tewer niha adetek nû derxistine, dibêjin Kurdistan ji Enedolê û rûmeliyê re bûye barek. Nivîskarên Tirkiyeyê yên ehmeq hene hesabê vî îşî jî derxistine. Ka ev baca Kurdistanê, mesrefa wê dernakeve. Ma cahilno erê baca Kurdistanê tine ye, ma emê bacê ji çi bidin? Bac ji qezencê tê dayîn ehmeqino, ma we qezenc bi me ve hiştiye? Ez xort bûm di 32, 33 û 34an de pereyê Kurdistanê yên Osmaniyan bûn, pereyên benqinot li cem me nedibihurtin. Pereyê me giş zîv û qirûşê zîv, du qirûş, çerxî, yanî çaryekik, mecîdî, nîvmecîdî û mecîdî hebûn. Wekî din jî rib, nîv û lîrê zêr hebûn. Hikûmetê qanûn derxist, li Kurdistanê kurd mecbûr bûn baca xwe bi pereyên zêr û zîv bidin. Me carinan pereyê TC yê benqinot peyde dikirin, lê tehsîldaran ji destên me nedigirtin. Di sê-çar salan de temamê pereyên me yên zîv û zêr dan hev anîn Enqereyê. Sala talî jî di nava me de zîv û zêr nemabû lê hingî cendirmeyan bi tehsîldaran re li me dixistin, em mecbur diman, me diçû pereyê zîv û zêr ji Sûriyeyê û Iraqê bi qeçaxî danî dida wan. Wexta em diçûn ji wan re pereyan bînin jî, em li ser xetê dikuştin. Heta ku hîkûmeta Fransa û îngilîz bi vê meselê hisiyan, edî wan jî pereyê Osmaniyan ên zîv û zêr li Iraq û Sûriyeyê dan hev (wan jî wek tirkan kir), îsal 70 sal in, Li Kurdistanê cihê ku karibe bacê bide çênekir. Ji ber

**dasî (hestiyê masiyan)*

zilma hikûmetê, dewlemendê Kurdistanê jî reviyan hatin Rojava. Qezencxane çêkirin û li vir baca xwe didin.Esas ê ku qezencê dike û bacê nade hikûmetê tirk û donme ne. Hema her sal li deftera bacê binêrin ermenî, xwediyê kerxaneyê Manûkyan Xanim ji Vehbî Koç û Sakip Sabanci bêhtir bacê dide. Bacê wiha. Lawo nivîskarên serker hûn dibêjin Kurdistan li me bûye bela. Fêda we tine zerara we heye ku em wan berdin wê ji birçînan bimirin. Lawo di riya Xwedê de, me berdin em ne di bextê we de. Xwedê bike ji birçînan yek ji me nemîne. Ma mirin ji saxiya bindestiyê ne çêtir e. Lê dîsa jî kerno petrola Tirkiyeyê, sifrê Tirkiyeyê, kroma Serêkaniyê, fosfata Tirkiyeyê, elektrîka

Tirkiyeyê û çiftlikên Serêkaniyê ku hûn jehra mirinê bixwin bi genim, penîr, şîr û goşt we xwedî dike ma ne malê me ye? Îcar ê we çi heye? Ji bo ku çend otelên we hene, hûn bi qewadiyê turîstan dihewînin,hûn mineta wan pereyên qewadiyê li me dikin?

Yabo bi xweşkayî em kurd ne wek we nankor in. Heke we navê hûn ji me aciz in, ne min li jorê jî got, di riya Xwedê de, me berdin, me xêr û bereketa ji we tê, me navê. Ma emê çi derewan bikin, bi xwedê em bikin nekin, hûn hez ji me nakin. Di Qanûna Medenî de ji bo berdana jin û mêran se-çar made hene. Yek; bêşerefî, dudo; qesta can, sisê; nexweşiya ku bêşîfa be û çar jî dibêjin halê ku mirov nikaribe bi hev re bijî. Îcar ez dinêrim ne yek ji van tenê, her çar ketine nav me. Û ez dinêrim xêra me ji hev re nemaye. Îcar hûn zanin.

**(05.04.1992) 28 Adar - 3 Nîsan 1993**

## *Xelata Silha Kemal Paşa*

Ev sê çar sal in tirk tiştekî ecêb dikin. Dibêjin her sal însanekî ku ji silha dinyayê re xizmet kiribe emê xelata Kemal Paşa ya Silhê bidin wî. Yanî dikin ku bê xuyakirin Kemal Paşa gelekî silhperwer bû. Ma lawo imrê Kemal di mihareban de çûye. Hûn dibêjin di mihareban de çûye. Hûn dibêjin di mihereba Çanakkaleyê de Kemal Paşa qumandar bû. 250 hezar misilman bi emrê wî hatin kuştin. Îca ji aliyê din jî, ewqas miherebên wî xelas bûn, edî ket welatê xwe kes li ser lingan nehişt. Di roja teng de heçê ku alîkariya wî kiribû ya îdam kir, ya sirgûn kir û yan jî ji Tirkiyeyê berda wan.

Mesela ji aliyê sultanan de qerara îdama wî dan, reviya hat Kurdistanê. Wek artîstan xwe kir misilman û kurd û tirk kirin birayên hev, soza namûsê da ku gawiran ji welatê xwe derxin, emê dewletek kurd û tirkan çêkin. Rebenên kurdan jî bi şêx û beg û axayên xwe ve li dora wî gihan hev. Civata Erziromê çêkirin paşê anîn Sêwasê civata wir jî çekirin ji bo ku tişt pê neyê ji Erziromê heta Sêwasê, bi 500 siwarî Hecî Bedir Axayê Kaxtî mihefeze kir. Paşê birin Enqereyê. Dora wî tev de kurd û çerkez bûn. Mesela li Sêwasê heft paşe hebûn yek jê Kemal Paşa bû, ez nizanim bê cinsê wî çi ye, lê her şeşên din Çerkez û Çeçen bûn. Mêrik hat Enqereyê cihê xwe girt lingê wî gihan erdê, paşê çiqas yekê ku alîkariya wî kiribû giş yan îdam kirin û yan jî sirgûn û mihacir kirin. Lê piştî vî qasî mêrik tiştek got, hûn zanin gotinên wî li cem tirkan bi rastî yên ku dibêjin em tirk in haşa wek hedîsên pêxember tên qebûlkirin. Dibêjin Kemal Paşa gotiye: "Di hundir de silh û li derve silh." Yanî bi Tirkî "Yurtta Sulh Cihanda Sulh." De binêrin bê çi derewên mezin. Ji 1925an û heta 1938an di Tirkiyeyê de ne silh, ne herb hebû. Şex Seîd, Agirî, Zîlan, Dêrsim û ya berê jî Koçgirî

û yên din. Li derve jî halê me tine bû ku em bi kesî re şer bikin, lê me li gorî diranê xwe Sûriye dît, me bi qirika wan girt. Sûriye dibêje Sancan, ew dibêjin em Kemalîst in û serekê wan Ecevît hicûm kir ser Qibrisê û stend. Jite dîtina tirkan a resmî ev e: Temamê wê li ser derewan hatiye çêkirin. Ku xelk bi wan dihisin û dibêjin; ji yên hundir re yanî ji me re dibêjin "bolucu" û ji yên derve jî re dibêjin dijminên tirkan. Ma lawo kesî dîtiye ku ji dilê safî kes bûye hevalê neheqan. Hûn neheq in kuro, tirkino!

Niha dibêjin emê Xelata Silhê ya Kemal Paşa salê bidin yekî. Erê. Adetek wiha heye. Her sal xelata artistan didin yekî, artîstekî hêja. Yan nivîskarekî, dengbêjekî û resamekî jî, didin senetkarekî van îşan. De îcar tê ya Sulha Kemal Paşa bidî kê? Par bi rastî û layîq dan Kenan Evren. Xem nake, ew wekhev in. Le îsal dibêjin emê bidin Mandela, yanî bi rastî melekekî silhê yê qible yê Afrîkayê ye. Ez ditirsim ku ev feqîr ji nezanî vê xelata ne di cih de qebûl bike. Xwezî berî ku bihata Tirkiyeyê ev nivîsa min bixwenda. Ez yeqîn dikim nedihat Tirkiyeyê û ev xelata ne xelat qebûl nedikir. Par çil milyon pereyê tirkî ji bo vê xelatê dan Kenan Evren. Yanî Kenan Evren gelek xizmeta silhê kiriye. Xwedê qebûl neke.

Elhamdulilah her sal pereyê me nêvî behtîr erzan dibin. Belkî îsal şêst milyon be. Lê ku ezîz Mandela ji nezanî van pereyên me yên bê qîmet qebûl bike, ez yeqîn dikim ji wê şerefa xwe ya giranbiha wê gelekî winda bike.

**(dîroka weşandinê) 11-17 Nîsan 1993**

## *TC dewletî û dewletên tirkan ên nû*

Li gundê me di wextekê de maqûlekî çeleng hebû. Navê wî Biroka bû. Ez ne gihamê lê min gelek pesnên wî bihîstin. Hema diecibandin. Mêr bû, egîd bû. Paşê hat kuştin. Lawekî wî hebû. Navê wî Berekatê Biroka bû. Yanî Berekatê lawê Biroka. Ew lawik qumarbaz, bêkêr û serserî bû. Temamê pêşveçûna wî digot, "Ez layê Biroka me." Lê kesî guh nedidayê, di gunehiyê de kesî bi tiştekî nedihesiband.

Li gundê Qûzê xwarzîkî wî hebû. Ew jî wek tirk dibêjin gerîzekalî yanî ew jî xerabe bû. Li gund xwe bê cir dikir digot: "Ez xwarziyê Biroka me." Lê gundiyan zanîbû ku tu Birokatiya wî nemaye, ser û guh lê hûr dikirin. Dihat nehiyê cem xalê xwe Berekat digot, "Xalo filankes li min xist û tadê li min dikin." Berekat digot: "Ma ez qebûl dikim, ezê bavê wan bişewitînim. Metirse ez xalê te me, felan filan." Nermo diçû gund, car din xwe neheq û mekroh dikir, gundiyan car din ew têr dar dikir. Nermo car din dihat cem xalê xwe. Xalê wî ji zirtan pê ve nikarîbû tiştek bikira. Dikir zirt zirt û Nermo jî lêxistina xwe dixwar. Rojekê car din wiha bibû, layê Berekat Idrîs got: "Yabo te ev reben kuşt ku nikarî tiştekî bikî, tu zirtan jê re dikî û ew jî dihere xwe li xelkê mekroh dike, ev tên serê wî, dev ji rebeno berde."

Ez dinêrim hikûmeta me û ev dewletên ku kirî çêbibin, aynen wek Berekat û Nermo ne. Serekê hikûmeta me di cih de dibêje, "Weh ma em qebûl dikin, weleh emê îşekî bînin serê ermeniyan, ji fermana wan a berê xerabtir." Lê ermenî zanin ku ên me wek Berekat in û rebênen Azerî û Nexçîwan nizanin bê em çi ne. Xwe mekroh dikin. Ermenî li devê wan dixin, paşê Silêmanê me dibêje. "Ma yabo em nikarin bi ermeniyan, temamê dinyayê li pişta ermeniyan e." Eh Silêman ma ew serê te yê mezin û ew şewqeya te

ya ku başçawîşan gelek caran li nav çavên te xist, çima te berê nizanibû ku tu kî yî, ermenî kî ne. Belê eyb e zilamên me yên dewletê ewê ku zeman û mekan tev li hev dikin. Tarîxçîkî îngilîz navê wî Arnold Toynbee ye, dibêje: "Tirk bi tarîxê nizanin, ku li wan teng bibe karin Hezretê Nebî Silêman û Qanûnî Siltan Silêman bikin yek, tenê ji navê wan." Êdî ez dinêrim îro tirk karin Silêman Demîrel jî têxin nav wan.

De îcar wê çawa kêroşk, rovî û şêr bi hev re biçêrin? Vêca li cem tirkan fikra tarîxî ev. Ma Silêman ez feqîrekî li dera hanê me, ez zanim ku hikûmeta Tirkiyeyê nikare eleqê xwe ji

Nexçîwan û Azerbeyacanê bîne. Tê çima nizanibî û tê zirtan ji van feqîran re bikî, serê wan têxî belayê. Ê min niha ez guneh û xwîna ev qas kuştiyên Azerbeycan û Nexçîwanê dikim stûyê Silêman Demîrel. Hanî carinan dikeve mehkeman zilamekî dewlemendî mezin, keçikek feqîrî bi namûs dilewîtîne, di zimanê hiqûqa Tirkiyeyê de dibêjin îxfalkirin. Li gorî wijdan, qenaeta min ewê ku hikûmeta Tirkiyeyê, ji xwe pêşî gerek serekê hiqûmetê Silêman Demîrel îxfalcî ye, feqîr û fiqarên Qafqasya îxfal e yanî xapandina mezin e. Mesela ger îmkanên min hebe, ji bo vî sûcê ku bi hezaran însan ji mala xwe derketin, hatin kuştin û bi çolê ketin; sedema wê Silêman Demîrel e, minê berî Leyla Zana, Silêman Demîrel îdam bikira.

**(23.5.1992) 25 Nîsan -1 Gulan**

## *Rojhilatê Firatê*

Nayê veşartin ji 1920an bûyera Koçgirî û heta ya Dêrsimê hikûmeta Tirkiyeyê wek gurekî ku di nav keriyek pezê bêşivan keve, heta ku wî bigota bes kurd dikuştin. Ma hinek karin bibêjin "na"? Di 1925an de Şêx Seîd, di 1929an, 30î û 33yan de Agirî, Zîlan û Sason. Û di 38an de jî Fermana Dêrsimê.

Ev acizbûna hikûmeta Tirkiyeyê niha dinêre ku wek berê nema ji wan re diselihe, her ku yekî ji me dikujin wê rojê temamê dinyayê pê dihese, bi saya rojnamevanên Ewropa. Îcar berê çi kiribûn? Ji bo ku xwînrijiya wan dinya nebine qanûnek derxistibûn, navê wê bi tirkî "Fıratın Ötesi Kanunu" bû. Li gorî ve qanûnê mêrikê ewropî û amerîkî nikaribû derbasî Rojhilate Firatê bibin. Ev qanûn heta 1950î ku, Xwedê qebûl neke Tirkiyeyê bû Demokrat hilanîn. Wekî din jî mecbûr bûn hilînin, çima temaman xwe firotibûn Amerîka û Ewropiyan. Nikaribûn ji wan re bigotina merin wî aliyê Firatê.

Ne hûn dinêrin bê çend awayî xefk li ber me kurdan vedane. De îcar em bûne wek roviyê ku lingê xwe di xefkê de bixwe, me jî lingê xwe di xefkê de xwariye, hingî îş û bêbextî hatine serê me. Êdî em nema ji kesî yeqîn dikin. De werin yeqîn bikin!.

Bi top û tanqan hîn doh Şirnex û Cizîr li erdê sekinandine û fedî nakin derdikevin ber televîzyonan dibêjin em li kurdan bi şefqet û bi merhemet dinêrin. Ma lawo ku merhameta we ev be îcar şerê we çawa ye? Gerçî me şerê we dîtiye, hema xwesteka me ji Xwedê ye ku ev merhameta hûn bi me dikin, bê serê we jî. Ê me ji aliyê me ve mala we ne ava û me ti şefqata we navê. Niha hûn me dikujin, em jî nifiran li we dikin. Ma bi Xwedê stranek bi kurmancî heye. Piçik jê wiha ye: "Lo lawo xurfanî, mala me li

tara banî, heger Xwedê li hev anî, ezê te bikim kebanî." De îcar ma Xwedê heke li hev anî, wilo wê çaxê emê du kaban bavêjin hev, binêr bê Xwedê dide diya kê?

**(5.4.1992) 2-8 Gulan 1993**

## *Zikat*

Rojnameyen tirkan bi qerf dinivîsin. PKK zikatê dide hev. Erê lawo, wê PKK zikatê bi hev de û kurdên bi namûs jî wê bidin. Ma hûn dibên zikat çi ye kerno? Bi tirkî zikat vergî* ye. Dibêjin rojekê eşîrek ereban hatine cem Hz. Muhemed, gotine:

- Ya Muhamed me divê em bibin misilman. Muhamed gotiye,
- "Hay hay." Ereban jî gotine:
- "De ne şertên me jî hene."
- Şertên we çi ne?

Heyran em yextiyar bûne, heta vî emrî me ne nimêj kiriye û me ne rojî girtiye; me divê tu me ji van efû bikî.

- Hay hay, kengî we xwest, wê çaxê bikin. Ereban :
- Dora Mekê dijminên me ne, em nikarin herin hecê jî. Hz. Muhamed:
- Ew jî xatirê we, tiştê heye eşheda xwe werînin, yanî Xwedê bi rebîtî û min jî bi pêxembertî qebûl bikin û zikata xwe bidin û hew."

Yanî ji pênc şertên Îslamê sisê derxsitiye, hiştiye dudu. Wilo xuya dike ku, Apo jî ev hadîs di kitêba îmamê Qestelanî de dîtiye. Lewma ji kurdan re dibêje: "Min û Kurdistanê nas bikin û zikata xwe bidin me û bes." Yanî rojnameyên tirkan vê ji PKKê re dikin qisûrek. Ka ev PKK feqîr e, muhtacê zikatê ye. Ne wilo ye lawo. Ma îsal heftê sal in, hûn eydan derî bi derî digerin, eyar û roviyên qurbanê didin hev û li mekteban ji bo fitran hûn zerfan didin zarokan, a we mêranî ye, lê ya PKKê eyb e. Yanî bila kurd zikata xwe bidin Weqfa Mehmetçîkan û ew jî pê bomban bikirin û bavêjin wan, bavê mino.

Lawo, hey hûn bê edeb in, lê hema hebekî bi aqil bin kuro. Ma

**vergî: bac*

hûn nizanin ji îro pê ve, ku hûn bixwin, emê di rûye we jî bidin. Ew tirtira we ya berê çû ku hûn ji dê û bavên me re xeberan bidin û em serê xwe di ber xwe xin. Na birako ew nema ji we re diserife. Gotinek bi erebî heye, dibêjin: "Emsalî kesîre" yanî pirayî vegerandin. Hûn yeqîn bikin ji îro û pê ve çi heqareta ku hûn li me bikin, bi emsalê kesîre emê li we vegerînin.

**(5.4.1992) 9-15 Gulan 1993**

### *Lé dinyaye lé dinyayé...*

Di 1943yan de ez midûre "Dîcle Talebe Yurdî" bûm. Rojekê du polîs hatin Yurdê û ez girtim birim "Birinci Şube"ye. Çawa ez ketim hundir, sê-çar polîs li min civiyan, bi pehînan, bi şeqeman û bi daran bi min ketin.

Ez şaş mam. "Lawo ma min çi kiriye? "

Mezinê wan got: "Hi kurê kerê tu nizanî te çi kiriye?"

Min got: "Na!"

"Ma kero radyoya we tine?"

Min got: "Heye."

Got: "Xayin lawê xayinan ev qas plakên xweş ên bi tirkî hene, çima hûn di Yurdê de bi kurdî difikînin?"

Sûcê min û sedema lêxistina min, bi kurmancî fikandina me bû.

Paşê di 1959an de li Diyarbekrê, di rojnameya "îlerî Yurdê" de bi kurmancî min şiîrek nivîsî. Navê şiîrê "Qimil hat lo Apo" bû.

Hoy babo tu yî û te bi kurdî nivîsiye...

Celal Bayar û temamê sernivîskarên rojnameyên tirkan rabûn ser lingan.

Hinekan digotin, "Serê wî biperçiqînin."

Hinekan jî digotin, "Zimanê wî jêkin."

Ez girtim û min kirin hepsê. Heta ku min xwe ji nav lepên wan xelas kir, nîvê ruhê min çû.

Lê di vî nîvruhê minê mayî de, elhemdûlilah îro di paytexta Osmaniyan de, Stenbolê, em rojnameya xwe ya bi zimanê xwe dertînin.

Ez gelekî bextiyar im ku min ev roj dît, lê heyfa min jî ew e ku gelek hevalên min ên hêja bi vê hesretê çûn rehmetê. Hêvî û baw-

eriya min ew e ku wê xortên me yên heja roj bi roj bi vî karê xwe yê spehî dilê min xweş bikin û ruhê hevalên min ên çûyî jî şad bikin.

Berê kurd bavik bûn. Paşê bûn eşîr. Lê îro ez dinêrim kurd êdî bûne milet. Xuya ye ku bavik û eşîr dîtina wan teng e, tim neyarê hev in. Her bavikek dijî bavikê din e. Her eşîr jî dijminê eşîreke din e.

Di tarîxa kurdan de bi sed salan ji vî awayî kurd perîşan û bindest man.

Lê ez dinêrim îro kurd êdî ji van dubendiyan xelas dibin. Dibin milet.

Yanî yekpare kurd û Kurdistan.

**Rojname 29.12.1991**

## Mele û Keşe

Gundên li dora Mîdyadê bi piranî fileh (nêvî fileh û nêvî jî misilman) in. Mele û keşe ji ber ku xwenda ne birakê hev in.

Rojekê ji gundê Selhê meleyek diçe mêvaniya keşeyê Batê û kûçikê mele jî pê re ye. Mele û keşe li ber siya dîwarê dêrê ji xwe re dipeyivin. Di vê navê de sê kûçikên filehan ji nav gund tên û bi qirika kûçikê melê digirin. Kûçikê melê li vî alî, li wî alî li erdê dixin. Dev û lêvên wî, ser û guhên wî di xwînê de dihêlin. Keşe, bi kêf li kûçik dinêre û dibêje:

- Mele binêr şaşka melê kirin stûye wî haa!

Mele:

- Ma keşe, ku sê keşe herin meleyekî helbet wê şaşka wî bixin stûyê wî.

Ji ber ku keşe, kûçikê melê şibandibû melê, mele jî ew kûçik şibandibûn keşê. Ji xwe ku sê keşe li meleyekî bixin wê şaşka wî têkeve stûye wî. Lewma mele jî her sê kûçik şibandibûn keşeyê filehan.

Ez li dîrokê dinêrim ewên ku xurtiyê li kurdan dikin, tim weke kûçikên filehan bi piranî tên ser yekî.

Mesela di lihevhatinên Qesra Şêrîn, Sadabad û Bexdayê de, tirk, ereb û ecem li ser kurdan li hev hatibûn ku kurd li kîjan welatî rabin û serî hildin, wê bi hev re li kurdan bixistana. Û wisa kirin jî.

Îcar niha roj guheriye. Ev qije qaja tirk, ereb û eceman ji ber ku tifaqa wan li ser kurdan nabe yek tê. Eh yeko yeko jî bi kurdan nikarin.

Gotinek ereban heye: "Salat alahû kelp ala xenzîr." Yanî Xwedê kûçik berdaye beraz. Eynî weke Iraq û Îranê.

Tewlo! Ez yeqîn dikim ku Xwedê wiha alî me bike, emê ji bin bar derkevin. Di dîlokeke me ya xurfanî de gotinên wilo hene.

Lo lawiko xurfanî<br>
Mala me li tara banî<br>
Heger xwedê li hev anî<br>
Ezê te bikim kebanî

Ku Xwedê li hev bîne emê wan bikin kebanî. Em kurd misilman in, sê kebanî, yanî sê jinên me jî karin hebin.

**(11.4.1992) 16-22 Gulan 1993**

## *Mîterand*

Pirseke me kurmanca heye dibêjin ku Xwedê ji yekî bistîne pêşî aqilê wî distîne. Ez dinêrim hikûmeta me jî wek vê yekê ye, Xwedê aqilê wê jê stendiye. Binêrin bê hikûmet û qeşmerên wan ên rojnamevan dibêjin çi?

1. Mîterand gotiye: "Ez neyarê terorîzmê me." Lê wiha xuya ye ku di gotina Mîterand de PKK terorîst nayê dîtin.

2. Dibêjin jina Mîterand li Japonyayê ji kurdan re pereyan û alîkariyê dide hev. De îcar li vî îşî binêrin, hîn jî tirkên me fêm nakin ku Mîterand jî hatiye Tirkiyeyê û tîcareta tirkan zeft kiriye. Lê di vê navê re mêrik gotiye, `ez li hemberî terorîzmê me`. Yanî ketiye serê hikûmeta me ku li Çankaya û Dolmabahçe Sarayî du şîvan bidin Mîterand û Mîterand jî wê zilma wan qebûl bike. Ma ev ne ehmeqî ye? Kanî we digot; " Bila kes ji îşê me neştexile, bêvila xwe nexin nav îşê me." Lê ez dinêrim ku, hûn li devê xelkê digerin, hema rast derew pif bikin we.

Mîterand hat û çû tim got: "Erê ev dewra pêşiya me, em li hidûdê dewletan digerin ku neyên guhertin. Lê me divê di hundirê van hidûdan de her miletek rehet be, kes li kesî zilmê neke. Xwesteka me ji hikûmeta Tirkiyeyê ew e ku heqê kurdan en demokratîk û kulturî bi her awayî bide wan." Çapemeniya tirkan û hikûmeta tirkan wek hev şeqşeqçî ne, vê nabêjin wek mizgînekê. Dibêjin Mîterand gotiye, `ez li miqabilî terorîzme me`. De îcar li dinyayê teşkîlateke polîsan heye, jê re dibêjin înterpol. Dema mezinê wan hat Tirkiyeyê rojnamevanan jê re got: "PKK ne terorîst e, mucadeleya xwe ya milî didin." Ê herhalde Mîterand jî vê zane. Ji ber vê yekê dibêje ez neyarê terorîstan im. Di binê vê şitexaliya wî de ev heye: PKK ne terorîst e. Ma ku Mîterand PKK terorîst qebûl

bikira wê jina wî çawa ji wan re pere û alîkarî bida hev. Gerek jina xwe berdaya.

Ne li jorê me got ku Xwedê ji însanekî bistîne pêşî aqilê wî distîne. Ez yeqîn dikim hikûmeta me jî wiha ye.

**(16.4.1992) 23-29 Gulan 1993**

## *Û NIVÎSÊN DIN*

## *Tewlo lo...*

Xuya dike ku, êdî em encax dikarin bi henekî derdê xwe bibêjin. Stranek ereban heye dibêje, “Li min nenêrin ku ez bi kêf dileyizim. Lê ku tu serê kevokekê jê bikî, ewê jî xwe li ser erdê li hev bixe û bireqise.”

Em kurd jî wek wê kevokê ne. Pirseke tirkan heye, dibêjin; “Güleriz ağlanacak halimize.” Yanî “Em bi halê xwe yê girî dikenin.”

Ev nivîsa min gerek bi kêf baya, lê ez nizanim ezê çawa bi kêf û eşq binivîsim.

Em kurd ji diya xwe bi kul û derd çêdibin; bi pehîn û lêxistinê em tên dinyayê û heta ku em ji dinyê jî diherin navê me “öldürüldü” an jî “gebertildi” ye. Lê li Tirkiyeyê navê bênamûsên qoriciyan “şehîd”in.

De ka binêrin şehîdî çiqasî erzan û pîs bû. Di temamê dîn û qanûnên dinyayê de yeqîniyek heye, ku însanên xayinê miletê xwe bin, bi nalet in. Lê dîtina dewletê ya bi fermî li temamê xelkê heqaret dike û ji qoriciyan re dibêje: “şehîd “. Qaîdeyek umîmî heye li dinyayê. Ev qaîde di kitêben dînî, felsefî û milî de yek e. Dibêje; “însanekî ku xayinê miletê xwe be, kuştina wî helal e.” Pirseke zemanê berê heye, dibêje, “Pere ji bo hemû tiştî, le hemû tişt ne ji bo pere.”

Ez hevîdar im ku ev kovara me ya “Tew lo” wê vî eyb û arê miletê kurd bide ber rûye wan ku zarokên kurd xwe ji karên pîs derxin.

**Tew lo, hejmar: 1 /9 Nîsan 1992**

## *Ma ker dikare hêdîka bizire?*

Midûrê me yê nehiyê hebû, navê wî Xalit Ecemîş bû. Ecemîş, bi eslê xwe ji kurdên Şamê bû û bavê wî di wexta Osmaniyan de qazî bû, yanî "hakim" bû. Ew tayînî Nîgdeyê kiribûn, li wir ma, bû "Nîgdelî". Xalid Beg, zilamekî alim bû. Ew hem dîrokzan bû û hem jî muzîkzan bû. Bi nota li ûdê dixist.

Xalit Beg ji min re digot, "Rojekê, yekî mitirb anîn odeya min û temamê nehiyê ji min re gotin, `Bila ji te re li zirnê xe!` 'Ya rebî, di vê odeya min a biçûk de ev xortê bi qewet bi tepilik û xelîle li zirnê xe wê çawa bibe?' Çiqas min got, 'Heyran di vê germa han de ev lawik wê çawa li zirnê xe?' Gundiyan hemûyan gotin, "Çawa midûr beg, ji bo xatirê te bila lê xe." Û çima yê mitrib dest bi lêxistina zirnê nekir. Mêjiyê min belav bû. Wextek hat ku min hew tehemul kir, min ji yekî re got, 'Birako, ji yê mitirb re bêje, bila hebekî bi hedîka li zirne xe.'

"Û hema min dît, ê mitrib zirne ji devê xwe derxist û got, 'ma midûr beg, ker dikare hêdîka bizire? Ev zirne ye. Ezê lêxim, dengê wê çawa be ew e."

Ez vê tînim ser mezinên dewleta îro. Hûn guh bidin wan eynî wek wî mitribî li zirnê dixin. Ozal bi awayekî, Silêman Demîrel bi awayekî û Înonu bi awayekî... Ê ma wê ev zilamên dewletê çawa li zirnê xin? Helbet ker çawa dizire, ewê jî wisa bipeyivin.

**Tewlo, hejmar:\ 9Nîsan1992**

## *Weqfa dêrê*

Li Kurdistanê gelek gund hene, nîvê wan misilman in û nîvê wan jî fileh in. Rojekê, melayek hat, bû mevanê keşeyekî. Li ber siya dêrê mela û keşe rûniştine. Kûçikê mele jî pê re ye. Çima ji nav daran sê kûçik nayên bi qirika kûçikê melê nagirin. Kûçikê melê li erdê didin, lev û devê wî bi xwîn dikin.

Keşe dibêje, "Bînêre mele, bê çawa şaşka wî kirin stûyê wî?" Yanî kûçiken filehan şaşka melê kirine stûye wî.

Mela jî dibêje: "Ê ma keşe, sê keşe herin meleyekî helbet wê zora mele bibin û şaşka wî têxin stûyê wî"

Dibêjin rojeke xortekî fileh ê spehî hebû. Mêrik bi roj rih bi xwe ve dikir, diçû dêrê dibû keşe. Û bi şev jî derdiket ser rê, diçû bajêr tolazî dikir.

Rojekê, pîrekek xweşik li gorî xwe peyda kir û heta sibehê pê re kêfa eşqê kir. Sibehê jî, keşe hat dêrê riha xwe bi xwe ve kir, bû keşe.

Li gorî yeqîniya filehan jî, piştî gunehan mirov here dêrê û rastiyê ji keşe re bêje, gunehê mirov efû dibe. Jinik dibêje, "Ma yabo, ez bibêjim çi? Tu zanî ku em bi şev bi hev re bûn."

Keşe dibêje: Erê, ez xem nakim, lê kesên din?"

Jinik dibêje, "Weleh peder, ji Xwedê re malûm e, ji te pê ve şeş keşeyên din hene."

Keşe çep û rast dike, Histawrozê derdixe û dibêje, "Qîza min metirse. Wekî ku tu bi min û şeş keşeyên din re razayî, te xwe kiriye weqfa dêrê. Miheqeq wê Xwedê te efû bike."

**Tewlo, hejmar:2 /9 Nîsan 1992**

## *Îcar karê Xwedê ma çi?*

Ez li gundê xwe bûm. Hevalekî min e zarokatiyê hebû, navê wî Şêxê Kûtê bû.

Radyoyê got, "Sibê na du sibê wê baran bê." Şêxo ji min pirsî got, Ev dibêje çi? `Wekî ku dibêje, sibehê na du sibê wê baran bê."

Şêxo keniya û got: "Tu bi qedrê Xwedê bikî îcar karê Xwede ma çi? Wekî ku dibêje, sibehê na du sibê wê baran bê."

Şêxê Kûtê ji min re got, "tu bi qedrê Xwede bikî, niha bi rastî însan diçin heyvê?"

Min got, "Erê Şêxo, rûs ji amerîkiyan re dibêjin em diçin heyvê."

Şêxo got, "Bi navê Xwedê, ev sebavên han diçin heyvê, wê şewqa me jî xera bikin. Ê wan elektrîkên wan hene, wê xwe bi wê ronî bikin. Emê careke din bimînin di reşahiyê de."

**Tewlo, hejmar:1 /9 Nîsan 1992**

## *Enstîtuya Kurdî*

Bi sedsalan e miletê misilman ê dora me ku dibêjin em birayê hev in, lê Xwedê qebûl neke, yanî em giş misilman in û li gorî îslamiyetê jî misilman hemû birayê hev in. De îcar em dinêrin çi bira çi jehr? Xwedê zane em birayê hev î jinbavê ne. Pirseke pêşiyê me kurdan heye, dibêjin; ku dê bibe jinbavî, bav dike filehê Raîtî." Yanî ku dê bibe jinbav bav dibe fileheki xayîn.

Ez dinêrim bi sedsalan e ku birayê me yê misilman tiştê ku ji wan hatiye bi me kirine. Ma gelo çi bi me nekirine? Em kuştine, em talan kirine,ji ser cihê bav û kalê me em mihacir kirine. Lê li gorî wan em bi kêrî tiştekî nayên. Peyva me ya kurdî jî "yasaq" qedexe kirine. Şal û şapê me yî ciwanmêrî bi zorê ji me kirine, pantor li me kirine, kum û kolozê me qedexe kirine, şewqa telîs dane serê me. Lo ma çi di me de nekirine?

Îcar îro ez dinêrim Tew lo lo di çavê Stenbolê de me Enstîtuya Kurdî vekiriye. Tê xuyakirin ku çiyayên Kurdistanê sê tiştê naqelin digihijînin. Yek miletê kurd, dido deviyên çiyayê Kurdistanê, yanî darên meyî berû, sisê kew û ribatên me.

Bi sedsalan xelk xebitîn ku van her sê cewherên Kurdistanê biqelînin, lê Xwedê bi ya wan nekir.

De ka em pir dirêj nekin. Devî, kew û miletê kurd ji çiyayên Kurdistanê re pîroz bin. Û ez dinêrim pîroz in jî.

Erê zahrê kew û deviyan tine ye, lê em bedêla wan tif dikin rûwê dijminên kurdan û li ser çiyayên Kurdistanê, em dibên Tew lo looooo...

**Tewlo, hejmar: 3 /23 Nisan 1992**

## *Pirsên mezinan*

Guh bidin serê reşbeleka min. Min negotiye "pirsên pêşiyan," min gotiye "yên mezinan." Ji ber ku mezin tim ne baş in. Carinan tiştekî biçûk ji tiştekî mezin çêtir e de ka Xwedê qebûl neke, em bên ser mezinên xwe.

Mesela Silêman Demîrel: Hezret dibêje di televîzyonê de bi kurdî neşriyat çênabe. Ji ber ku Tirkiye hîn nehatiye wê sewiyê. Ê ma Silêman, tirkî mecbûr e bilind nebe û tim di sewiya te de bimîne? Belkî tu bilind nabî. Carinan tu bilind xuya dikî, lê ez yeqîn dikim, ku ne tu bilind bûyî, bilindayî nizm bûye, daketiye qama te.

Kenan Evren: De ka îcar em li vî tirtirê xwe bihisînin, bê dibêje çi: "Ku li Tirkiyeyê di televîzyonê de neşriyata kurdî çêbibe, wê Tirkiye ji hev belav bibe." Ê ma Kenan Efendî paşa, te kurdîtiya me di malên me de kir yasaq, te çi jê fêm kir? Te çi bi ser xist? Te em anîn îro. Yanî îro li gorî wî aqilê te yê zingargirtî em gelekî bi hev re ne? Kuro ma tu nizanî bipeyivî, ma tu nizanî deng jî nekî?

Turkeş. De ka îcar bê ev dahbe dibêje çi: "Di televîzyonê de neşriyata kurdî çêbibe 'boluculuk'tir, qomonîstlîk'tir." Ya, de binêrîn ev jî aqilekî din ê xebîs e. Mêrik li Qibrisê ji bo 40-50 hezar soydaşên xwe yên tevlihev re dewletê dixwaze û li Tirkiyeyê xeberdana 20 milyon kurd fe- laket dibîne.

De binêrin tirk û kurd, bê çi cins in şivan me diçerînin. Xwedê me bistirîne û "Tanrı Türkeş'i korusun!"

**Tewlo, hejmar:4 /30 Nîsan 1992**

## *Bêyî xwediyan, seriyan kur dikin*

Serê nivîsa me pirseke kurdan a pêşiyan e. Îro ez dinêrim tirk rûniştine bêyî kurdan li ser me dipeyivin. Peyva wanî talî li ser televîzyona kurdî ye. Tirk bûne du par, parek dibê, `bila di televîzyonê de kurdî hebe` û rexê din dibên, `di televîzyonê de bi kurdî bê xeberdan wê dinya xera bibe`. Tewer parçeyekî wanî ehmeq heye dibên, `hema bila di televîzyonê de bi kurdî hebe. Ma wê kî lê guhdarî bike? Ne tirk, kurd jî lê nanêrin`.

Lê ev ehmeq nizanin ku îro muzîka tirkan tev de qopya stranên kurdî ye. De ka bila Îbrahîm Tatlises di radyo û televîzyonê de "Bêmal" û "Delalê beriyê" bêje, bê wê kî li stranên tirkî guhdarî bike? Mesela bi tirkî dibên "manda yuva yapmış sögüt dalına / yavrusunu sinek kapmış gördün mü?" Kî çi bike ji ve stranê? Ev meqamên klasîk ên kurdî hicazkar, rast û şaş, nihawend, hîcaz, kurdî hîcazkar û yên din in.

Ev tişt giş wiha nabe, lê ez ber vê ketime ku qeşmer bazara me bêyî me bi hev re dikin. Di kurdî de meselek wiha heye, dibên rojekê şêr û rovî bûn birayê hev, rovî tim fenek û xayîn e. Du têlên dêla hespê peyde dike û ji şêr re dibêje; "Mîrê min tu gelekî bi qewet î. Niha karî van herdu mûyan biqetînî." Şêr dibê, "Çawa ez nikarim kuro?" Rovî dibê "de ka herdû tiliyê xwe bîn ber hev." Şêr lepê xwe li ber rovî datîne ser hev û rovî jî herdu tiliyên wî, bi wan mûyan qenc girê dide û ji şêr re dibêje, "de biqetîne!" Şêr bi hêrs lepê xwe vedike ku mû li hestiyan sekinîne. Paşê rovî tinazê xwe bi şer dike û dibêje, "Ehmeqo ka qeweta te?"

Şêr giredayî û birîndar, germê li lepê wî xist, lep werimîn. Bû nale nala şêr. Mişk ji qulikê derket û got, "Apê şer, xêr e ? "

Şêr got, "ma tu min nabînî?" mişk got, "ma ka ez te vekim?"

Şêr hîn bêhtir qehirî. Mişk got, "Ma apê şêr, çima tu diqehirî? Destûrê bide min ezê te vekim."

Şêr got, "De were." Mişk çû ket nav, lepê şer vebû û şêr got, "Ez namirim bi vê derbê lê ezê bimrim bi vê kerbê: Çawa rovî min girê bide û mişk min veke."

Na yabo me televîzyona bi minet navê? Serê wan bixwe. 7-8 qenalên televîzyona wan bi tirkî hene, ka ew bûne çi? Lê temamê dinyayê bibe xwedî televîzyon jî, car din em ji xwediyê televîzyonan meqbultir in.

**Tewlo, hejmar:5 /7 Gulan 1992**

*Ji Arşiva Rojnameya Welat*
*Şehadeta Mûsa Anter*

# Welat

[illegible] 1992 [illegible]


## Sokratesê hemdem



# KURDÎNO RABÎN!



# APÊ MUSA

*"Bajarên Kurdistanê! Em hemû rabin ser lingan, wê me têxin kîjan hepsê? [illegible] Bila gelo Tirk [illegible] ku, em 20 milyon Kurd êdî di welatê xwe de [illegible] [illegible]."*

*Musa Anter (28 Adar 1992, [illegible])*

# SOND BÎ NAVÊ KURDÎSTANÊ

## KOMBÛNA BÎRANÎNA APÊ MUSA





# EYY XWEDÊ ÊDÎ BES E LOO!

# MUSA ANTER

welat

# Sokratesê hemdem:
# APÊ MUSA

**Kuştina Apê Musa, di têkoşina neteweyî ya gelê Kurd de, destpêka radeyeke (merheleyeke) nû ye. Ev bûyer nîşan dide ku, dijminên gelê Kurd ewqas neçar, ewqas şeperze û ewqas çavtarî bûne ku, dikarin hemû hovîtiyan bikin. Bi kurtebirî, dijmin har bûye. Ev êrîşên bêperwa nîşanên harbûnê ne.**


*Felat Dilgeş*





## AZADÎ


Abdurrahman Durre
























ISNB-978-9944-222-55-6
9 789944 222556

₺14.00